



K.T.

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

**ZEYNELABIDÎN ZINAR: JIYAN BERHEM Û
SENIFANDINA XEBATÊN WÎ**

Zafer ATLI

TEZA LÎSANS A BİLİND

Şewirmend

End. Pwd. Dr. Hêmin OMAR AHMAD

BİNGOL-2018



T.C.

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

**ZEYNELABİDİN ZINAR: HAYATI ESERLERİ VE
ÇALIŞMALARININ SINIFLANDIRILMASI**

Zafer ATLI

Yüksek Lisans Tezi

Tez Danışmanı

Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD

BİNGÖL-2018

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Zafer ATLI tarafından hazırlanan *Zeynelabidin Zinar: Jiyan Berhem û Senifandina Xebatên Wî (Zeynelabidin Zinar: Hayatı Eserleri ve Çalışmalarının Sınıflandırılması)* başlıklı bu çalışma, 13.07.2018 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği ile/ oy çokluğu ile] başarılı/başarısız bulunarak jürimiz tarafından [Kürt Dili ve Edebiyatı] Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan : Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN

İmza:

Üye : Dr. Öğr. Üyesi. Mustafa ÖZTÜRK

İmza:

Üye : Dr. Öğr. Üyesi Hêmin OMAR AHMAD

İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../ 201.. tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ
Enstitü Müdürü V.

NAVEROK

KURTE	VII
ÖZET.....	VIII
ABSTRACT.....	IX
KURTEBÊJE	X
LÎSTEYA GRAFÎK, TABLO Û WÊNEYÊN TEZÊ	XI
PÊŞGOTIN	XIII
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	5
1. Jiyana Zeynelabidîn Zinar	5
1.1.1. Navê wî.....	5
1.1.2. Zarokatiya li Tirkiyeyê.....	5
1.1.3. Malbata wî.....	5
1.1.4. Perwerdehî û memurtiya wî	6
1.1.6. Koçkirina ber bi Swêdê	7
1.1.7. Xwendin û Perwerdehiya li Swêdê.....	8
1.1.8. Kar û xebatên li Swêdê.....	8
1.1.9. Nivîskariya Wî	9
1.2. Berhevkarîya Zinar û Metodolojiya wî ya Berhevkarîyê.....	9
BEŞA DUYEM.....	17
2. Pirtûkên Berhevkarîyê	17
2.1. Xwençe I	17
2.2. Xwençe II.....	18
2.3. Xwençe IV	20
2.4. Xwençe III.....	21
2.5. Xwençe V.....	22
2.6. Siyabend û Xecê.....	23
2.7. Xwençe VI	24
2.8. Xwençe VII.....	25
2.9. Mîrate	27
2.10. Xweşber.....	27

2.11.	Xwençe VIII.....	28
2.12.	Xwençe IX.....	29
2.13.	Xwençe X.....	30
2.14.	Hemdîn û Şemdîn.....	31
2.15.	Çivîka Bilûrvan	32
2.16.	Zira Kerê û Lota Devê.....	33
2.17.	Pîra Kût û Dîkê Derpîkurt	34
2.18.	Hecî Rovî.....	35
2.19.	Nêçîra Çiyayê Reş	36
2.20.	Keywan Paşa û Keçelok	36
2.21.	Beranê Sêr	37
2.22.	Abidê Şikeftê.....	38
2.23.	Çîm Beg.....	39
2.24.	Qîza Paşayê Çîn û Maçînê û Hesenê Sênî.....	40
2.25.	Ji Heftan Çar Şaxên Çîroka Gûl û Sînem.....	41
2.26.	Hevberdana Qijik û Kevokê	42
2.27.	Kalê Merivxwir	43
2.28.	Kewê Çîrokbêj.....	43
2.29.	Kerkerokê Bayê.....	44
2.30.	Sînelmasî û Mîr Mihê.....	45
2.31.	Sêva Sêrê	46
2.32.	Gurê Selikê	47
2.33.	Mele Kulî.....	48
2.34.	Pêxemberê Derewîn	49
2.35.	Mîrê Cîzîra Botan û Siltanê Stenbolê.....	50
2.36.	Xwişkebiratiya Teyr û Rovî	50
2.37.	Kurê Paşê û Mişkê Qut.....	51
2.38.	Cihê û Çil Kose	52
2.39.	Bablîcan.....	53
2.40.	Miriyê Li Ser Bîrê	54
2.41.	Serpêhatiya Wezîr û Paşê	55
2.42.	Mado Paşa û Keça Dêwê.....	56

2.43.	Mîr Mihê û Gulîzar.....	56
2.44.	Heft Sal Şivantî	57
2.45.	Çepgera Aşê Dewletê	58
2.46.	Xeyda Pisîkê.....	59
2.47.	Çêleka Zer	60
2.48.	Daweta Hirç û Rovî.....	61
2.49.	Dêwê Heftreng	62
2.50.	Gemiya Nokan.....	63
2.51.	Gurê Nalbend	64
2.52.	Keçelok û Gurrî	65
2.53.	Kund û Bilbil	66
2.54.	Mamê Mamcel.....	67
2.55.	Mîrzo-yê Kurê Paşê	67
2.56.	Pîra Bênefs	68
2.57.	Pîra Xwînxwur	70
2.58.	Rasto û Xwaro	71
2.59.	Rêncberiya Mîrzo û Keleş.....	72
2.60.	Sêva Paşê.....	74
2.61.	Simbêlşonik	75
2.62.	Toz Paşayê Kurê Çeqçeq Paşa	76
2.63.	Tûtika Cinî.....	77
2.64.	Keça Sêvê.....	78
2.65.	Daweta Kurê Paşê û Qîza Gavan.....	79
	BEŞA SEYEM.....	80
3.	Pirtûkên Tîpgehiyê.....	80
3.1.	Nûbara Ehmedê Xanî	81
3.2.	Dîwan	82
3.3.	Mewlûda Kurmancî.....	83
3.4.	Nehc-ul Enam.....	84
3.5.	Dîwana Rûhî	85
3.6.	Iqdê Durfam	86
3.7.	Mîrsad-ul Etfal	87

3.8.	Sirmehşer	88
3.9.	Herdubat.....	88
3.10.	Rêberê Sanî, Şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî.....	89
3.11.	Dîwan	90
3.12.	Rewdneîm.....	90
3.13.	Leyl û Mecnûn.....	91
3.14.	Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî.....	92
3.15.	Serfa Kurmancî.....	93
3.16.	Çanda Warê Talankirî.....	94
3.17.	Sêkêşan.....	95
3.18.	Hozanvanêt Kurd.....	96
3.19.	Mamikên Kurdî	97
3.20.	Rênasî	98
3.21.	Rêgeha Perestiniyê	98
3.22.	Eqîdeya Îmanê.....	99
3.23.	El Hemaîlu Fîş‘Şemaîlî	100
3.24.	Rîsalet-UI Kufî W‘el Kebairî.....	101
3.25.	Eqîdeya Ehmedê Xanî	102
3.26.	Dîwana Hesbî	103
3.27.	Keşkol.....	104
3.28.	Kulîlka Nîsanê	105
3.29.	Dîwançeya Xakî	106
3.30.	Jinavbirina Barzaniyan	107
3.31.	Yûsuf û Zuleyxa / Gulzarîcan	108
3.32.	Serpêhatiya Îsa Pêxember.....	109
	BEŞA ÇAREM	111
4.	Pirtûkên Telîf û Wergerê	111
	Pirtûkên Telîf	111
4.1.1.	Îşkencede 178 Gün	111
4.1.2.	Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî	112
4.1.3.	Balafîra Jînê.....	113
4.1.4.	Xwendina Medresê.....	114

4.1.5.	Kadîna Mişkan	115
4.1.6.	Çarmix	116
4.1.7.	Fermana 33 Rewşwebîran	117
4.1.8.	Bingeha Çîroka Kurdî	119
4.1.9.	Bawermendî -I-.....	120
4.1.10.	Bawermendî -II-.....	121
4.1.11.	Kurdistana Xwedê jî Şewitî	122
4.1.12.	Di Çanda Kurdî De 37 Şaxên Zanistiyê.....	123
4.1.13.	Zerdeşt Pêxember	124
4.1.14.	Jînewariya Derwêşê Sado	125
4.1.15.	Govenda Mirinê	126
4.1.16.	Arşîva Şêxên Axtepeyê	127
4.1.17.	Jîneweriya Şêx Edhem Berzanî	128
4.1.18.	Karoka Evsûn.....	128
4.1.19.	Lehengwariya Zarûkekî Kurd	129
4.1.20.	Serpêhatiya Mele Xelîl	130
4.1.21.	Serhildana Eşîra Jêlî 1929.....	131
4.1.22.	Gotinên Watedar	132
4.1.23.	Gotarxane.....	133
4.1.24.	Sêwirxane.....	134
4.1.25.	Qolinc.....	134
4.1.26.	Çandxane	135
4.1.27.	Pirsname.....	136
4.1.28.	Axaftina Wêneyan	137
4.1.29.	Vêjexane	138
4.2.	Pirtûkên Werger	138
4.2.1.	Jiyana Mele Seîdê Kurdî	138
4.2.2.	Îslam û Ewrûpa.....	140
	BEŞA PÊNCHEM	142
5.	Nivîsarên Zeynelabidîn Zinar Di Kovar, Rojname û Sempozyoman De	142
5.1.	Nivîsarên Zeynelabidîn Zinar di Kovaran de.....	142
5.1.1.	Nûbihar	142

5.1.2.	Nûdem	143
5.1.3.	Berbang	144
5.1.4.	Nûpelda	145
5.1.5.	Çira	145
5.1.6.	Berhem	145
5.1.7.	Felsefevan.....	146
5.1.8.	Wan	146
5.1.9.	Bergeh	146
5.2.	Nivîsarên Zeynelabidîn Zinar di Rojnameyan de	146
5.2.1.	Kurdistan Press.....	146
5.2.2.	Armanç	146
5.3.	Nivîsarên Zeynelabidîn Zinar di Malperan de	146
5.3.1.	Riya Teze.....	146
5.3.2.	BûyerPress.....	149
5.4.	Nivîsarên Zeynelabidîn Zinar di Sempozyûman de.....	150
	Encam.....	151
	Çavkanî	156
	PÊVEK.....	164

KURTE

Ev xebat hewl dide ku Zeynelabidîn Zinar di çarçoveya jiyana, berhem û xebatên wî de bide nasîn. Bi vê mebestê di destpêkê de behsa armanc, rê û rêbaz û girîngiya xebatê dike. Paşê wekî pênc beşan jiyana, berhem û xebatên wî dide nasîn.

Ev xebat, berhemên Zinarî bi seredorî wekî berhevkarî, latînzekirin, telîf û werger û dawiyê de jî nivîsarên wî yên di kovar û rojnameyan de dide nasîn. Di beşa yekem de pêşî behsa jiyana wî hatiye kirin dû re qala berhevkarîya Zinar û metodolojiya wî ya berhevkarîyê hatiye kirin. Di beşa duyem de jî pirtûkên berhevkarîyê yeko yeko hatine nasandin. Di beşa sêyem de berhemên ku nivîskar tîpguhêziya wan kiriye, hatiye nasandin. Beşa çarem jî berhemên telîf û du xebatên wergerê dide nasîn. Beşa dawî ya tezê nivîsarên nivîskar yên ku di kovar, rojname û malperan de derçûne, tesnîf dike.

Ev tez bi giştî, girîngiya kesayeta Zinar, berhem û xebatên wî, rola wî ya di berhevkarîya kurdî de û nirxandina metodolojiya wî ya berhevkarîyê bi çavekî rexnegirî dinirxîne.

Peyvên Sereke: Zeynelabidîn Zinar, Berhevkarî, Folklor, Transkirîpsiyon.

ÖZET

Bu çalışma Zeynelabidîn Zinar'ın hayatını, eserlerini ve çalışmalarını konu edinmektedir. Bu amaçla öncelikle çalışmanın amaç, yöntem ve önemi üzerinde durulmaktadır. Daha sonra çalışma beş bölüme ayrılarak yaşamı ve eserleri hakkında bilgi verilmektedir.

Bu tez beş bölüm halinde Zinar'ın çalışmalarını sırasıyla transkripsiyon (latinize) çalışmaları, telif ve çeviri eserler ve dergi ve gazete yazıları olarak incelemeye tabi tutmaktadır. Birinci bölümde öncelikle yazarın hayatından bahsedilmekte, daha sonra onun derleme çalışmaları ve derleme metodolojisi üzerinde durulmaktadır. İkinci bölümde yazarın derleme eserleri teker teker incelenmektedir. Üçüncü bölümde ise yazarın transkripsiyonunu yaptığı eserler hakkında bilgi verilmektedir. Dördüncü bölüm ise telif eserlere ve iki tane çeviri çalışmasının tanıtılmasına ayrılmıştır. Son bölümde yazarın çeşitli dergi, gazete ve internet sitelerinde yayınlanmış yazıları tasnif edilmiş.

Bu tez genel olarak yazarın eserleri ve çalışmaları, kürt folkloru derlemeciliğindeki yeri ve derleme metodoloji açısından eleştirel bakış açısıyla incelenmiştir.

Anahtar Sözcükler: Zeynelabidîn Zinar, derleme, folklor, transkripsiyon.

ABSTRACT

This study deals with the life, works and works of Zeynelabidîn Zinar. For this purpose, the aim, method and importance of the study firstly are emphasized. Later, the study is divided into three sections, and information about his life and works are given.

This work breaks Zinar's work into three parts: Compilation, transcription studies, copyright and works. Compilations are mostly made up of oral traditions of the Kurdish people such as tales, folk songs, stories, idioms, idioms, proverbs. Transkription studies mostly consist of classical works. Apart from this, there are also different studies that are about grammar and also written in arabic letters. Copyright works consist of authors' own works. These are mostly articles that the author writes in different platforms, publishes and brings in a book. His copyright works are biographical studies about Kurdish personalities he attribute importance, research writings, self-written stories and poems.

In the conclusion , the author's works, studies and contributions to Kurdish literature and the role and effects of him and his works on the Kurdish literature are critically evaluated.

Keywords: Zeynelabidîn Zinar, Compilation, Folklore, Transcription

KURTEBÊJE

- amd.** : Amadekar
- h.b.** : Heman berhem
- h.g.** : Heman gotar
- hwd.** : Her wekî din
- j.** : Jimar
- r.** : Rûpel
- PDKT** : Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkiyeyê
- s.x.l.** : Selama Xwedê li ser wî be
- weş.** : Weşanxane
- wer.** : Werger

LÎSTEYA GRAFÎK, TABLO Û WÊNEYÊN TEZÊ

LÎSTEYA GRAFÎKAN

Grafîk 1: Hejmara Berhemên Wî li Gorî Mijaran.....	164
Grafîk 2: Rêjeya Berheman li Gorî Mijaran	164
Grafîk 3: Li Gorî Salan û Mijaran Berhemandariya Wî	165
Grafîk 4: Rêjeya Berhemên Berhevkariyê li Gorî Salan.....	165
Grafîk 5: Rêjeya Berhemên Tîpguhêziyê li Gor Salan	166
Grafîk 6: Rêjeya Berhemên Telîfî li Gorî Salan	166

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1: Bi Giştî Hejmarên Berheman li Gorî Salan	167
Tablo 2: Babet û jimarên di her deh cildên Xwençeyan de	168
Tablo 3: Li gorî kategoriyan berhemên Zinar	169
Tablo 4: Nivîsarên Zinar yên di Kovaran de.....	175
Tablo 5: Nivîsarên Zinar yên di Rojnameyan de	179
Tablo 6: Nivîsarên Zinar yên di Malperan de	180

LÎSTEYA WÊNEYAN

Wêne 1: 1975-76 Zeynelabidîn Zinar li Batmanê.....	185
Wêne 2: Zeynelabidîn Zinar (Ji aliyê çepê ve kesê duyem) 1964-65 li Gundê Bîrsinê	186
Wêne 3: Sal 1962 dîmenek guhdariya radyoya Êrîvanê	186
Wêne 4: 11.03.1971, li ber deriyê Îmam-Xetîba Diyarbekirê Zeynelabidîn Zinar (aliyê rastê ve kesê yekem) digel hevalên xwe	187
Wêne 5: Sal 1994 dîmenek ji odeya xebata Zeynelabidîn Zinar	187
Wêne 6: Sûretê Zeynelabidîn Zinar	188
Wêne 7: <i>Xwençe I</i> (1989) pirtûkeke berhevkariyê ya Z. Zinar e.	189
Wêne 8: <i>Xwençe X</i> (1997) pirtûkeke berhevkariyê ya Z. Zinar e.	189
Wêne 9: Bergê <i>Nûbara</i> Ehmedê Xanî ya ku Z.Zinar di sala 1986an de latînîze kiriye.	190
Wêne 10: Bergê <i>Dîwana</i> Melayê Cizirî ya ku Z.Zinar di sala 1987an de latînîze kiriye.	190
Wêne 11: <i>Îşkencede 178 Gün</i> (1987) pirtûkeke telîf a Z.Zinar e.	191
Wêne 12: <i>Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî</i> (1991) pirtûkeke telîf a Z.Zinar e	191
Wêne 13: Nivîseke Z.Zinar di rojnameya <i>Kurdistan Pressê</i> (1987/24) de bi navê Diljar BÊWAR.	192

Wêne 14: Nivîseke Z. Zinar di kovara Berbangê (1986/2) de bi navê Wessaf Werte.	192
Wêne 15: Nivîseke Z.Zinar di kovara Nûdemê (1992/1) de.....	193
Wêne 16: Yekem nivîsa Zinar a bi navê <i>Pîrozname</i> di kovara Nûbiharê (1993/5) de.	193

PÊŞGOTIN

Zeynelabidîn Zinar bi berhemdariya xwe kesayetekî girîng e û bi rola xwe ya ku di nav cîhana edebiyata kurdî de cih girtiye û valahiyeke mezin dagirtiye. Wî bi dehan berhemên biqîmet yê folklorîk dane ber hev û tîpguhêziya gelek berhemên klasîk ên kurdî kiriye. Ji ber xebat û keda wî ya hêja, me di vê xebatê xwest ku kesayeta Zinar ji hêla rewşenbîrî û edebî ve were nasîn û di nav qada berhevkarîyê de bi rola xwe bê nasîn. Lewra rêzepirtûkên wî yê bi navê *Xwençeyê* ku deh cild in û bi hezaran kereseteyên gelêrî di xwe de dihewînin bi tena serê xwe ji bo edebiyata kurdî ya gelêrî û çanda kurdî hejayî nirx û lêkolînê ne. Herwiha, berhemên telîf ên li ser çand û toreya kurdî, wergerên wî, çîrokên ku ji folklorîka kurdî adapte kirine bo zarokên kurdan yeko yeko hatine nasîn û nirxandin. Ji ber van sedeman ev xebat dixwaze amajê bi kesayeta edebî ya Zinarî û berhemên wî bike.

Ji serê berîn de, ez spasîyên xwe ji Doç. Dr. M. Zahir ERTEKÎN re dikim ku pêşniyaz kir ku ez li ser Zinar û xebatên wî xebateke bi vî rengî bikim. Herwiha ez dixwazim spasîyên xwe ji Zeynelabidîn ZINARÎ re dikim ku di bidestxistina materyalên vê xebatê de deriyê mala xwe ji min re vekir bo hevpeyvînê û alîkariyên mezin da min. Dîsa ez dixwazim spasên taybet bikim ji bo şewirmendê xwe End. Pwd. Dr. Hêmin Omar AHMAD ku ji destpêkê heta bigihê encamê ji hêla rêbaza lêkolînê û hêlên teknîk ên xebatê de pêşiya min ronî kir. Ez di dawiyê de jî spasîyên jidil ji her du birayên xwe Ömer DELİKAYA û Şerif GÜZEL dikim ku halê dawî yê teza min xwendin.

Zafer ATLI

BİNGOL-2018

DESTPÊK

Guherîn û qewamên di sedsalên dawî de ku di warê civakî û neteweperweriyê de rû dan, di pîrr qadên ilmî de mijûlî û nêrînên nû bi xwe re anîn. Ji wan qadan yek jî folklor bû ku bi berhevkarî, senifandin û danîna bingehê teorîk werareke berçav pêk anî û ji aliyê hin gelan ve wekî amrazekî hatiye bikaranîn bo avakirina fikr û yekîtiya neteweyê. Lêbelê kurd heta demeke dereng bi giringiya vê çavkaniya gelêrî nevarqilîn û lewma jî bi hezaran nimûneyên girîng bi nîşên ewil re bi ro da çûn û winda bûn. Helbet di sedsala 19an de hewldanên kurdnasan bere bere zêde bûn û mijûliyeke taybet bo berhevkarî û senifandina keresteyên folklorîk ên kurdî peyda bûn. Heciyê Cindî ku yek ji berhevkarên ewil ên kurmancî ye di pêşgotina pirtûka xwe a bi navê *Hîkyatêd Cimaeta Kurda* de qala vê eleqeyê dîke:

“Hîkyatêd (çîrokêd, dîrokêd) kurdî (kurmancîê) di nava wê zargotinê de cîkî hêjayî meşûr û nava kurdzana da hewaskarîke pêş da anîne. Ji wan ulmdara geleka bi jênivîsandina wê janrê va wextê xwe da mijûl bûne, nimûşêd wê berev kirine û dane neşirê.”

Xebera Cindî ye, hin kurdnas û gerokan berî wî nimûneyên folklorîk kurdî berhev kirine û dane çapkirin. Ev xebatên ewil ên derbarê folklorîk kurdî de hatine kirin ku pîrraniya wan xebatên berhevkarîyê ne, ji aliyê Pertev wekî di du beşên cuda hatine dabeşkirin: Serdema Klasîk û Serdema Modern. Li gorî Pertev di xebatên folklorîk kurdî de serdema modern bi weşandina rojnameya *Kurdistanê* (1898-1902) dest pê dîke¹ û serdema berî rojnameya *Kurdistanê* jî wekî serdema klasîk bi nav dîke ku berhevkarîyên Mela Musayê Hekarî û Mela Mehmûdê Bazîdî ku bi alîkariya Jaba dikevin bin vê serdemê. Herwiha di vê serdemê de carna bi qismî carna jî bi temamî rojhilatnas û kurdnasên rojavayî bala xwe dane daneyên folklorîk ên kurdî.

Dîsa em ji Aleksandr Jaba (1801-1894) dizanin ku Mela Mûsayê Hekarî zêdetirî 50 çîrokên kurdî yê gelêrî berhev kirine û ew bi navê *Duru'l-Mecalîs* wekî pexşan nivîsîne. Di salên 1850yan de Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1867), çîrokên kurdî berhev kirine û ew xebat ji aliyê Aleksandr Jaba bi navê *Camîeya Rîsaleyan û*

¹ Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorîk Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Stenbol 2013, r. 55.

Hikayetan bi Zimanê Kurmancî çap bûye.² Rojhilatnasên wekî Eugen Prym û Albert Socin li ser folklore kurdî xebatên girîng kirine. Herwiha rojhilatnas F. Le Coq di sala 1901î de li Mukriyan û hinek deverên Bakur geriyaye çîrokên kurdî yên gelêrî berhev kirine û di sala 1903yan de jî bi navê *Kurdische Texte* (Deqên Kurdî) li Berlînê çap kiriye.³ Çawa ku ji van agahiyan jî tên fêmkirin, dîroka berhevkarîya nimûneyên folklorê kurdî nagihîje demeke zêde kevn dema ku miqayeseyek ligel xebatên berhevkarîyên yên dinyayê bête kirin. Jixwe, piştî demezirîna Tirkiyeyê, ji ber qedexeyên li ser ziman û çanda gelên kêmar, bi giştî kurdî bi taybetî jî folklorê kurdî kete bin zexteke giran. Lewma jî karên berhevkarîyê wan deman zêdetir li parçeyên din ên Kurdistanê meşiyên. Bi taybetî jî, bi regekî sistematîk û ji aliyên pisporên perwerdekirî ve di nav kurdên Kafkasyayê de tevgera xurt a berhevkarîyê peyda bûye. Meriv dikare navên wekî, Emînê Evdal (1906-1964), Heciyê Cindî (1908-1992) Casimê Cefîl (1908-1998), Ordîxanê Cefîl (1932-2007) Cefîlê Cefîl (1931-) Qanatê Kurdo (1909-1985), pêşengtiya vê karî kirine.

Li Tirkiyeyê, herçend qedexa û zextên li ser kurdî bi xurtî hatibin sepandin jî, bi zehmetî be jî karên rewşenbîrî yên derheqê kurdî de hatine kirin. Di vir de divê behs bê ser Mehmet Emîn Bozarslan.⁴ Xebatên Bozarslan hetanî 1979an zêdetir bi tirkî ne lê piştî wê demê ew êdî zêdetir bi kurmancî dinivîse. Bozarslan tîpguhêziya klasîkên kurdî û rojnameyên ewil ên kurdî kiriye. Pareke girîng a xebatên wî jî ji berhevkarîyên folklorîk pêk tê. Li gorî Yüksel, digel pirtûkên dînan û bi tirkî Bozarslan bi dehan berhemên edebiyata devkî çap kiriye yên wekî çîrok, henek û fabl.⁵ Pey Bozarslan re, ji nav kurdên li Tirkiyeyê, kesê ku herî zêde bi karê berhevkarîyê re mijûl bûye Zinar e. Dema ku meriv berdewamiya karên berhevkarîyê dinêre, tê dîtin ku Zinar peyrewekî xurt ê Bozarslan e ji aliyê mijûlî û karên folklorîk de.

² Ramazan Pertev, "Xebateke Girîng Di Dîroka Folklorê Kurdî De: Kemal Fewzî û Berhevkarîya Çîrokên Kurdî", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* 2 (2016), r. 46.

³ h.g., r. 46.

⁴ Bo xebatên Bozarslan binêre: Metin Yüksel, "A "Revolutionary" Kurdish Mullah from Turkey: Mehmed Emin Bozarslan and His Intellectual Evolution" *The Muslim World* 99:2 (April 2009), 356-380.

⁵ Metin Yüksel, "A "Revolutionary" Kurdish Mullah from Turkey: Mehmed Emin Bozarslan and His Intellectual Evolution" *The Muslim World* 99:2 (April 2009), 363.

Ev xebat li ser jiyana Zinar, berhemên wî yên telîf, berhevkarî, rê û rêbazên berhevkarîya wî, bi berhevkarîyê sûda ku gihandiye çanda kurdî, kêmasî şaşiyên berhevkarîyê, latînzekirina klasîkên kurdî yên ji terefê wî ve bûne, radiweste. Di vê xebata lêkolînê de xebatên Zinarî li ser çar kategoriyan hatine senifandin: Berhevkarî, telîf, latînzekirin û nivîsarên wî yên di kovar û rojnameyan de. Zinar herçend ku li derveyî welêt bû jî materyalên berhevkarîyê bi kesên çîrokbêj, stranbêj û dengbêj an wekî jêder re diket têkiliyê û dokumantên xwe tomar dikir.

Girîngî û Armanca Tezê

Ev xebat armanc dike ku hemû xebatên nivîskar û berhevkar Zeynelabidîn Zinar bi awayekî rêkûpêk bide nasîn û ji kesên pêwendîdar re pêşkêş bike. Ji bo xebatkarên ku bixwazin li ser hezaran keresteyên folklorik yên ku ji layê Zinarî ve hatine berhevkirin, vekolînekê bikin ev lêkolîn hêvî heye ku bibe çavkaniyeke sereke. Lewma girîng bû ku hemû xebatên Zinar bi rengekî birêkûpêk di çarçoveya mijara xwe de bihatana nirxandin û tespîtkirin. Digel vê, kêmasî û şaşiyên ku di karê berhevkarîya Zinarî de hatine tespîtkirin ji bo lêkoleran li gor rêbaza zanistî hêsanîyekê derdixe pêş. Kesên ku bixwazin li ser van çavkaniyan bixebitin divê agahdar bin ji ber metodolojiya Zinarî hin keresteyên ku wî berhev kiriye resentiya xwe winda kirine. Lewra dema ku desttêwerdan li ser berhemeke folklorîk bête kirin, ew berhem bi hêsanî nikare bibe mijara lêkolîneke antropolojîk, zimannasî û civaknasiyê.

Rê û Rêbaz

Nivîskarê ku bûye çavkanî ji bo vê xebatê li derveyî welêt li Swêdê dijî. Berî ku ev xebat bihata nivîsandin me xwest ku em hevdiînekê bi wî re pêk bînin bo agahiyên berfirehtir û zêdetir. Bi vê mebestê gava ku ew hat Tirkiyeyê me derfetê dît ji bo em nivîskar baştir binasin, agahiyên li ser berhem û xebatên wî ji devê wî tespîtkirin. Herwiha, çavkaniya sereke ya jînenîgariya nivîskar bi rêya hevpeyvînê bi dest ket ku di sala 2014an de min li Stenbolê çêkiribû.

Ji aliyê şeklî ve ev xebat ji pênc beşan pêk tê. Beşa yekem li ser jiyana û kritîkên bi giştî di derbarê rê û rêbazên xebatên wî de ne. Beşa duyem behsa pîrtûkên nivîskar ên berhevkarîyê dike. Zinar ji folklorê kurdî çî berhev kiriye, yek bi yek

hatiye tarîfkirin. Li gor nirxandinên rêbaza berhevkarîyê metodolojiya Zinarî di vê beşe de tê analîzkirin. Di beşa sêyem de berhemên latînzekirî yên Zinarî cih girtine. Ev berhem bi gelemperî yên klasîk in. Beşa çarem ji telîf û wergerê pêk tê. Berhemên ku nivîskar bi xwe afirandine di vê beşê de cih digirin. Beşa pêncem jî li ser nivîsarên wî yên di kovar, rojname û sempozyûman de ye.

Sînor û Zehmetiyên Tezê

Nivîskar nivîskarekî berhemdar e. Herwiha ji ber ku gelek berhem û xebatên nivîskarî li çapxana Pencînar, ku ew jî li Swêdê ye, hatine çapkirin, diwariyekê dida me ku em wan bi dest bixin. Ji ber vê yekê di vê xebatê de berhemên Zinarî yên heta sala 2018an ve hatine nivîsîn, cih digirin. Disa divê bê gotin ku di gelek rojname û kovaran de, malper û medyaya civakî de nivîsên wî yên ku hatine weşandin bûye mijara vê xebatê.

Bidestxistina hin berhemên nivîskarî gelek dijwar bû. Hin berhemên bi hejmareke sînorkirî çap bûne. Ev yek lêkolîna li ser berhemên wî zehmettir kir, ji ber ku bidestxistina hin pirtûka ne pêkan bû. Lewra herçiqas bi nivîskarî re em ketin têkiliyê, hin berhemên wî yên li Stockholmê çap bibûn bi dest neketin û berhem nehatin dîtin. Ji ber vê yekê derfeta lêkolînê jî li ser hin berheman çênebû. Li cem nivîskar bixwe jî nusxeyên hin pirtûkan peyda nabin. Kêşeyeke din a xebatê jî bikaranîna nasnavên cuda ên nivîskar e. Nivîskar di pirtûkên xwe yên ewil de paşnavê xwe wekî Kaya daniye, pey re paşnavê xwe wekî Zinar guhertiye. Herwiha wî ji bo nivîsarên cuda yên di kovar û rojnameyan de bernavkên wekî Xwedêdan, Wessaf Werte, Diljar Bêwar, Xwedên Gurdilî û Zindî bi kar aniye. Ev jî ji bo tespîtkirina nivîsarên wî yên di kovaran de zehmetiyek derdixe holê.

BEŞA YEKEM

1. Jiyana Zeynelabidîn Zinar

Jînenîgariya Zeynelabidîn Zinar di vê beşa tezê de tê qalkirin. Jiyana wî ya li Tirkîyeyê, bûyerên ku berê wî didin ber bi sirgûnê û serboriyên wî yên sereke tîn îzehkîrin.

1.1.1. Navê wî

Nav û paşnavê nivîskar di qeydên fermiyeta Tirkîyeyê de Zeynelabidin Kaya ye. Lê li Swêdê Zeynelabidîn Zinar e. Li ser hemû pirtûkên wî jî paşnav Zinar e. Tenê li ser pirtûka wî ya ku bi navê *İşkencede 178Gün'e* Kaya ye. Piştî koça wî ya Swêdê, nivîskar biryara guhertina paşnavê xwe daye. Guherîna paşnavê nivîskarî ji aliyê dewlata Swêdê ve roja 30yê Avrêla 2002an hatiye pejirandin.⁶

1.1.2. Zarokatiya li Tirkîyeyê

Piçûktiya nivîskar wekî zarokên din bi temamî bi lîstikan di nava zarokên gund de derbas nebûye. Li gorî gotina wî, dema ku zarok bûye ew her tim di nav civata mezinan de bûye, guh daye mezinên xwe û rêça wan şopandiye.⁷ Nivîskar di wextê zarokatiyê de zarokatiya xwe qebûl nekiriye û her tim ji bo mezinbûnê hewl daye. Ji ber ku bavê wî melatî kiriye zaroktiya wî li gelek gundên cuda yên Kurdistanê di nav feqî û melayan de derbas bûye. Di zarokatiya xwe de pêşî perwerdehiya medresê ji bavê xwe wergirtiye û berhemên sereke yên olî xwendine. Ji xwe armanca bavê wî ew bûye ku kurê xwe bike mela. Di zarokatiya wî de tiştêkî din heye ku bala me dikişîne, ew jî pêkhatina fikra wî ya millî ye. Dema hîn jî zarok bûye, di nava feqîyan de bûye û feqîyên wê demê jî ji aliyê fikrên millî ve xurt bûne. Vê hiş û bîreweriyê tesîreke xurt li ser nivîskar kiriye.

1.1.3. Malbata wî

Malbata nivîskar ji pênc kesan pêk tê. Ew û xanima xwe, her du keçên wî, kurekî wî. Nivîskar di sala 1971ê de bi neviya xalê bavê xwe re zewaca yekem

⁶ Hevpeyvîna bi Zeynelabidîn Zinar re, Karamürsel, 18.06.2014.

⁷ Hevpeyvîna bi Zeynelabidîn Zinar re, Karamürsel, 18.06.2014.

kiriye. Ji vê zewacê du keç û kurek çêbûne. Dû re di sala 1990î de ji ber hin pîrsgirêkên malbatî ji jina yekem cihê bûye. Zarokên wî ji zewaca duyem çênebûne.

Bavê wî ji eşîra pencînarê ye, diya wî jî ji eşîra reşkotan e. Eşîra pencînarê li Kurdistanê eşîreke mezin û bibandor e. Herêma ku eşîra pencînar û reşkotan lê dimînin, zêdetir li derdora bajarê Sêrt û Batmanê ye.

1.1.4. Perwerdehî û memurîtiya wî

Nivîskar perwerdehiya xwe ya berîn, ji medreseyan wergirtiye. Ji ber ku bavê wî di medreseyan de peywirdar bûye, nivîskar jî ji vê derfetê sûd wergirtiye. Lê xwendina wî ya medresê birêkûpêk di sala 1963an de li gundê Kuştiyan ku girêdayê bi Kopa Mûşê ve ye dest pê kiriye. Dû re li gelek bajar û gundên Kurdistanê, ji alimên binavûdeng yên wekî Mele Sadreddîn Yüksel, Xelîfe Usiv, Mele Ebdurehmenê Nisro ders hildaye. Xwendina medresê birêkûpêk hetanî sala 1968an domandiye. Di sala 1968an de li Pîranê dîplomeya dibistana seretayî standiye. Di eynî salê de li Diyarbekirê dest bi dibistana navîn a Îmam-Xetîbê kiriye, li wir jî sê sal û niv dewam kiriye. Pişt re di sala 1971ê de ji ber sedemên rewşa siyasî ya Tirkîyeyê navbereke kin daye xwendina xwe û dû re dîsa dest bi xwendina xwe kiriye, li Batmanê Lîseyaya Şevê xwendiyê û dîplomeya xwe di 15 Tîrmeha 1980yî de wergirtiye. Ketiye azmûna zanîngehê jî, lê Cuntayê derfet nedaye wî ku ew bi karibe li xwendina bilind bidomîne.

Piştî şeş meh û deh rojên eskeriyê, nivîskar ezmûna memurîtiyê qezenç kiriye û di 25/ 07/ 1975an de li şaredariya Batmanê wekî karmend (tehsîldar) dest bi peywirê kiriye. Hin caran bûye cîgirê şef, hin caran jî bûye şef, bi wî hawayê yazdeh sal domandiye, heta ku ji aliyê cuntaya 1980yî ve hatiye desteserkirin. Lê ji ber ku nivîskar memûr bûye, bi raporeke nihênî ji aliyê Cuntayê ve, karkirina wî di karê diravî de mehzûr hatiye dîtin û di 1983an de ji karê xwe hatiye bidûrxistin.⁸

⁸ Hevpeyvîna bi Zeynelabidîn Zinar re, Karamürsel (18.06.2014).

1.1.5. Xebatên siyasî yên li Tirkîyeyê

Dema ku meriv li berfirehiya fikrên siyasî yên nivîskarî dinêre, hê di zarokatiya wî de fikr û ramanên siyasî pê re çêbûne. Fikrên neteweperwerî û millî hêj dema zarokatiyê bandoreke mezin li nivîskar jî kirine. Ev ramanên neteweperweriyê, sazkirina bingeheke siyasî bi xwe re anîne. Destpêka xebatên wî yên siyasî di sala 1968an de dema dest bi xwendina Îmam-Xetîba Diyarbekirê kiriye, çêbûne. Di payîza wê salê de bûye endamê Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkîyeyê û piştê bi awayekî rêkûpêk xebata siyasî domandiyê û têkiliyên xwe di nava ciwanan de, xasma li mekteb û xwendegehan xurt kiriye. Lê di dema ku bûye karmendê şaredariyê, di heman demê de bûye berpîrsê malî yê PDK-T şaxa Batmanê.

Li Batmanê wê demê komîteyek ji aliyê PDK-Tyê ve bi navê “Komîteya Aştîyê” ava bûye û nivîskar bûye serokê wê. Gelşên di nava gundiyan de, gelşên eşîran, wekî din gelşên civakî bi hawayekî erênî çareser kirine. Lê xebatên wî yên siyasî bi hatina Cuntaya Eskerî ya 1980yê bi dawî bûne.⁹

1.1.6. Koçkirina ber bi Swêdê

Nivîskar heşt caran ji aliyê Cuntaya Kenan Evrenî ve hatiye desteserkirin. Cara pêşî di sersala 1980-81ê de ji aliyê yuzbaşiyê bi hovîtiya xwe navdar Cafer Tayyar Çağlayan ve û cara dawîn jî di Sibata 1984an de hatiye desteserkirin. Ji ber ku wî serpêhatiya xwe ya îşkenceyan di pirtûka xwe ya bi navê *İşkence de 178 Gün* aniyê ziman. Di vê pirtûkê de nivîskar behsa îşkenceyên wan deman dike.

Di roja Yekê Adarê ya sala 1984an de, Dadgeha Eskerî pênc sal girtîgeh û 20 meh jî cezayê sirgûnê li nivîskar biriye. Nivîskar ji bo xelasbûn û azadbûnê biryara derketina ji welêt wergirtiye. Di Îlona sala 1984an de, bi awayekî nihênî peşî çûye Şamê -li wir şeş roj maye- dû re derbasî Swêdê bûye. Dema gihiştîye Swêdê, ji ber îşkenceyên dewlata Tirkîyeyê neh sal û nîv li nexweşxaneyê Tevgera Navneteweyî ya Xaçê Sor tedawî bûye.

⁹ Hevpeyvîna bi Zeynelabidîn Zinar re, Karamürsel (18.06.2014).

Hêja ye bê gotin, çar sal piştî çûna nivîskarî ji welêt, Dadgeha Bala ya li Enqereyê ya bi navê “Askeri Yargitay”ê, beraeta wî daye ji bo cezayê ku Dadgeha Diyarbekirê dabûyê. Ew jî pê nehisiyaye hetanî dawiya meha Kanûnê ya sala 2001î.

1.1.7. Xwendin û Perwerdehiya li Swêdê

Piştî koça Swêdê nivîskar di navbera salên 1984-1986an de li Swêdê, -bê ku zimanê swêdî fêr bibe- dest bi Xwendegeha Mamostetiya Kurdî a Bilind kiriye û tê de tenê dersên rêzimanê xwendine. Di heman demê de dest bi hînbûna zimanê swêdî jî kiriye û çûye qursên kompîturê û xwe fêrê teknîkên nû xasma jî grafîkê kiriye. Nêzî çar-pênc salan li xwendina xwe domandiye. Dû re dewlata Swêdê li Zaningeha Stockholmê bi serokatiya Emer Şêxmûs beşa lêkolînê ya li ser kurdan vekiriye. Lê ji ber bêtecrûbetiya serokê beşê di vî warî de, wî ew kar sipartiye nivîskar û nivîskarî bi qederê çar salan lêkolîneke berfireh li ser rewşa jiyana kurdan kiriye û her encamek kiriye rapor û daye zanîngehê.¹⁰

1.1.8. Kar û xebatên li Swêdê

Nivîskar di sala 1984an de, ji Şamê çûye Danîmarkayê û piştî eynî salê jî çûye Swêdê. Dema gehaye Swêdê, ew şev biryara sê projeyan daye.

- Yek; berhevkirina berhemên folklorê kurdî.
- Du; amadekirina çîrokên zarokan ji çîrokên folklorî.
- Sê; tîpguhêziya pirtûkên klasîk, bi alfabeya latînî.

Nivîskar tim û tim di nava keftûleştên ziman, çand û lêkolînan de bûye. Lê di ber de jî ji bo debara xwe, li Pirtûkxaneyê Qiraliyetê jî xebitiye. Nivîskar zêde kar nedomandiye, ji ber ku tenduristiya wî nebaş bûye. Di gelek saziyên ziman û çandî yên kurdî de cih girtiye, carinan bûye berpisiyar carinan jî bûye endam.

Nivîskar li Swêdê di serê sala 1985an de pêşî weşanxaneyek bi navê “Pencînar” weşanxaneyek ava kiriye. Piraniya xebatên xwe û berhemên xwe yên mîna pirtûk, li vê weşanxaneyê weşandine. Ji xêncî van bi sedan nivîsar û meqale heta niha

¹⁰ Hevpeyvîna bi Zeynelabidîn Zinar re, Karamürsel. (18.06.2014).

weşandine û bi dehan pirtûk weşandine. Pirtûkên nivîskarî pircûre ne û gelek hêja û binirx in.

1.1.9. Nivîskariya Wî

Gava ku em li destpêka nivîskariya wî dinêrin, bi awayekî bipergal piştî sala 1984an, piştî koça Swêdê dest pê kiriye. Dema hê li Kurdistanê bûye di salên 1963-64an de wekî nivîsevan çend pirtûkên medreseyê yên wekî *Ewamil*, *Zirûf*, *Terkîb*, *Sedillahî Saxîr* îstînsah kirine. Di 17ê Gulana 1976an de jî pirtûka bi navê *Sedillah Gewra* îstînsah kirine. Dema ciwaniya xwe jî, helbest nivîsîne lê belê ji aliyê polêsên dewleta Tirkiyeyê hatine windakirin.¹¹

1.2. Berhevkarîya Zinar û Metodolojiya wî ya Berhevkarîyê

Zeynelabidîn Zinar, bi rola xwe ya berhevkarîyê ve yek ji folklornasê kurdî yê herî berhemdar e. Di salên zehmet yên darbeya leşkerî de bi rêya agahîderên xwe yên li Kurdistanê bi şerîtên ku deng li ser hatine tomarkirin yekûneke mezin ya folklorê kurmancî – çî çîrok, çî serpehatî, kilam û cureyên din- ji windabûnê xelas kiriye. Lewra, peywira ku wî wextê de daye li ser milê xwe bo folklorê kurdî û xebatên berhevkarîyê bi têra xwe girîng in. Lêbelê wî rêbazên cihêreng bikaraniye di berhevkarîyên xwe de ku qismek ji wan rêbazan jî aliyê metodolojiyê ve dikarin bidin sebebê nîqaşê.

Berî ku mijar bê li ser rêbaza berhevkarîyê ya Zinar, divê meriv li ser sebeb û motîvasyonê wî ya berhevkarîyê raweste. Zinar karê berhevkarîyê tiştêkî zehf muhim û nebe-nabe dibîne û li gorî vê yekê tevdigere; carcar jî ber vê yekê li gorî zanista berhevkarîyê tevnagere ango li çawaniyê miqate nabe û bala xwe zêdetir dide li ser çendaniya berhevkarîyên edebiyata gelêrî. Lewma bi dehan problemên berhevkarî û metodolojiyê derdikevin holê. Li gorî wî berhevkarî “karekî pîroz” e. Zinar, di destpêka pirtûkên xwe yên berhevkarîyê ku wekî cildên *Xwençeyê tîn zanînê*, beşekî terxan dike li ser tesnîf û naveroka berhemê û pê re jî behsa sedem û motîvasyonê xwe ya berhevkarî û nivîskariyê dike. Bi taybetî di destpêka *Xwençe I* de, rasterast

¹¹ Hevpeyvîna bi Zeynelabidîn Zinar re, Karamürsel. (18.06.2014).

merama xwe tîne ziman û sedemên ku ew bo nivîsandina pirtûkê motive kiriye, wiha eşkere dike:

Sedemê çîroknivîsandina min ev e, ku di her girtineka min de, ji bil îşkenceyên hov û kesnedîtî ku dijminan li min û li peyrewên dozê dikirin, bi deh çaran çêr û pêçarî û tan û niçên îşkencekirên Cunta Faşîst a Tirkiyê dihatin rûyê min; ku tiştêkî nivîsî yên kurda tune, û ne ew kes in ku doza dewletçêkirinê bikin! Tim û tim ji me re wisa digotin. Bê guman ew peyvên şor û piçûkxistinî li min gelekî tesîr kirin. Ji ber van sedemana, min ev pirtûk nivîsî.¹²

Çawa ku ji gotinên navborî jî tê derxistin, peyv û şorên ku îşkencekirên cuntayê bo nivîskar gotine, tesîreke zehf mezin li ser wî çêkirine û bûne sebeb ku ew armancên xwe ji nû ve diyar bike. Ji ber ku li gorî cuntacyên îşkencekir tiştêkî nivîskî yên kurda tune ye, nivîsandin dibe armanca sereke ya nivîskar. Ya rast, ev dij-helwesta nivîskar bertekeke xurt û berdewam ava dike bo wî. Çimkî bi salan ew li ser vê xetê dimeşe û motîvasyonê xwe zindî dihêle. Meriv dikare li vir angaştê ku Yekdeş û Erdem bo xala polîtîk tînin ziman li ser vê meseleyê jî şirove bike. Yekdeş û Erdem, di xebata xwe de behsa hêla polîtîk ya nivîsandina bi kurdî dikin û motîvasyonên nivîsandinê di serdema dereng ya osmaniyan de wiha destnîşan dikin:

Nivîsek xwedî şayan e ku behsa xwe bike; lê heger nivîskar nikaribe xwe ji ber polîtîkbûnê teslimî hêza nivîsê bike û ji vê “xala polîtîk” nivîsîn/axaftin ger bêveger be, dengê derdikeve ku xwezaya nivîsê di nav bêdengiyekê de perçe dike. Di vê rewşê de ya ku tê nivîsîn ji nivîsandinê wêdetir rengê gotinê dide. Hêjahiya “qada stratejîk” ya ku nivîskar li gorî tiştê ku dixwaze binivîse xwe lê bi cih dike, diyarkereke girîng e ji bo atmosfera polîtîk ya nivîsê û bi giştî jî ya metnekî. Serdemeke ku nivîsandin bi serê xwe jî karekî polîtîk e –ji bo kurdî di her serdeman de- nivîsandina bi kurdî “axaftina” ji xala herî polîtîk e.¹³

Atmosfera polîtîk ya ku nivîskar jê tê, rewşa qedexe, zordarî û tadeyên ku li ser kurdî û kurdan hatine sepandin, “nivîsandin” kiriye kiriyareke polîtîk û helwesteke bitalûke. Wekî li jorê jî hate behskirin ji ber ku îşkencekir ji Zinar re dibêjin “tiştêkî nivîsî yên kurda tune”¹⁴, ew dikeve hewldana nivîsandina berheman

¹² Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe I*, Pencînar, Stockholm 1989, r. 7.

¹³ Ömer Faruk Yekdeş, & Servet Erdem, “Wêjeyêke Cudaxwaz An Wêjeyêke Perçebûyî? Di Serdema Dereng Ya Osmaniyan De Wêjeya/Ën Kurdî”, (wer.Dawid Yeşilmen- Ömer Delikaya), *Wêje û Rexne*, j.8, Diyarbekir 2016, r. 16.

¹⁴ Zinar, *Xwençe I*, r. 7.

da ku li ser hesabê şexsê xwe îdfaya ku nebûna berhemên kurdî berpêş dike bi renegekî pûç bike. Di heman demê de hewla nivîskar ya ku *nebûnê* ji holê radike, baweriya nebûna berhemên kurdî bi meriv re çêdike. Bi heman rengî eger em bi qewlê Yekdeş û Erdem bînin ziman “nivîskar wê ji hebûna nivîsekê zêdetir hewl bidin *nebûna* wê fêmkirin/vebêjin.”¹⁵ Zinar jî bi helwesta xwe ve beşdarî vê nîqaşê dibe û bi kitabên xwe ve dixwaze bersivê xurt bide angaşên nebûna zimanê kurdî. Bo nimûne, ew di beşa “agahdarî”yê ya *Xwençe II* de, hizra xwe wiha tine ziman;

Mixabin bi sedsalan e ku ev Mîrata Kurdî bi destên dijminan hatiye perçiqandin, ew şewitandine, li me qedexa kirine û me ji vê gencîneyê bêpar hiştine. Lê îcar divê ku her kurdekî bîrewer, zana û rewşenbîr bi bîr û baweriya xwe ya welatparêzî ji bo berhevkirin û germiyandina vê mîrata bav û kalan bêsekan bixebite.¹⁶

Wekî ku ji gotinên nivîskar jî tê fêmkirin, ew qala xedexa û zordariya li ser mîrata kurdî dike û dibêje kurd ji gencîneya folklorê xwe bêpar hatine hiştin. Lewma berhevkariyê wekî wezîfeya her kurdekî dibîne ku bi hesta “welatparêzî”yê bi vê erkê rabe. Bi ser de jî girîngî û aciliyeta berhevkariyê bilindtir dinirxîne û dibêje kesên berhevkariyê dikin para xwe ya “şeref û namûsê” werdigirin:

“Ez di vê baweriyê de me jî ku dê her kurdekî bîrbir dest bavêje vî karî pîroz û berpirsiyariya xwe li hember gelê xwe jar û bindest bi cih bîne. Lewra ew kesên wisa herweha para xwe ya şeref û namûsê jî distînin û wijdana wan jî rihet û hêsan dibe! Sedemê herî girîng jî ev e, da ku nîfşên li pey me di biwara nîfşa niha de gilî û gazinan nekin û li me nifir û afir nebarînin.”¹⁷

Egereke din a ku Zinar bo berhevkariyê motîve dike, metirsiya jidestçûna materyalên folklorîk e. Li gorî Zinar “xwînmijên Kurdistanê” li “mîras û genciyên bav û kalan” xweyî derdikevin û ji xwe re dikin serwet.¹⁸ Wekî ku tê dîtîna piraniya motîvasiyona Zinar wekî reflekseke li hember serdestan xuya dike û xebatên xwe de vê yeke bi eşkereyî tine ziman. Lêbelê ev ji hin aliyan ve di metoda lêkolîna wî de dikare wekî qelsî bête wesifkirin. Lewra xebatên berhevkariyê divê rêbazên ilmî bişopînin û xwe bispêrin qaîdeyên qebûlbar ên qadê. Di vê derbarê de Hîkmet amaje

¹⁵ Yekdeş - Erdem, h.g., r. 17.

¹⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe II*, Pencînar, Stockholm 1990, r. 8.

¹⁷ Zinar, *Xwençe II*, r. 8.

¹⁸ Zinar, *Xwençe I*, r. 7.

pê dike ku folklorzanên kurd “ne mecbur in ku folklorê xwe bi helwesteke refleksî ya li hember çand û etnîsîteyên serdest derxin meydanê.”¹⁹ Herwiha ew berdewamî dibêje “tu pêdîviya folklorzanên kurd bi motîvasiyoneke wiha re nîne.”²⁰ Mixabin endîşeya îspatkirina hebûna ziman û folklorê kurdî ji destpêka berhevkarîya kurdî û pê de berdewam kiriye. Bo nimûne, rewşenbîr û nivîskarê dewra osmaniyan Kemal Fewzî çend çîrokên kurdî werdigerîne tirkî û diweşîne. Li gorî Pertev, Kemal Fewzî dixwaze hebûna çand û nasnameya kurdî di nav keresteyên folklorîk de îspat bike û dixwaze berhemên folklorê kurdî ji aliyê kesên pîspor ve bi awayekî zanistî bîn vekolan.²¹ Wekî motîvasiyona herî mezin ew dixwaze rê li ber bêxwedîtiya folklorê kurdî bigire.²² Lêbelê, Pertev “endîşeya îspatkirina hebûn û qedîmiya çand û folklorê kurdî ji bo tirkan”²³ wekî rêbazeke bi pîrsgirêk dinirxîne. Bi eşkereyî tê dîtin, ji serdema osmaniyan heta van salên dawî motîvasiyona hin berhevkarên kurd her bi endîşeya îspatkirina hebûna çanda kurdî ve hatiye kirin.

Li gorî Ekici, “Divê berhevkarîya efrandinên zanîna gelêrî li gorî planek û çêkirina agahiyeke diyar bê kirin. Xebateke berhevkarîyê divê li ser merheleyên diyar bê meşandin ku di her merheleyê de divê wekî xebateke icbarî hin kêşeyên girîng bîn rexnekirin û ew kêşe bîn çareserkin.”²⁴ Keskin jî problemên xebatên folklorê kurdî li ser du xalan dabeş kiriye; pîrsgirêkên dezgehî û pîrsgirêkên teorî.²⁵ Li gorî Keskin pîrsgirêkên dezgehî “bi giştî pîrsgirêkên têkildarî sazîyan û sazîkirinê ye.”²⁶ Mixabin, ji ber van pîrsgirêkan, xebatên çanda folklorê kurdî û berhevkarîya wan pêrgî problemên berhevkarîyê yê metodolojîk tînin. Ji ber ku “Her çend ku bi nêrîneke amatorî, wekî çûyîna deverê ji deveran bo kesayetekê/î jêder ango pejiwandina me ji bo yek ji wan kesayetên ku em dibînin û qeydkirina çîrokên wî/wê

¹⁹ Bedran Hîkmet, *Teoriyên Folklorê*, weş. Lîs, Diyarbekir 2016, r. 118

²⁰ Hîkmet, h.b., r. 118.

²¹ Ramazan Pertev, "Xebateke Girîng Di Dîroka Folklorê Kurdî De: Kemal Fewzî û Berhevkarîya Çîrokên Kurdî", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* 2 (2016), r. 54.

²² Pertev, h. b., r. 48.

²³ Pertev, h. b., r. 58.

²⁴ Metin Ekici, *Halk Bilgisi (Folklor) Derleme ve İnceleme Yöntemleri*, Geleneksel Yayıncılık, Ankara 2015, r. 25.

²⁵ Necat Keskin, “Pîrsgirêkên Giştî yê Xebatên Folklorê Kurdî û Çend Pêşniyaz”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C:2/1, Mêrdîn 2017, r. 11.

²⁶ Keskin, h.g., r. 11.

guncan be jî ji bo pêkanîna xebateke baş a berhevkarîyê divê miheqqeq pirsên diyar bîn bersivandin û amadehiyên diyar bîn kirin.”²⁷

Li gorî Kardaş di pirtûkên berhevkarîyê yên kurdî de pirsgerêkên derbarê metodolojîyê derdikevin holê.²⁸ Ew pirtûkên wekî *Çîrokên Gelerî* ya M. Xalid Sadînî, *Çîrokên Gelerî Ji Herêma Botan* ya Mesut Fidan, *Çîrokên Gelerî* ya Rukiye Özmen, *Çîrokên Kurdan* ya Mehmet Öncü dinirxîne û problemên cihêreng di pêvajoyê û rê û rêbaza berhevkarîya wan destnîşan dike.²⁹ Li gorî Kardaş ji bo îstifadekirina ji berhemên berhevkarîyê di akademîyê de û bo xebatên din, herî kêrbar divê berhevkar van hişyariyan li ber çavan bigirin:

- Îrora di nav xebatên folklorê de tenê berhevkarîna keresteyeke folklorîk ne tiştêkî muhîm e. Dundes di nivîsara xwe ya bi navê “Tevn, Metin û Peywend” destnîşan dike ku ji bo metneke folklorê tam bê fêmkirin divê bala meriv li ser tevna (texture) wê, metna (text) wê û mercên dorhêlê (context) be. Bi gotineke din cihê berhevkarîyê, mercên berhevkarîyê û şiklê berhevkarîyê divê bê zanîn.
- Gava keresteyeke çanda devkî were berhev kirin divê agahiyên kesî/ê çavkanî ên wekî nav û paşnav, emr û navê cihê ku lê bûye, tehsîla wî/wê, ji kê hîn bûye, pîşe, dîroka berhevkarîyê bê destnîşan kirin û ji bo karê xwîneran hêsantir be divê ew nimûneyên folklorê bîn nimrekirin.
- Divê bi tu awayî têkiliyê devokê nebin, divê bi gumana standarbûn û nêzî zimanê standarbûnê tevnegerin. Nexwe di dahatûyê de dê nebe melzemeyeke ji bo xebatên li ser ziman.

Zinar dema ku ev berhevkarî kirine ji kesên çavkanî dûr bûye. Ji ber vê yekê wî bi xwe pîraniya berhevkarîyê bi rêya “xebata meydanî” nekiriye ku rêbazên zanistî yên berhevkarîyê pêwîst dike. Û herwiha wî di pêvajoya berhevkarîyê de jî cih negirtiye. Zinar di destpêkên Xwençeyan de diyar dike ku di nav kar û nivîsên wî

²⁷ Ekici, h. b., r. 25.

²⁸ Canser Kardaş, <http://t24.com.tr/k24/yazi/kurt-masallari,308> (Pêgehîn 07.07.2018).

²⁹ Kardaş, h.g.

de “şaşî û nerastî” jî çêdibin. Herwiha ew ji ber van şaşî û xeletiyên “bi hêvî ye ku dê xwendevanên dilovan rexneyên neçak nebarînin û gelşeyên bêxwê dermexin holê.”³⁰

Dîsa di rê û rêbazên berhevkarîya Zinar de kêşeyeke din heye ku di hin destpêkên pirtûk û çîrokan de çavkaniya wan keresteyên folklorîk ji kê girtibe nanivîse. Eşkere nekirina kesên wekî çavkanî bi xwe bi van hincetan ve gire dide; “Mixabin wan kesan destûrê nedan ku navê wan beyan bikim. Ez ji wan kesan re û ji wan ên ku emekê wan bi pirtûkê de çêbûne sipasiyên biratî pêşkêş dikim.”³¹

Bo nimûne, di têbiniya Zewaca Qijik û Kevokê de navê kesê çavkanî nade û tenê dibêje ev çîrok ji “devê kurdekî welatparêz”³² hatiye wergirtin. Û di heman têbiniyê de li ser çîroka navborî dibêje ku “di nivîsandinê de, em têkilî devoka çîrokbêj nebûn, tenê me li gor zanîna xwe ji aliyê rastnivîsê hin guhertin xistê”³³ Wekî ku tê dîtî nivîskar hem kunyenameya kesê çavkanî nedaye hem jî ji aliyê *rastnivîsê* ve desttêwerdan li ser metna resen kiriye û xwestiye ku keresteya folklorîk nêzîkî zimanê standart ê kurdî be. Ev yeka ji bo reseniya metne xetereyêke bingeîn pêk tîne û keresteya folklorîk bo xebatên akademîk ên dahatûyê nikare bibe malzemeyêke otantîk. Çimkî dema ku zimanê metnekê hate sererastkirin û standardîzekirin wê demê taybetmendiyên devoka ku metnê jê hatiye berhevkirin wînda dibe.

Bo nimûne, di kilama Eliyê Daman Beg de wekî têbînî diyar kiriye ku “ev çîrok stranek bûye ku jê gelek peyvik nedihatî zanîn, lewma wî ev bi awayê çîrokê nivîsiye”³⁴. Çawa ku tê dîtî, nivîskar hem rûxsar hem jî naveroka keresteya folklorîk guhertiye û efrandina folklorîk carna bi temamî guherandiye.

Eger meriv di vê xalê de çend nimûneyan ji berheman biniqîne û li ser wan destnîşan bike wê demê tiştên ku em dixwazin bibêjin wê bi zelalî bête fêmkirin. Bo nimûne di *Xwençe VIIan*, kilama Kerr û Kulik de em rastî hin guhertinên peyvan tînin.

³⁰ Zinar, *Xwençe II*, r. 8.

³¹ Zinar, *Xwençe I*, r. 9.

³² Zinar, *Xwençe II*, r. 185.

³³ Zinar, *Xwençe II*, r. 185.

³⁴ Zeynelabidin Zinar, *Xwençe X*, Pencînar, Stockholm 1997, r. 123.

Zinar behsa şerîdekê dike ku gihaştiye ber destê wî. Lê me heman şerîd li ser youtubê dît û da ber hevdu, encameke wiha derkete holê:³⁵

Qeyda Youtubê: Wexta berê xwe da **mehellê** û çû,...³⁶

Deşîfrasyona Zinar: Wexta berê xwe da **taxê** û çû...³⁷

Qeyda Youtubê: Kerr û Kulik seh kirine ku **toplantîk** li hêla Emer Axa heye...³⁸

Deşîfrasyona Zinar: Kerr û Kulik seh kirine ku **civînek** li hêla Emer Axa heye...³⁹

Qeyda Youtubê: Kulik li namê nêrî destê xwe avêt **cêba** xwe....⁴⁰

Deşîfrasyona Zinar: Kulik li namê nêrî destê xwe avêt **bêrîka** xwe...⁴¹

Qeyda Youtubê: Rabe here, bila di filan saetê de me **beklemiş kin**⁴²

Deşîfrasyona Zinar: Rabe here, bila di filan saetê de li **pawûka** me bin.⁴³

Wekî ku ji mînakên jor jî tête fêmkirin, nivîskar hin deran desttêwerdanên ciddî li ser deqa berhevkarîyê kiriye. Bo nimûne, *mehelle* wekî *tax*, *toplantî* wekî *civîn*, *cêb* wekî *bêrîk*, *beklemiş kin* wekî *pawûka* guhertiye. Herwiha bi dehan guhertinên bi vî rengî di berhevkarîyên wî de berdest in. Me tenê li vir nimûneyek da. Dema ku peyvek li gorî wî ne kurdî be jî ji ber şêwezara dengbêj û çîrokbêj hin peyvên tirkî di nav xebirdanê de bi awayekî xwezayî xuya bin, Zinar bi desttêwerdaneke ku dêsmana keresteya folklorîk xerab dike, bi renekî eşkere guherîna li ser berhema gelêrî çêkiriye bêtî ku xwîneran derbarê wê de agahdar bike.

³⁵ Nivîskar carna qasêtên ku di nav gel de berbelav in peyda kirine û derbasî li ser kaxiz kirine di berhemên xwe yên folklorîk de bi cih kirine. Li ser van nimûneyan meriv bi rehetî dikare metoda lêkolîn û berhevkarîya nivîskar bişopîne û desttêwerdanên ku wî li ser nimûneyên folklorîk kiriye, bibîne.

³⁶ <https://www.youtube.com/watch?v=Ghi1fmYzpFs> (Pêgehîn:15.04.2018).

³⁷ Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe VII*, Pencînar, Stockholm 1994, r. 154.

³⁸ <https://www.youtube.com/watch?v=Ghi1fmYzpFs> (Pêgehîn:15.04.2018).

³⁹ Zinar, *Xwençe VII*, r. 154.

⁴⁰ <https://www.youtube.com/watch?v=Ghi1fmYzpFs> (Pêgehîn:15.04.2018).

⁴¹ Zinar, *Xwençe VII*, r. 155.

⁴² <https://www.youtube.com/watch?v=Ghi1fmYzpFs> (Pêgehîn:15.04.2018)..

⁴³ Zinar, *Xwençe VII*, r. 155.

Di xebatên Zinar de pirsgirekeke din jî mijara redaksiyon û edîtoriyê ye. Di pîrriya berhemên nivîskar de karen edîtoriyê û redaksiyonê ji aliyê nivîskar bi xwe ve hatiye kirin. Herwiha ji ber ku weşanxane jî ya nivîskar bi xwe ye carna nivîsên wî yê ku li ser torên civakî hatine belavkirin bêyî ku ber destê redaktor û edîtorê re derbas bibin rasterast tîne weşandin. Vê yeke bi dehan kêmasî xistiye berhemên wî yê lêkolînî, latînzeyî û berhevkarîyê.

BEŞA DUYEM

2. Pirtûkên Berhevkarîyê

Zinar keresteyên folklorîk yên ji çanda devkî ya kurdî ji salên 1985an heta salên 2000î berhev kirine û ev berhevkarîyên xwe bi awayê rêzepirtûkan wekî *Xwençe I-X* amade kiriye. Ji ber ku nivîskar çîrok, kilam, dîlok, meselok û gelek cureyên din ên edebiyata devkî berhev kiriye û wekî hecm ev berhevkarî gihiştîye asteke bilind, hewcedarî pê dîtiye ku wan wekî cild bike rêzepirtûk. Ev rêzepirtûk di sala 1989an de bi cilda yekem ve dest pê dike û di sala 1997an de bi cilda dehan ve jî diqede.

Di amadekirina van pirtûkan de, nivîskar bi îmkânên salên nodî wekî kesekî sirgûn, bo nivîsandin û tomakirina evçend nimûneyên çanda kurdî kedeke mezin daye. Di heman demê de meriv dikare bibêje ku ev rêzepirtûkên ku ji berhevkarîyên folklorîk pêk tên, yekem ji hewlên mezin e ku ji aliye kurdekî ji Bakurê Kurdistanê ve hatiye bi dest xistin. Lewma berî Zinar, Bozarşan ne tê de, tu kesî li Bakurê Kurdistanê pirtûkên ew qas bihecm yên berhevkarîyê nedaye çapkirin. Wate Zinar yekem kes e ku bi awayekî şexsî be jî di dîroka berhevkarîya folklorîk kurdî de, nexasim li Bakurê Kurdistanê de bi karekî wiha rabûye. Herwiha nivîskar hin çîrokên ku di cildên *Xwençeyan* de hatine weşandin, piştî salan bo zarokan adapte kirine û wekî rêzepirtûkên zarokan ji nû ve çap kirine. Di vê beşê de, ne tenê pirtûkên berhevkarîyê yên ji rêza *Xwençeyan* lê herwiha pirtûkên din ên berhevkarîyê jî têne nasandin.

2.1. Xwençe I

Navê Pirtûkê: Xwençe I

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1989

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm

Jimara Rûpelan: 278

ISBN: 91 861463 0 5

Berhevkarê pirtûkê Zeynelabidîn Zinar, pirtûka *Xwençe I* li ser sê beşan saz kiriye. Zinar di destpêkê de agahdariyekê di derbarê berhevkarî, zor û zehmetiyên xebatên xwe de daye. Beşa yekem li ser gotinên pêşiyên e. 615 gotinên pêşiyên li vir civandiye. Gotinên pêşiyên li gor rêza alfabeyê nivîsiye.

Di beşa duyem de jî kilam hene. Zinar 67 kilam berhev kiriye. Di derbarê çavkaniyan de Zinar qala sê kesan kiriye ku piraniya nimûneyan ji van kesan hilgirtiye. Navê wan; Hozan Miradoyê Kerboranî, Hozan H û Hozan X in. Lê di her kilama serbixwe de hîç çavkanî nedaye. Kilam piranî di terzê dîlok, lawî, baciyan de ne. Di dawiya vê beşê de jî çend pêkenok, mamik û lîstikên zarokan bi cih kiriye.

Beşa sêyem jî çîrok in. Hejmara çîrokên ku hatine tomar kirin 182 heb in. Di nava her deh cild *Xwençeyan* de herî zêde çîrok di vê cilda yekem de cih digirin. Lê çîrok têkel in. Beşa çîrokan bi temamî ji çîrokan pêk nayê. Tê de ceribîn, fabl, pêkenok, agahdarî jî hene. Lewma meriv dikare bibêje ku metodolojiya senifandina keresteyan de lihevkirinek xuya nake. Çîrok zêdetir li ser meseleyên mele, sofî, feqe, jiyana di navbera jin û meran de ye. Gelek beşan de navê agahder tune ye ji ber ku agahderên ku çîrok, kilam, meselok û hwd. gotine nexwestine navên wan bîn nivîsin.⁴⁴

2.2. Xwençe II

Navê Pirtûkê: Xwençe II

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1990

⁴⁴ Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe I*, Pencînar, Stockholm, 1989.

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 285

ISBN: 91 86146 35 1

Xwençe II bi agahdariyeke du rûpelî dest pê kiriye û herwiha zehmetiyên berhevkarîyê aniye zimên. Zinar naveroka kitêbê li dawîya pirtûkê edilandîye. Zinar kitêb kiriye du beş û ew her du beş jî di nav xwe de kiriye binbeş.

Beşa yekem kiriye du parçe ango du binbeş. Binbeşa yekem, kilamên li ser bûyerên dîrokî ne. Binbeşa duyem jî kilamên evîniyê ne. Di binbeşa duyem de dozdeh kilamên li ser bûyerên dîrokî hene. Meriv dikare nave çend heb ji wan kilaman li vir wekî nimûne bide; Serhildana Mala Eliyê Ênis, Keremê Elî, Seyidxanê Kerr û hwd. Herwiha Zinar di hin kilaman de têbînî daye. Mesela di dawîya kilama bi navê Kuştina Şerîfê Temo de têbîniyek heye ku hem Şerîfê Temo daye nasîn hem jî peyv û cihwarên xerîb ên ku di kilamê de derbas dibin, rave kiriye. Gava ku meriv çavkaniya van kilaman dinêre, hinek bê çavkanî ne û di dawîya hinek kilaman de navê dengbêj hatiye nivîsîn.

Di binbeşa bi navê kilamên li ser evîniyê de jî bîst û yek kilam hene. Di wan bîst û yek kilaman de ya herî balkêş kilama bi navê Fatima Salih Axa ye ku Zinar, pêşî çîroka vê kilamê, paşê jî gotinên kilamê nivîsiye. Zinar dîsa di hin kilaman de tîbînî daye û navê hin eşîr û kesan rave kiriye.

Zinar beşa duyem jî wekî beşa yekem kiriye du binbeş. Navê van binbeşan; yek çîrokên rawilane (fabl) ya din jî çîrok û meselok in. Binbeşa bi navê çîrokên rawilane ji heşt çîrokên rawilan pêk tê. Her heşt çîrok jî bi formata fablan ji mijarên cihê cihê ji aliyê Zinar ve di vê kitêbê de hatiye amadekirin. Her çîrokeke serbixwe peyamek daye xwîneran. Çîroka Zewaca Qijik û Kevokê jî ji aliyê tevna bûyerê ve ji yê din cuda ye. Yanî di nava çîrokê de şeş çîrokên din jî hene ku hin meseleyan bi van çîrokên biçûk piştrast kiriye û derxistiye holê. Divê bê gotin ku di vê binbeşê de çavkanî nîne. Çîrok û meselok ango binbeşa dawî ya pirtûkê ji şeş çîrokan pêk tê.

Her meselokek li ser babetên curbicur hatiye gotin. Zinar di vê binbeşê de têtîniyek ango agahiyekek di destpêka çîroka Gul û Sînemê de daye ku ew jî, di derbarê zayenda heywanekî de daye. Dîsa di vê binbeşa navborî de tu çavkanî peyda nabin. Wekî din ev binbeş ji binbeşên din kintir e.⁴⁵

2.3. Xwençe IV

Navê Pirtûkê: Xwençe IV

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1990

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 262

ISBN: 91 630076 4 9

Di *Xwençe IV*ê de du beş hene. Di beşa yekem de sê binbeş hene ku her yek bi navekî serbixwe hatiye saz kirin. Navê binbeşan wekî kilamên dîrokî, kilamên evîniyê, lawîja mesîh daniye. Di binbeşa kilamên dîrokî de bîst û pênc kilamên dîrokî hene. Di kilamên dîrokî de ji bûyer an jî meseleyên di dîrokê de qewîmîne, eşîrên ku hin meseleyan de li hevdu nekirine, revandina keçekê û hwd hatiye pê. Lê hin kilam du caran hatine gotin. Sedema wê jî berhevkar xwestiye ku xwendevan guhertoyên din jî bibînin û bizanibin. Berhevkar di destpêka serê gelek kilaman de agahiyeke kurt ji bo kilaman nivîsiye. Dîsa berhevkar li binê her kilamê de çavkaniya kilamê nivîsiye. Binbeşa duyem jî li ser kilamên evîn, hezkirin û evîndariyê ye. Ev binbeş jî ji deh kilaman pêk tê. Pîranî kilamên evîniyê ne; ji devê xortekî ye ku li ser keçekê dibêje an jî ji devê keçekê ku li ser xortekî distirê. Binbeşa sêyem jî bi sernavê lawîja

⁴⁵ Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe II*, Pencînar, Stockholm, 1990.

mesîh pêk tê. Ev bi naveroka xwe ne babeta vê beşê ye. Lê ji ber ku tê de li ser evîna bihiştê û Îsa Pêxember hatiye nivîsin, berhevkar ew kiriye binê vê binbeşê.

Beşa duyem li ser çar binbeşên cihêreng hatiye pê. Ev çar binbeş; meselok, meselokên heywanan, şîroveya çend gotinên pêşiyên û çîrok in. Gava ku em binbeşa ewil a bi navê meselokan dinêrin her yek jî ji mesleyeke cuda cuda û pêkenok-leqemokên ji nav civata kurd hatiye berhevkerin. Di vê binbeşê de pêncî meselok hene. Di binbeşa meselekon de jî çavkaniya meselokan nehatiye nivîsin. Binbeşa duyem jî li ser meselokên heywanan e. Tê de şeş meselokên heywanan hene. Binbeşa sêyem jî li ser çend şîroveyên gotinên pêşiyên e. Di vir de gotineke pêşiyên wekî serenavekî hatiye nivîsin û hatiye şîrovekirin. Di binbeşa çarem de jî şeş çîrok hatine civandin. Ev her şeş çîrok jî navdartirîn çîrok in ku di nav gel de tên zanîn. Dîsa di vê binbeşê de çavkanî ango navê çîrokbêj nehatiye diyarkirin.⁴⁶

2.4. Xwençe III

Navê Pirtûkê: Xwençe III

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1991

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 297

ISBN: 91 861463 9 4

Xwençe III wekî yên berî xwe bi temamî ji kelepura kurdî ve hatiye dagirtin. *Xwençe III* li ser du beşan dabeş bûye.

⁴⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe IV*, Pencînar, Stockholm, 1990.

Beşa yekê li ser kilamên dîrokî û evînî û govendiyê ye. Zinar di pêşgotina kitêbê de diyar kiriye ku ev kilamên dîrokî pîranî ji devê dengbêjan bihistiye û nivîsiye. Di beşa kilamên evînî û govendê de pêncî çîrok hene. Di vê beşê de jî tu çavkanî tune ye.

Beşa duyem jî li ser çîrok û meselokan in. Di vê beşê de sê binbeş hene. Di binbeşa bi navê meselokê de şêst û neh meselokên ji hev cihê hene. Binbeşa din bi sernavê çîrokên rawilan e ango fabl in. Tê de heşt çîrokên rawilan heye ku her yek şîret û nesîhetan dide xwîneran. Di binbeşa bi navê Cyê de jî heft çîrok hene ku berhevkar ji wan çend heban piştî wextan wekî kitêbên serbixwe li çapê dixê.⁴⁷

2.5. Xwençe V

Navê Pirtûkê: Xwençe V

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1991

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 293

ISBN: 91 630 0762 2

Xwençe V ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de binbeş nîne. Tenê bi navê kilamên evînî û gelêrî, sernavek serbixwe heye. Di vê pişkê de pencî û şeş kilam hene. Lê divê bê gotin ku di nav wan de helbesteke bi navê “pêşkêşî xaça sor” heye ku anonîm nîne, ji aliyê Zinarve hatiye nivîsîn. Li gorî gotina Zinar ev helbest bi xeletî di vê kitêbê de cih girtiye.⁴⁸ Zinar ev kilam wekî diyarî ji bo saziya ‘Xaça Sor’

⁴⁷ Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe III*, Pencînar, Stockholm, 1991.

⁴⁸ Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe X*, Pencînar, Stockholm, 1997, r.7.

nivîsiye. Kilamên vê beşê piranî li ser evîn, mêrxasî û bûyerên dîrokî ne. Gava ku meriv li çavkaniyên kilamên vê cildê dinêre sê kes dertên pêşiya me; Hozan Faris, Seîd Gabarî, Beşîr Botanî. Hin kilamên bê çavkanî hene lê di derbarê vê de jî nivîskar Zinar dibêje ku ev malê gel e ango anonîm in.

Beşa duyem li ser çar binbeşan hatiye hazirkirin. Navê wan jî serpêhatî, meselok, meselokên rawilan û çîrok in.

Binbeşa ewil bi navê serpêhatî ji du serpêhatiyan pêk tê. Navê wan jî Kafîr Mistê û Mala Emer Axa ne. Herdu serpêhatî jî bê çavkanî ne. Zinar, di dawiya serpêhatiya Mala Emer Axa de kevanekê vekiriye û gotiye ku em negihane encama vê serpêhatiyê.

Meselok, duyem binbeşa beşa duyem e. Şazdeh meselokên cihê cihê di vê binbeşê de hene. Zinar, bûyerên ku wekî henekî, ramanî, xemgînî û hwd di nava jiyane de hatine serê merivan, nivîsiye. Ev binbeş serdanpê bê çavkanî ye.

Binbeşa sêyem, meselokên rawilan e. Gava ku meriv meselokên rawilan dinêre pêrgî çar meselokan tê. Di dawiya meseloka zirra kerê û lotta devê de helbesteke Cegerxwîn hatiye bicihkirin.

Zinar binbeşa çarem a bi navê çîrokê jî ji hejdeh çîrokên texlîd texlîd aniye pê. Di nav çîrokan de em rastî hin motîfan tên ku ew jî ev in; hesp, mar, rovî, dêw, heft.⁴⁹

2.6. Siyabend û Xecê

Navê Pirtûkê: Siyabend û Xecê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1992

⁴⁹ Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe V*, Pencînar, Stockholm, 1991.

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 16 X 20 cm.

Jimara Rûpelan: 160

ISBN: 91 630122 2 7

Çîroka Siyabend û Xecê çîrokeke bi nav û deng e ku gelek varyantên wê di nav gel de tê gotin. Îcar berhevkar Zinar jî bi varyanteke vê destanê di pirtûka xwe de nivîsiye. Zinar di bergê çîrokê de wekî destan nivîsiye. Wî pirtûk kiriye heşt beşan lê beş bi temamî ji hev venaqetin. Em dikarin bibêjin ku ji zaroktiya Siyabend dest pê kiriye ji belangazî, birçitî, lêdan, fen û fûtên ku aniyê serê gundiyan, têkiliya navbera ap û amojina wî, xortanî, dilketiya wê ya Xecê û heta ber bi welatê rojhilatê ve yeko yeko serpêhatiya Siyabend bi awayekî destanî li pêş xwîneran raxistiye. Divê bê gotin ku di her serpêhatiyeke Siyabend ango piştî her bûyereke mezin, kesekî bi navê Kalê Pîr heye her tim hin gotinan wekî şiklê dengbêjiyê davêje ser meseleyên Siyabend. Yanî kurteya bûyerê bi hale dengbêjiyê de sitriye. Di hin cihan de Zinar, navê hin dever û meknan bi navên wan ên îroyîn êşkere kiriye. Bi gelemperî serpêhatiya xortê bi navê Siyabend bi berhevkarîya Zinar bi careke din hatiye nivîsin.⁵⁰

2.7. Xwençe VI

Navê Pirtûkê: Xwençe VI

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1993

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm

⁵⁰ Zeynelabidîn Zinar, *Siyabend û Xecê*, Pencînar, Stockholm, 1992.

Jimara Rûpelan: 266

ISBN: 91 630168 9 3

Xwençe VI li ser du paran parve bûye. Beşa yekem ji du binbeşan pêk tê. Sernavê binbeşa Ayê stiranên têkel in. Ev binbeş tenê ji danberhava du dengbêjan pêk tê. Ev herdu dengbêj gelek kilamên babetcihê avêtine berhev. Di binbeşa Byê de jî heşt starnên bi sernavê stranên evînî û gelêrî hene.

Beşa duyem jî ji çar binbeşan pêk tê. Binbeşa Ayê bi sernavê “serpêhatî”yê ku serboriya kesekî bi navê Mîr Mehmûd vedibêje. Binbeşa Byê jî ji nozdeh meselokan hatiye pê ku sernavê wê jî “meselok” e. Binbeşa Cyê jî ji çardeh çîrokên rawilan pêk tê. A herî dawî jî binbeşa Dyê ku ji çardeh çîrokan pêk hatiye. Di vê binbeşê de di çîroka herî dawî de berhevkar mewlûda Melayê Bateyî şîrove kiriye û kiriye pexşan û wekî çîrok ji nû ve afirandiye. Navê wê çîrokê jî daniye “afirandina dine”. Divê ev çîrok di nav nimûneyên folklorîk de nehatina bicihkirin. Qasî ku em dibînin berhevkar di vê cildê de çîrok ji kê û ji devê kê hildabe wekî nav, temen, cih û emir, daye.⁵¹

2.8. Xwençe VII

Navê Pirtûkê: Xwençe VII

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1994

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm

Jimara Rûpelan: 278

⁵¹ Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe VI*, Pencînar, Stockholm, 1993.

ISBN: 91 972090 1 5

Gava ku em rûpelên pêşîn ên *Xwençe VII*an dinêrin di destpêkê de heman tarz (epîgraf, agahdarî, spasî) dîsa heye. Zinar, ev kitab kiriye du beş. Beşa yekem di nav xwe dibe du binbeş, beşa duyem jî di nav xwe de dibe sê binbeş. Di agahdariyê de Zinar gotiye ku ji xêncî strana Siyabendê Silivî hemû kilamên beşa yekem aîdê arşîva Radyoya Rewanê ne ku bi alikariya berpirsyar Nedim Dağdeveren ve gihaştîye destê wî. Zinar di vê cildê de jî gava ku stran neqil kirine hin caran navê cih û mekanên ku em pê nizanin di têbiniyê rave kiriye. Herwiha xêncî agahiyên erdnîgariyê, agahiyên sosyolojîk û siyasî jî hin caran pêrgî me tên. Eger mînak bê dayîn di têbîniya kilama Filitê Quto de Zinar, navê eşîr, serokeşîr, cih û taybetiyên wan tên ravekirin.

Beşa yekem bi temamî li ser stranan e. Lê Zinar beşa yekem kiriye du binbeş. Binbeşa Ayê stranên dîrokî ne û tê de dozdeh stran hene. Di têbiniyan de jî ji aliyê kîjan dengbêjî ve hatibe gotin navê wî li wir hatiye nivîsin. Binbeşa Byê jî stranên evîni û yên gêlêrî ne. Di vê pişkê de jî çil û du stran hene.

Beşa duyem jî kiriye sê binbeş. Binbeşa Ayê şeş meselokên ji hev cuda ne. Binbeşa Byê li ser du serpêhatiyên dûvdirêj pêk tê. Navê wan Kerr û Kulik, Şêxê Sen'anî ye. Binbeşa Cyê jî li ser çîrokan ne. Heft çîrokên kevnare pêk tê.

Di nav van çîrokan de çîrokeke ne anonîm heye ku divê meseleya wê bête ravekirin. Çîroka bi navê “pîraqil” mijara xwe ji kitêba Şêx Eskerî ya bi navê *Iqdê Durfam* digire. Di esl û asasa xwe de Şêx Eskerî ev çîrok di sala 1939an de helbestkî nivîsiye ku navê wê “pîr eqil” e.⁵² Zinar jî piştî wextan navê wê dike *Pîraqil* formeke nû dide vê çîrokê û *Xwençe VII*an de diweşîne. Dîsa ne dirist e ku berhemeke çîroksaziyê di kategoriya berhevkarîyê de cih girtiye.

⁵² Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe VII*, Pencînar, Stockholm, 1994, r.275.

2.9. Mîrate

Navê Pirtûkê: Mîrate

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1994

Ciyê Weşanê: Şam

Ebada Pirtûkê: 16 X 20 cm.

Jimara Rûpelan: 120

ISBN: 91972090 5 8

Zinar, di vê pirtûkê de qismek listikên kurdên Bakurê Kurdistanê li dorhêla herêmên Xerzan, Reşkotan, Bişêriyê berhev kiriye.

Berhevkar kitab kiriye du beş. Beşa yekê ji listikên zarokan, beşa duduyan jî ji listikên mezinan pêk tê. Berhevkar di hin listikan de bi berfirehî behsa awayê listinê kiriye, di hinekan de jî zêde derbarê listikan de agahî nedîtye û kurt biriye. Bi rêya wêneyan xwestiye awayê listinê bi dîtbarî nîşan bide. Pirtûk bi temamî 47 listikên kurdî pêk hatiye.

2.10. Xweşber

Navê Pirtûkê: Xweşber

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1994

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 16 X 20 cm.

Jimara Rûpelan: 86

ISBN: 91 972090 4 X

Pirtûka bi navê *Xweşber*⁵³ ji çar çîrokên cuda pêk tên. Ev çîrok pêşî di rêzepirtûkên *Xwençeyan* de cih girtiye. Paşê jî her yek bi serê xwe li gorî asta zarokan hatine hazirkirin û weşandin. Navê her çar çîrokên ku *Xweşberê* de hene ev in: Pîra Kût û Dîkê Derpîkurt, Hecî Rovî⁵⁴, Beranê Sêr, Keywan Paşa û Keçelok.⁵⁵

2.11. Xwençe VIII

Navê Pirtûkê: Xwençe VIII

Berhevkar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1995

Ciyê Weşanê: Şam

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm

Jimara Rûpelan: 288

ISBN: 91 972090 7 4

Pirtûka *Xwençe VIII*an ji du beşan pêk tê. Beşa yekem li ser du şaxan dabeş bûye. Binbeşa Ayê bi stranên dîrokî hatiye dagirtin. Di vê binbeşê de sêzdeh kilamên dîrokî hene ku hinekên wan ji aliyê dengbêjan ve heta niha jî tê gotin. Çend mînak ji

⁵³ Xweşber wekî peyv tê wateya berhema xweşik.

⁵⁴ Bo nimûne, çîroka bi navê “Hecî Rovî” ya di *Xwençe VI*an (1993) de di navbera rûpelên 141-144an de cih girtiye, di *Xweşberê* (1994) de, di navbera rûpelên 23-38an de cih girtiye û herwiha heman çîrok bi tevî adaptasyonan wekî pirtûk *Hecî Rovî* (2003) hatiye çapkirin. Meriv dikare heman qiyasê bo çîrokên din ê Xweşberê jî bike ku pey re wekî pirtûkên serbixwe hatine çapkirin.

⁵⁵ Zeynelabidîn Zinar, *Xweşber*, Pencînar, Stockholm, 1994.

wan kilamên dîrokî; Mîro, Hekîmo, Fîlîtê Quto. Binbeşa Byê jî li ser stranên evînî û gelêrî ye. Bi tevahî heşt stranên evînî û gelêrî di vê binbeşê de cih girtine.

Zinar beşa duyem jî kiriye sê binbeş. Binbeşa Ayê meselok in û tê de neh meselokên cihê cihê hene. Meselokên ku di vir de cih girtine hem ji tarîxa nêz in û hem jî tê de pêkenok hene. Binbeşa Byê jî bi navê serpêhatiyê ye. Di vir de jî şeş serpêhatî hene. Navê çend serpêhatiyan jî; Elo û Fatimê, Sofî Miho. Binbeşa Cyê jî li ser çîrokan e. Tê de sê çîrok hene ku navê wan jî; Paşê û Sê Kurên Xwe, Mihemedê Axê û Mihemedê Wezîr, Kutilkek û Nîv.

2.12. Xwençe IX

Navê Pirtûkê: Xwençe IX

Berhevkar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1996

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm

Jimara Rûpelan: 290

ISBN: 91 972779 0 8

Berhevkar Zinar, *Xwençe IX* kiriye du beş. Beşa yekem tenê ji straneke evînî û dîrokî pêk tê. Ango em dikarin bibêjin ku du binbeşên vê beşê hene ku bi şiklê A û B bûye du bir. Navê strana evîniyê Hey Canê ye ku berhevkar navê kesê çavkanî nedaye. Navê strana dîrokî jî Hemdîn û Şemdîn e ku ji devê kê girtibe diyar kiriye.

Di beşa duyem de jî pênc binbeş hene. Binbeşa Ayê ji deh meselokan, binbeşa Byê ji sê û sê pêkenokan, binbeşa Cyê ji bîst û heft xweşbêjan ku tê de gotinên pêşiyên û biwêjin kurdî hene, binbeşa Dyê jî ji yazdeh mamikan, ya herî dawî jî binbeşa Eyê ye ku ji şeş çîrokan pêk tê. Di vê beşê de binbeşa C, D, Eyê de navên

kesên çavkanî hatine diyarkirin. Yanî ji devê kê her çi hatibe girtin berhevkar navê wan hin caran jî temen û cihê jidayîkbûna wan diyar kiriye. Lê di binbeşa Dyê ya ku bi navê “mamik”an de berhevkar qala girîngiya mamikan kiriye.

2.13. Xwençe X

Navê Pirtûkê: Xwençe X

Berhevkar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1996

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm

Jimara Rûpelan: 268

ISBN: 91 972779 32

Xwençe X pirtûka dawî ya li rêzepirtûkên *Xwençeya* ye. Ev pirtûk jî kêma zêde be jî ji aliyê şiklî ve dişibe yên din. Zinar, di vê pirtûkê de tabloyeke yekrûpelî ya yekûna nimûneyên folklorîk û cureyên wan çêkiriye. Li gorî vê tabloyê di deh cildan de bi ser hevdu çend heb gotinên pêşiyar, meselok, lawîj û hwd, hatibin berhevkerin, tînan nîşandan. Herwiha çiqas şaşî û çewtîyên di cildên *Xwençeyan* de hatine kirin di vê pirtûkê de yeko yeko hatine destnîşan kirin û ji xwîneran lêborîn hatiye xwestin. Paşê jî naveroka deh cildên *Xwençeyê* li gorî rêzê di vê kitêbê de bi cih kiriye.

Xwençe X li ser du beşan e. Zinar her du beşan jî di nav xwe de kiriye binbeş. Wan binbeşan jî li gorî rêza alfabeyê A, B, C û hwd hazir kiriye.

Beşa yekem li ser du binbeşan ava bûye. Binbeşa Ayê li ser stranên dîrokî ye. Tenê du kilamên dîrokî tê de hene. Navê wan Şerê Qazî Mihemed û Xwîna Şêx Seîd, Mehmûdkî û Etmankî ye. Zinar, di destpêka kilama Şerê Qazî Mihemed û Xwîna Şêx Seîd de bi tîbîniyan navê dengbêj û naveroka kilamê vedibêje. Di kilama

Mehmûdkî û Etmankî de jî heman şiklî bi têbîniyê meseleyê zelal dike. Di binbeşa Byê de jî heft stranên evînî û gêlêrî hene. Ji xêncî kilama Siltanê û Xelef Begê hemû kilamên vê beşê kurt in.

Beşa duyem jî li ser çîrokan hatiye saz kirin. Zinar çîrokên vê beşê di binbeşa Ayê de bi cih kiriye. Ango tenê binbeşa Ayê heye. Ji dozdeh çîrokên curbecur hatiye amade kirin. Zinar di kilama Eliyê Daman Beg de diyar kiriye ku ev kilam stranek e lê ku gelek peyvên wê nehatine zanîn ji ber wê bi şiklî çîrokî nivîsiye. Derbarê çîrokê de jî wekî nîşe agahî hatiye dayîn. Wekî ku tê dîtin berhevkar, ji ber nefêmbariya materyala berhev kirî, forma stranê bo xwîneran kiriye çîrok. Ev jî hemû taybetmendî û reseniya kilamê têk dibe.

2.14. Hemdîn û Şemdîn

Navê Pirtûkê: Hemdîn û Şemdîn

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1998

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 112

ISBN: 91 972779 7 5

Ev pirtûkeke serpêhatiyê ye. Lê mijara Hemdîn Şemdîn du sal beriya çapa vê pirtûkê wekî stran di *Xwençe IXan* de hatiye weşandin. Di destpêka pirtûkê de Zinar kesê çavkanî diyar kiriye. Ew kes jî Rifatê Darî ye. Zinar ev stran û meseleya folklorîk veguhastiye şikleke pexşanî. Mijara pirtûkê du paşayên zozanên Şerefîdînê ye. Ehmed û Huseyn birayê hevdu bûne. Ev herdu paşa li zozanên Şerefîdînê serek û rêvebirên sî eşîrên kurdan bûne. Wezîrekî Ehmed paşa hebûye navê wî Smaîl Beg bûye. Ev kes di rastiyê de kesekî xêrnexwaz û zikreş bûye. Lê vajî vê rewşa derûnî ew her tim devê xwe ji paşayê

xwe re çêkiriye û xwe di dilê paşayê xwe û gele xwe de şêrin kiriye. Wextek hatiye hemû eşîrên êlê yên zozanê Şerefîdînê li hember her du paşayan tûj kiriye da ku eşîr û milletên heremê serî li ber wan paşayan rakin. Bi ser de jî bi dek û dolaban her du paşayan jî berde hevdu da ku bixwe jî bikeve şuna wan. Axir armanca Smail Beg nayê şûnê ango nagihe armanca xwe. Çimkî zarên paşayan têgihîştî bûne û meseleya ku anîne sere bavê wan zû fêhm kirine. Hemdîn kurê Huseyn paşa ye Şemdîn jî kurê Ehmed paşa ye. Hemdînê kurê Huseyn Paşa ji apê xwe jî û ji yên din jî aqiltir û bi ferasettir bûye. Wî nehiştiye mesele zêde dirêj û tevlihevtir bibe. Pêşî li xwernexwaz û zikreşan girtiye nexwazim Smaîl beg. Wî bi alikariya diya xwe hemû meseleyên herema zozanê Şerefîdînê çareser kiriye. Êdî eşîrên heremê wekî rojên berê di nav aramiyê de jiyana xwe domandine.⁵⁶

2.15. Çivîka Bilûrvan

Navê Pirtûkê: Çivîka Bilûrvan

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2001

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 34

ISBN: 91 89491 17 3

Ev çîrok cara pêşîn di *Xwençe Xan* de çap bûye. Çîrok bo zarokan hatiye amadekirin. Naveroka çîrokê wiha ye; rojekî çivîkeke baqil hebûye, sitriyek di lingê wê re çûye. Kiriye hawar û gazinan da ku kesek aliyê wê bike ku sitriyê ji lingê wê derxîne. Bi wê hawar û gaziye tê li ber tendûrekê radiweste. Alîkarî ji pîrekî dixwaze da ku pîrê jî sitriyê ji linge wê derxe. Pîrê sitriyê ji linge wê derdixwe. Paşê çivîk vedigere tê sitriyê ji pîrê dixwaze lê pîrê dibêje ku wê sitriyê avetiye tendûrê û pê

⁵⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Hemdîn û Şemdîn*, Pencînar, Stockholm, 1998.

tendûra xwe pêxistiye. Pîrê dibêje sitrî tune ye lê heft nanan bidim tê. Çivîk heft nanên xwe hildide û ji wir diçe. Êdî çîrok ji vir heman terzî didome; Çivîk heft nanan dide heft beranan, heft beranan dide bûkekê, bûkekê dide bilûrekî. Di dawiyê de jî çivîk hertim li bilûra xwe dide û li daristanê bi şadî û aramî dijî.⁵⁷

Ji aliyê cureyê ve ev çîrok, çîrokeke zincîreyî ye.

2.16. Zira Kerê û Lota Devê

Navê Pirtûkê: Zira Kerê û Lota Devê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2002

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 35

ISBN: 91 89491 16 5

Ev çîrok ji serpêhatiya ker û hêştirê pêk hatiye. Kerek û hêştirek di gelî û zozanan de digerin, dixwin û jiyana xwe bi kêf û xweşî didomînin. Lê rojeke derengê şevê ker dixwaze bizire, hevala wî ya hêştir jî şîretan lê dike, dibêje ku eger tu niha bizirî wê karwanên derdorê bi me bihesin û bikin bin barên giran. Lê ker guhdariya hevalê xwe nake û dizire. Bi zirîna wî ve karwan bi wan dihesin û tên wan dixin bin baran. Ker dîsa kertiya xwe dike û bi xayîniyan barê xwe û xwe jî dide ser piştê hêştîr. Hêştîr bi vê yekê qayîl nabe û difikire û planek tê bîra wê. Li ciheke asê keys li xwe dibîne û dest bi lotikan dide. Ker û barên li ser piştê wê dikevin xwarê û ker

⁵⁷ Zeynelabidîn Zinar, *Çivîka Bilûrvan*, Pencînar, Stockholm, 2001.

dimire. Di vê çîrokê de peyama vê çîrokê jî; merivên ku guh nedin şîretan dawîye de poşmanî dibe para wan.⁵⁸

2.17. Pîra Kût û Dîkê Derpîkurt

Navê Pirtûkê: Pîra Kût û Dîkê Derpîkurt

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2003

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 40

ISBN: 91 89491 04 1

Bûyera vê çîrokê di navbera pîr û dîkekî de derbas dibe. Pîrê û dîk di nav daristeneke bê serî û bê bînî de bi hev re dijîn. Rojek ji rojan madê pîrê diçe danûkan. Radibe bi kêf û dilekî asan danûkan bikelîne da ku bixwe. Danûkên wê dikelin, lê dîka wê berê wê diçe û danûkan dixwe, xelas dike. Piştî vê yekê pîrê bi vê rewşê gelek xwe aciz dike û hers dibe. Hema bi carekî radibe dike digre davêje derve. Dîk jî bi vê yekê pir diêşe û dixwaze heyfa xwe ji Pîrê bigire. Dîk diçe bi ajalên wekî; mar, mişk û kûçikan derdê xwe ji wan re dibêje. Piştî van bûyeran hemû ajalên daristanê dibin yek û fendan li serê Pîrê dikin. Bi vî awayî Dîko heyfa xwe ji Pîrê digire.⁵⁹

⁵⁸ Zeynelabidîn Zinar, *Zira Kerê û Lota Devê*, Pencînar, Stockholm, 2002.

⁵⁹ Zeynelabidîn Zinar, *Pîra Kût û Dîkê Derpîkurt*, Pencînar, Stockholm, 2003.

2.18. Hecî Rovî

Navê Pirtûkê: Hecî Rovî

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2003

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 40

ISBN: 91 89491 09 2

Çîroka bi navê Hecî Rovî li ser serpêhatiyên roviyekî radiweste. Di vê çîrokê de roviyekî fêlbaz heye, dixwaze goştê dîkekî bixwe. Lê bi dek û dolaban nebe rasterast xwe nikare bigihîne goştê dîkî. Îcar roví radibe şaşikek dide serê xwe ku dîk bixapîne. Dîk jî bi vê tevgera roví şaş û metel dimîne û pê bawer dike. Dîk û roví bi niyeta hecê radibin bi rê dikevin, roví dîk û çend heywanên din dixapîne dibe kûla xwe. Lê di nav wan heywanan de dawidokek jî heye. Dora kuştina dawidokê tê ew jî planekê çê dike roví dixapîne bi awayekî dixwe defîkê. Êdî ew heywanên din jî ji destê roví azad dibin çîrok jî bi vî şeklî diqede.

Ev çîrok rewşa civakê radixe li ber çavan ku tê de peyamên eşkere hene. Meriv tê de dek û dolabên kesên olperest bi awayekî eşkere dibîne ku çawa ew ji bo berjewendiyên xwe, ol û ayîne îstismar dikin û pê sûd, payetî û qezencê bi dest dixin.⁶⁰

Ev kitab li ber çavên çar mamosteyên pedogog re derbas bûye. Di her rûpeleke pirtûkê de wêneyek tê de bi cih kiriye ku xwendina wê xweştir be ji bo zarokan.

⁶⁰ Zeynelabidîn Zinar, *Hecî Rovî*, Pencînar, Stockholm, 2003.

2.19. Nêçîra Çiyayê Reş

Navê Pirtûkê: Nêçîra Çiyayê Reş

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2003

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 62

ISBN: 91 89491 19 X

Çîroka bi navê Nêçîra Çiyayê Reş ji kelepura folklorê kurdî ye. Ev çîrok ji nû ve ji ber çavên du mamosteyên pedagog ve derbas bûye wisa li çapê ketiye.

Mijara çîrokê serpêhatiyên Mîrze Mihemed e. Paşayek bi navê Silqo Paşa hebûye. Heft kurên wî paşayî hebûne. Paşa rojekî bi nexweşiyê giran dikeve tê ber sikratê. Wesiyet dike da ku zarokên wî werin ba wî da şîretan li wan bike. Gelek şîret û nesîhatan li wan dike. Lê dibêje tiştekî pir muhîm heye divê hûn wê nekin. Dibêje lawên min eger ku ez mirim hûn tu car neçin nêçîra Çiyayê Reş. Piştî mirina bavên wan birayê mezin biryar dide da ku biçê nêçîra Çiyayê Reş. Her şeş dibin yek lê birayê herî biçûk Mîrze Mihemed qebûl nake. Dibêje we şîreta bavê me çî zû ji bîr kir. Her heft bira radibin diçin nêçîra Çiyayê Reş, ji wê pê ve gelek suqûmat û qewîmin têne ser wan. Dawiya dawî Mîrze Mihemed ji hemû bûyerên xerab xelas dibe û digihê armanca xwe.

2.20. Keywan Paşa û Keçelok

Navê Pirtûkê: Keywan Paşa û Keçelok

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2003

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 46

ISBN: 91 89491 23 8

Ev çîrok hem *Xwençe VIIan* hem jî di kitêba bi navê *Xweşber* de tê weşandin. Heman çîrok di *Xwençe VIIan* de bi navê Paşa û Keçelok e. Lê piştî gelek salan dîsa ji aliyê Zinar ve ji nû ve ji bo zarokan bi awayekî serbixwe tê çap kirin. Lehengê çîrokê Keçelok û Keywan Paşa ye. Mijara çîrokê li ser paşa û keçelok e. Paşa dixwaze welatê xwe bi aramî û adilane bi rê ve bibe. Jiber vê yekê hin caran ew û wezîrê xwe cil û bergê xwe digorînin li nav sûk û kolanên bajêr digerin da ku hal û waxtê xelkê xwe bizanibin. Lê wezîrê wî kesekî ne jîr û zana bûye. Her tim rêya xerab û nebaş tercîh kiriye. Rojek ji rojan paşa rastî xortekî keçelok tê. Ev xortê keçelok yekî pir baqil û zana bûye. Piştî vê hevnasînê gelek bûyer diqewimin û kêfa paşê zêdetir ji keçelok re tê. Êdî ji hevnasîna wê rojê ve paşa bi nêrîn û pêşniyazên keçelok tevdigire. Bi alikariya keçelok welatê paşê hîn baştir û aram dibe.⁶¹

2.21. Beranê Sêr

Navê Pirtûkê: Beranê Sêr

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2003

Ciyê Weşanê: Stockholm

⁶¹ Zeynelabidîn Zinar, *Keywan Paşa û Keçelok*, Pencînar, Stockholm, 2003.

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 40

ISBN: 91 8949128 9

Çîrok li ser serpêhatiyên merivekî sêr û xortekî bi navê Memo ye. Memo lawê malbateke feqîr e, li gundekî dijî û ji bo debara malê pir dixebite. Wekî her rojan diçe daran berhev dike û tîne li bajêr difiroşe. Lê rojekê merivekî sêr ji bo hedana keça xwe Memo dibe ba xwe û wî hînî sêran dike. Lê haya merivê sêr jê tune ku tiştê ku hînî Memo dike wê paşê bibe bela serê wî. Merivê sêr her çiqas xwestiye ku tiştên nebaş bîne serê Memo jî lê bi ser neketiye. Memo bi sêrên ku ji wî hîn bûye xwe kiriye şûna beranekî û ew têk biriye. Di çîrokê de peyama sereke ew e ku; merivên li ser rastî û başiyê bin her tim başî û rastî dibe para wan.⁶²

2.22. Abidê Şikeftê

Navê Pirtûkê: Abidê Şikeftê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2003

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 72

ISBN: 91 89491 20 3

Ev çîroka bi nav û deng ya Abidê Şikeftê bi gelek nav û naverokên curbecur heyânî îro jî di nava gel de tê gotin. Berhevkarê pirtûkê cara pêşîn ev çîrok di *Xwençe VIIan* de weşandiye. Piştî gelek salan (2003) carek din ji bo zarokên kurdan

⁶² Zeynelabidîn Zinar, *Beranê Sêr*, Pencînar, Stockholm, 2003.

bi awayekî serbixwe li çapê xistiye. Di pêşgotina pirtûkê de Zinar diyar dike ku ev pirtûk li ber çavên mamosteyên pedagog re derbas bûye û wisa li çapê ketiye. Di navbera herdu çapan de zêde guherîn nîne. Lê di pirtûka serbixwe de yanî eva ku em behs dikin li gor psîkolojî û nêrîna zarokan hinek lêkerên mîna kuştin, serjêkirin û hwd hatiye guhartin.

Lehengê çîrokê Mîrze Mihemed e. Neh birayên Mîrze Mihemed hebûne û kurên paşayekî Xerbê bûne. Paşa xwestiye deh kurên xwe bi carekî de bizewicîne. Çavên xwe li paşayekî wisa digerin ku her deh kurê xwe bi deh xwîşkan re bizewicîne. Axir li welatekî paşeyek dibîne û deh keçên wî bi kurên xwe re dizewicîne. Gava ku dil dikin bîn welatê xwe macerayên wan yê ecêb bi taybetî ya Mîrze Mihemed ji vegeê dest pê dike, heyanî hatina welatê bav û kalan didome.⁶³

2.23. Çîm Beg

Navê Pirtûkê: Çîm Beg

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2003

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 40

ISBN: 91 89491 39 4

Ev çîroka qîzekê ye ku ji aliyê merivekî reşik ve tê revandin û kurê paşe wê dibîne û pê re dizewice. Her gava ku kurê paşe bo bazirganiyê diçe welatê dîr jina wê jî bardar e lê çî gava ku jê re zerek çêdibe ew merivê reşik tê zara wê dihilde û li pey xwe îmajeke wisa dihêle ku diya wê zara xwe xwariye. Ev rewş wisa hetanî sê

⁶³ Zeynelabidîn Zinar, *Abidê Şikefî*, Pencînar, Stockholm, 2003.

zarokan didome, merivê reşik bi ser hev sê zarokên vê jinikê dibe ku navên wan Cîm Begê Mezin, Cîm Begê Piçuk û keçika bi navê Narxatûn. Piştî zara sisêyan kurê paşê jina xwe davêje zindanê û dîsa haziriya dawetekê dike. Di wê gavê de ew merivê reşik her sê zarokên jinika zindanê dibe teslîmî diya wan dike ku bibe xelasiya jinikê, herwiha ew merivê reşik ev her sê zar gelek bi nazikî mezin kirine û dane xwendinê. Paşê ev her sê zar hewl didin ku xebera avê xwe bi vê meseleye çekin, dema haja bavê van her sê zarokên delal bi meseleye çêdibe bûka teze paş de vedigerîne mala bavê wê, paşê wî merivê reşik digirin û tînin bo cezakirinê, di axiriyê de her sê zarok ligel dê û bavê xwe jiyaneke bextewar dijîn.

2.24. Qîza Paşayê Çîn û Maçînê û Hesenê Sênî

Navê Pirtûkê: Qîza Paşayê Çîn û Maçînê û Hesenê Sênî

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2003

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 40

ISBN: 91 89491 41 6

Ev çîroka Hesenê Sênî ye ku merivekî feqîr e û ew e ku debara xwe dike, rojekê ligel sê kevirên xwe yên gewher diçe ba paşê da ku li wir bixebite û wan her sê kevirên xwe wekî diyarî bide paşê. Lê keçikeke bedew her sê kevirên wî jê distîne û dibêje li pey min were, ez keça paşayê welatê Çîn û Maçînê me. Paşa hal û meseleyê ji Hesen hîn dibe û Hesen radibe ligel deh sîwariyan diçe wî welatê Çîn û Maçînê da ku keçikê dibîne. Lê di rê de ew sîwarî îxanetê li Hesen dikin û wî di bine bîrekê de dihêlin, bi qasî sê salan ew keçik bi kesî re nazewice û li benda Hesen dimîne ligel fîncaneke jehrê. Paşê Hesen bi vî awayî ji bîrê xelas dibe û dermanê

gurîbûna keça paşayekî din peyda dike di wê bîrê de. Ew paşa dixwaze keça xwe bide Hesên lê Hesên vê yekê qebûl nake û dibêje dergistiya min heye, paşê ev her du paşa daweta Hesên dikin û Hesên û dergistiya wî bi şadî ligel hev dijîn.⁶⁴

2.25. Ji Heftan Çar Şaxên Çîroka Gûl û Sînem

Navê Pirtûkê: Ji Heftan Çar Şaxên Çîroka Gûl û Sînem

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2005

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 196

ISBN: 91 89491 42 4

Herwekî ku tê zanîn di kelepura kurdî de gelek versiyonên çîrokan hene. Di çîroka Gul û Sînemê de jî versiyonên cuda cuda hene. Lê em ê di vê kurtexebatê de tenê li ser versiyoneke wê rawestin. Di vê versiyonê de Sînem paşayekî jîr û zana û gelek lihevhatî ye. Gulê ya keça apê xwe hêj di piçûkatiyê de biriye li cem xwe û mezin kiriye, piştê bi Gulê re zewiciye. Sînem û Gulê gelek wext ba hev dimînin. Lê rojekê Sînem ji Gulê dikeve şikê û li pey şopa wê dikeve. Dibîne ku Gulê xayîniyê bi wî dike û bi kesekî din re dikeve têkîliyê. Di çîrokê de berê Gulê ji tirsan Sînemî dixê şûfê segan lê paşê Sînem bi alîkariya jineke sêrbaz dibe meriv û tê Gulê dixê çûkekê û di qefesekê de dihêle. Ev çîrok jî wekî hebên hinarê li hemû cîhanê belav dibe.⁶⁵

Çîroka bi navê *Ji Heftan Çar Şaxên Çîroka Gûl û Sînem* cara ewil di *Xwençe II*an de derketiye. Lê Zinarî piştî gelek salan ev çîrok bo zarokan ji nû ve wekî pirtûkeke serbixwe çap dike.

⁶⁴ Zeynelabidîn Zinar, *Qîza Paşayê Çîn û Maçînê û Hesênê Sênî*, Pencînar, Stockholm, 2003.

⁶⁵ Zeynelabidîn Zinar, *Ji heftan çar şaxên çîroka Gûl û Sînem*, Pencînar, Stockholm, 2005.

2.26. Hevberdana Qijik û Kevokê

Navê Pirtûkê: Hevberdana Qijik û Kevokê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2005

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 162

ISBN: 91 89491 35 1

Ev çîrok di navbera qijîkek û kevokekê de derbas dibe. Qijik û kevok bi hev re dizewicin, demeke dirêj bi hev re bihurandine. Lê wekî ku mezinan jî gotine divê axa jin û mêran yek be, lê qijik û kevokê bi hev nekirine, qijik ji malbateke genî û laşxûr e, kevok jî ji malbateke pak û bi esl e. Ji ber van sedeman aciziyên ji hev kirine û di dawiyê de biryara hevberdanê girtine. Ji bo karê hevberdanê pêk bîbin çûne ba qaziyekî ku wan ji hev bide berdan. Her du, meseleya xwe ji qazî re dibêjin lê her yek dest bi naveroka çîroka hevberdanê dikin da ku xwe mafdar derxin. Qijikê dest pê kiriye çîrokên ku jinan mêrê xwe re xerabî kirine vegotiye û kevokê jî çîrokên li ser zilma mêran ku li ser jinan e vegotiye. Piştî van çîrokan qazî nekariye biryarekê bide û hevberdan çênebûye. Di çîrokê de peyama ew e ku her kes li gor çand, edet û toreyên xwe kesekî din re bizewice.⁶⁶

Çîroka bi navê *Hevberdana Qijik û Kevokê* cara ewil di *Xwençe II*an de derketiye. Lê Zinarî piştî gelek salan ev çîrok bo zarokan ji nû ve wekî pirtûkeke serbixwe çap dike.

⁶⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Hevberdana Qijik û Kevokê*, Pencînar, Stockholm, 2005.

2.27. Kalê Merivxwir

Navê Pirtûkê: Kalê Merivxwir

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2005

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 33

ISBN: 91 89491 45 9

Çîrok qala serpêhatiya kalê merivxwir, pîrê û her sê keçên wê dike. Pîrek hebûye sê keçên wê hebûne lê wextê wan ê mêrkirinê derbas bûye. Tu gumana pîra diya wan tunebûye ku kesin werin keçên wê bixwazin. Lê rojek ji rojan deriyê mala pîrê lê dide kalekî rûspî dibe xwezginaya keça mezin. Kalo gelek pere û zêr dide pîrê ku da carên din jî were her du keçên pîrê jî bibe. Pêşî keça mezin dixwaze û dibe şikefta xwe. Dû re her keça ortê jî dixwaze û dibe . Lê keçika biçûk aqil bûye. Dibîne ku kalê rûspî gelek kesan tîne di şikefta xwe de dixwe. Keça biçûk difikire û planek çêdike da ku bo felatê. Bi fend û bendan xwe ji destên kalê merivxwir xelas dike. Ew û pîra diya xwe ji wê şûnde jiyaneke xweş bi hev re didomînin.⁶⁷

2.28. Kewê Çîrokbêj

Navê Pirtûkê: Kewê Çîrokbêj

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

⁶⁷ Zeynelabidîn Zinar, *Kalê Merivxwir*, Pencînar, Stockholm, 2005.

Sala Weşanê: 2005

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 90

ISBN: 91 89491 37 8

Çîrok qala serpehatiyên kesekî bi navê Ehmed kiriye. Ehmed kesekî feqîr û belengaz e. Rojekê Ehmed di xewna xwe de dibîne ku zilamek xizneyek nîşanî wî dide, Ehmed şiyar dibe dibîne va ye ev zilamê ku xizneyek nîşanê wî daye li ber wî sekiniye. Ew zilam xizneyê nîşanî Ehmed dide. Ehmed pir dewlemend dibe û pereyên xwe di rêya xêrê de xerc dike û feqîr û belengazan xwedî dike. Gelek wext derbas dibe Ehmed dizewice û paşê biryar dide ku biçê hecê. Berî çûyîna xwe ji jina xwe re kewekî dikire û tîne dibêje ku bila jina wê tenê aciz nebe. Wexta Ehmed li hecê ye dilê xortekî karwancî dikeve jina wî. Karwancî ji bo ku jina Ehmed re bizewice pîreke sêrbaz dişîne ku here wê jinikê bîne. Pîrê diçe ku jinikê bixapine bîne lê her wexta ku diçe rastî kewekî tê. Ew kew her tim rastî pîrê tê dest bi çîrokan dike ku pîrê pê egle bike. Bi vî awayî sê roj derbas dibe û Ehmed ji hecê vedigere tê mala xwe. Lê karwancî jî nagêhê armanca xwe. Çîrok jî bi vî şiklî diqede.⁶⁸

2.29. Kerkerokê Bayê

Navê Pirtûkê: Kerkerokê Bayê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2005

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

⁶⁸ Zeynelabidîn Zinar, *Kewê Çîrokbêj*, Pencînar, Stockholm, 2005.

Jimara Rûpelan: 57

ISBN: 91 89491 31 9

Çîroka bi navê *Kerkerokê Bayê* cara ewil di *Xwençe VIIan* de derketiye. Lê Zinarî piştî gelek salan ev çîrok bo zarokan ji nû ve wekî pirtûkeke serbixwe çap dike.

Mijara çîrokê wiha ye; li welatekî, zêrker û xeratak hebûne. Dikanên wan li kêleka hevûdu bûne. Ev herdu camêran hin caran diketin lecê, wî digot ez kemerên zêrîn ên baş çêdikim, xeratî jî digot na ez kerkerokên baş çêdikim. Lê nîqaşên nav her duyan nediqediyan, Rojekê dîsa meseleyeke wiha çêdibe, radibin diçin li ba paşa da ku berhema kîjan hostayî baş e. Paşa kerkerokê diecibîne û xerat pir kêfxweş dibe. Kêfa paşê jî ji kerkerokê re tê dide kurê xwe yî bi navê Şêrdîn. Kêfa Şêrdîn jî pir ji vê pêlîstokê re tê. Lê ev pêlîstok ji pêlîstokên din cuda ye. Çimkî li bayê dikeve û difire. Dîsa rojek ji rojan, Şêrdîn li kerkeroka xwe siwar dibe û hin taybetiyên din ên vê pêlîstokê dibîne. Bi carekî de xwe berdide nav ezmanên şîn. Ji vê şûnde mijara çîrokê yekser tê li dora serpêhatiya Şêrdîn. Şêrdîn dibe evîndarê keça qralekî. Ji vê şûnde jî bûyer li dor hezkirî ango jina Şêrdînê bi navê Gulabendê diçe û tê. Piştî ewqas teşqele û siqumatan di dawiyê de herdu hezkirî digêhin mirada xwe.⁶⁹

2.30. Sînelmasî û Mîr Mihê

Navê Pirtûkê: Sînelmasî û Mîr Mihê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2005

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

⁶⁹ Zeynelabidîn Zinar, *Kerkerokê Bayê*, Pencînar, Stockholm, 2005.

Jimara Rûpelan: 55

ISBN: 91 89491 40 8

Çîroka Sînelmasî û Mîr Mihemed çîrokeke evîniyê ye. Sînelmasî keça paşayekî ye û Mîr Mihemed jî kurê cinekî ye. Dilê Mîr Mihemed dikeve Sînelmasiyê lê ji ber ku hem cin e hem jî merivek bi tena serê xwe ye gihiştina wan zehmet e. Mîr Mihemed ji bo ku bikaribe bi Sinelmasiyê re bizewice xwe dixwe şûna merivan û li ba pîrejinekê dijî. Piştî gelek zehmetiyan bi hevûdu re dizewicin û demekê bi hev re dibihurînin. Rojekê ji ber xetayeke Sinelmasiyê, Mîr Mihemed mecbur dimîne diçe welatê xwe û edî careke din ji Sinelmasiyê nabîne. Piştî gelek sal û zemanan Sînelmasî rastî mêrê xwe tê. Mîr Mihemed Sînelmasiyê bi xwe re dibe û bi diya xwe dide nasîn. Ji bo ku diya Mîr Mihemed Sînelmasiyê qebûl bike gelek şert û mercan datîne. Sînelmasî hemûyan qebûl dike û gelek zehmetiyan dikişîne lê di dawiyêde digêhêjin Mirada xwe. Di çîrokê de peyama sereke ew e ku; ger meriv tiştêkî ji can û dil bixwaze her çi zehmetî jî hebin digihê mirada xwe.⁷⁰

Çîroka bi navê *Sînelmasî û Mîr Mihê* cara ewil di *Xwençe Van* de derketiye. Lê Zinarî piştî gelek salan ev çîrok jî bo zarokan ji nû ve wekî pirtûkeke serbixwe çap dike.

2.31. Sêva Sêrê

Navê Pirtûkê: Sêva Sêrê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2005

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

⁷⁰ Zeynelabidîn Zinar, *Sînelmasî û Mîr Mihê*, Pencînar, Stockholm, 2005.

Jimara Rûpelan: 67

ISBN: 91 89491 38 6

Ev çîrok li ser serpehatiyên Mîrze Mihemed in. Li welatekî xerbê paşeyek hebûye û sê kurên wî hebûne. Lawê herî biçûk Mîrze Mihemed bûye. Di çîrokê de çavên paşê kor dibin û şifaya çavên wî tenê sêva sêr e. Her sê bira jî bo bidestxistina sêvê dixebitin da ku him bavên wan baş be him jî li ber dile bavê xwe şîrîn bin. Lê Mîrze Mihemed sêvê bi dest dixê û tîne çavên bavê xwe pê qenc dike. Ji ber ku Mîrze Mihemed birayê biçûk e lê wî derman aniye birayên din rik dikutinê hesûdî û dexesiyê jê dikin. Di navbera birayan de hesûdî çêdibe. Du bira ji ber hesûdiyê gelek tişt tînin serê birayên xwe yê biçûk ku heta çav berdidin jina wî. Paşê jî gelek karesat têne serê Mîrze Mihemed. Mîrze Mihemed geh dikeve binê bîrekî geh bi dêwan re şer dike geh jî dikeve heft tebeqe binê erdê. Lê her çiqas tiştên nebaş tên serê wî jî di dawiyê de Mîrze Mihemed bi saxî digihije mala xwe û heqê xwe digire. Di çîrokê de peyama sereke ew e ku, merivên baş tu carî xerabiyê nabînin û heq cihê xwe digire.⁷¹

2.32. Gurê Selikê

Navê Pirtûkê: Gurê Selikê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2005

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 38

ISBN: 91 89491 14 9

⁷¹ Zeynelabidîn Zinar, *Sêva Sêrê*, Pencînar, Stockholm, 2005.

Ev çîrok behsa meseleyekê dike ku di navbera gur û rovî û kurebeşkekê derbas dibe. Rojek ji rojan roviyek bi kurebeşkekê re dizewice, gurek jî dil heye wan bixwe, rovî xapekê davêje ortê û xwe û kurebeşkê ji mirinê xelas dike lê ji ber tirsê gurî, rovî wî welatî terk dike. Di heman demê de gur jî ji wî welatî koç dike û rojekê rastî hev tên, Lê rovî dîsa bi fend û fêlan xwe xelas dike, di her rewşê de rovî ji ber tirsê xwe, gur jî ji ber şerma xwe ji wî welatê ku buyer lê qewimiye diçin û hetanî ku rojekê dîsa rastî hev tên. Rovî mîna her carê xwe xelas dike lê axir gurê me qet aqil nabe û wekî her carê li hemberî fend û fêlên rovî têk diçe hetanî axiriyê. Divê meriv ji rewşên xirab xwe bikemilîne û çak bike da ku careke din bi heman rewşa xirab neyê ceribandî.⁷²

2.33. Mele Kulî

Navê Pirtûkê: Mele Kulî

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2005

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 49

ISBN: 91 89491 52 1

Mele Kulî çîrokeke ji kelepura kurdî ye ku gelek varyantê wê mewcûd in. Lehengê çîrokê Kulî ye di nav gel de bi navê Keçelok jî tê nasîn. Keçelok û diya wî li gundekî dijîn û gelek feqîr in. Keçelok ji bo debara mala xwe gavantiyê dike li gund. Dibîne ku li gund gelek qîmetê didin jina melê gund û ew jî dixwaze ku qîmetê bidin diya wî jî û ji ber wê jî biryar dide ku bibe mele. Diçe cilên melatiyê li xwe dike û li bajêr digere. Keça paşê Keçelok dibîne û gazî dike ku bila were û li kitêbên

⁷² Zeynelabidîn Zinar, *Gurê Selikê*, Pencînar, Stockholm, 2005.

xwe binêre û zêrên wê yên ku winda bûne bibîne. Keçelok diçe bi şans û alikariya carûdeyekê zêran dibîne. Paşê padîşah pê dihesa ku kesekî wiha heye ji bo alikariyê gazî keçelok dike. Padişah qabiliyet û ilma Keçelok diceribîne. Keçelok bi xasûkî û şansê xwe ji hemû ceribandinan derbas dibe. Paşa û keça wî ji vê rewşê gelek şaş û mehtel dîminin. Keçelok dibe melayekî menşûr, nav û dengê wî li her derê belav dibe.⁷³

2.34. Pêxemberê Derewîn

Navê Pirtûkê: Pêxemberê Derewîn

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2006

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 53

ISBN: 91 89491 79 3

Ev pirtûk ji bîst meselokên cihê cihê pêk tên. Ev her bîst meselok ango pêkenok pêşî di *Xwençe Vîan* de weşiyane. Dû re Zinar van bîst meselok û pêkenokan wekî pirtûk çap dike. Navê çend meselokên ku di pirtûkê de derbas dibin ev in: “Telqîna Dadê, Dijûnên Melê, Zengilê Mîşkan, Ellah û Yek Bir” Pirtûk navê xwe ji meseloka bi navê Pêxemberê Derewîn digire.⁷⁴

⁷³ Zeynelabidîn Zinar, *Mele Kulî*, Pencînar, Stockholm, 2005.

⁷⁴ Zeynelabidîn Zinar, *Pêxemberê Derewîn*, Pencînar, Stockholm, 2006.

2.35. Mîrê Cîzîra Botan û Siltanê Stenbolê

Navê Pirtûkê: Mîrê Cîzîra Botan û Siltanê Stenbolê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2006

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 58

ISBN: 91 89491 80 7

Çîroka bi navê *Mîrê Cîzîra Botan û Siltanê Stenbolê* çîrokeke serpêhatiyê ye. Naveroka çîrokê wiha ye: Di zemanê berê de du kesên bi navê Mîr û Baba Ehmed hebûne. Rojek ji rojan Mîr dikeve tengasiyê û xwe diavêje ber bextê Baba Ehmed. Baba Ehmed bêyî ku wî nas bike alikariya wî dike û piştî vê alikariyê jiyana Baba Ehmed û malbata wî dikeve xetereyê. Lê piştî gelek wextan Baba Ehmed bê zanebûn xwe diavêje bextê Mîr. Mîr wî nas dike û qenciya wî tê bîrê, alikariya wan dike, ji bo wan jiyaneke nû ava dike. Di vê çîrokê de peyam ew e ku; kesên qenciyê bikin tim rastî qenciyan tên.⁷⁵

2.36. Xwişkebiratiya Teyr û Rovî

Navê Pirtûkê: Xwişkebiratiya Teyr û Rovî

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2006

⁷⁵ Zeynelabidîn Zinar, *Mîrê Cîzîra Botan û Siltanê Stenbolê*, Pencînar, Stockholm, 2006.

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 38

ISBN: 91 89491 77 7

Çîrok di *Xwençe II*an de weşiya ye. Piştî gelek salan berhevkar Zinarî bi awayekî serbixwe vê çîrokê wekî kitêb çap dike. Hin guhartinên biçûk hene û di hin cihan jî de pirs ji xwîneran hatiye kirin. Ev çîroka li ber destê me çîrokeke ajalan e. Lehengê çîrokê rovî ye. Teyr û rovî tim li pey hev digerin ku dek û dolaban li hevûdu bikin. Wekî ku tê zanîn rovî bi fen û fûdê xwe ve tê nasîn lê vê carê teyr ji rovî jêhatîtir derdikeve. Bi xap rovî digire ser piştê xwe û difire û li jor ji piştê xwe diavêje xwarê. Lê şansê rovî heye û tiştê pê nabe. Piştî vê serpêhatiyê rovî rastî gurekî tê û gur dixapine, dibêje ez ê ji te re kurkek çêbikim. Gelek wextan gur bi vê meselê egle dibe. Di dawiyê de fehm dike ku rovî wî xapandiye û bi hêrs diçe û pey rovî dikeve. Rovî jî dibîne ku gur tê dek û dolabên nû difikire û dike jî. Gur dixapîne û bi destê şivan û kuçikan gur dide kuştin. Di vê çîrokê de em dibînin ku cih jî biguhere şikil jî biguhere dawî tim wekî hev e. Rovî pirça xwe diguhere, xuyê xwe naguhere, rovî tim rovîtiya xwe dike.⁷⁶

2.37. Kurê Paşê û Mişkê Qut

Navê Pirtûkê: Kurê Paşê û Mişkê Qut

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2006

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

⁷⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Xwişkebiratiya Teyr û Rovî*, Pencînar, Stockholm, 2006.

Jimara Rûpelan: 59

ISBN: 91 89491 72 6

Li welatekî, paşayek û wezîrekî wî hebûne, her du jî xwedî kurekî bûne û navê her du kuran jî Mihemed bûye. Mihemedê Paşê û Mihemedê Wezîr bûne destebirakê hev û her tim li ba hev bûne. Rojekê Mihemedê Paşê dixwaze bi keça Paşayê Çîn û Maçînê re bizewice. Lê dibêjin ev keçik qet naaxive û tenê mişkê qut dikare keçikê bide axaftin. Ji ber vê jî herdu bira bi hev re diçin mişkê qut dibînin û bi xwe re dibin welatê Çîn û Maçînê. Li wir piştî gelek serpehatiyên dikarin keçikê bidin axaftinê û keçikê digirin, tên welatê xwe. Li welêt dawetek li dar dixin. Lê ji ber ku Mihemedê Wezîr dizane ku bi şev keziyên keçikê dibin mar û ew zilam kî be û çî kes be dikujin. Mihemedê Wezîr wê şevê li ber serê wan disekine da ku tiştêkî xerab neyê serê destebirakê wî. Mihemedê Paşê çaxa birayê xwe li odê dibîne, jê dixeyide û dibêje tu xayîniyê bi min dikî. Lê di dawiyê de hemû rastiye hîn dibe û biratiya wan didome.

77

2.38. Cihê û Çil Kose

Navê Pirtûkê: Cihê û Çil Kose

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2006

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 37

ISBN: 91 89491 68 8

⁷⁷ Zeynelabidîn Zinar, *Kurê Paşê û Mişkê Qut*, Pencînar, Stockholm, 2006.

Di vê çîrokê de serpehatiya du birayên pir feqîr Mihê û Cihê hatiye qalkirin. Pir kêmalê wan hene ku bi hev re dixebitin û dikarin tenê debara xwe ya rojane bikin. Lê rojekê birayê mezin Mihê dixwaze ku ji hev cihê bin. Her du bira ji hev cihê dibin û her yek debara mala xwe dike. Rojekê Mihê gayekî dibe li bazarê difiroşe lê ji aliyê çil birayên kose ve tê xapandin. Rewş carek du car wisa didome. Di dawiyê de birayê piçûk Cihê diçe bazarê ji bo heyfa birayê xwe hilde, bi fen û xap çil birayan dixapîne û kera xwe ji buhayê wê zêdetir difiroşe wan. Ev çil bira piştî fehm dikin ku hatine xapandin, dikevin pey tola xwe û li du Cihê dikevin. Lê Cihê careke din wan dixapîne û dişîne. Ev çil bira pir zirarê dibînin, heta jinên wan jî dimirin. Pir poşman dibin lê edî pir dereng e.⁷⁸

2.39. Bablîcan

Navê Pirtûkê: Bablîcan

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2006

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 48

ISBN: 91 89491 44 0

Ev çîrok li ser serpehatiyên heft bira, xwişkek û hûtan de hatiye vegotin. Xwişk û heft bira bi diya xwe re li gundeki dijîn. Lê xwişka wan bi navê Bablîcan wê demê biçûk e. Piştî demekê ev heft bira ji ber zilma axê, ji gund direvin û diçin pişt heft çiyar, li wir bi cih dibin. Lê dê û xwişk li gund dimînin. Dema ku birayên Bablîcanê ji gund derdikevin û diçin li deverekî din dihêwirin pêşî haya Bablîcanê ji çûyîna wan tune ye. Piştî ku mezin dibe û tiştan fêr dike radibe diçe cem birayên xwe. Li

⁷⁸ Zeynelabidîn Zinar, *Cihê û Çil Kose*, Pencînar, Stockholm, 2006.

wir keçik her roj kar û barên malê dike û alikariya birayên xwe dike. Rojekê agirê di mal de ditemire, keçik jî ji bo ku agir bibîne li cihan digere rastî şikefta hûtan tê û ji wir agir didize. Paşê hût li du wê dikevin, wê dibînin û keçik jî bo ku birayên xwe biparêze û ji ber dilşewatî û hezkirina birayên xwe, xwe feda dike. Di dawiyê de bi alikariya birayê xwe bi ser dikeve û tu zirar nagihije birayên wê. Di vê çîrokê de yekitiya malbatê û hesta merhemetê derdikeve pêş.⁷⁹ Ev çîrok jî di *Xwençe Van* de hatiye nivîsîn, paşê jî wek pirtûkeke serbixwe hatiye çapkirin.

2.40. Miriyê Li Ser Bîrê

Navê Pirtûkê: Miriyê Li Ser Bîrê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2006

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 31

ISBN: 91 89491 67 X

Ev çîrok li ser meseleya du bira ne ku pir dişibin hevdu. Nave herdu birayan Emer û Pola ne. Hê di biçûkatiyê de diya wan dimire û sêwî dimînin. Bavê wan heta ew mezin dibin nazewice. Lê piştî ku ew digîhîjin û mezin dibin paşê bavê wan dizewice. Damariya wan bi her du xortan re rojên baş naborîne ji ber vê jî her du bira jî malê diçin. Di rê de li ser bîrekî disekin, Pola li wir dikeve, dimire û Emer wî li wir dihêle û diçe. Emer diçe li Welatê Misrê dimîne, demeke şûn de paşayê misrê dimire û çaxa teyrê dewletê difirînin, diçe li ser serê Emer datîne û Emer dibe paşa. Lê li aliyê din de jî karwanek diçe ber wê bîrê ku Pola li wir miriye, disekine. Merivekî hekim ku di nav karwanê de ye Pola dibîne û wî sax dike. Piştî gelek

⁷⁹ Zeynelabidîn Zinar, *Bablîcan*, Pencînar, Stockholm, 2006.

serpêhatiyan Emer û Pola digihîjin hevdû û di dawîya çîrokê de merivên baş têne şabaşkirin û yên nebaş jî tîn cezakirin.⁸⁰ Ev çîrok di *Xwençe Xan* de jî heye û paşê jê cuda wek pirtûkekê jî tê çapkirin ji layê nivîskarî.

2.41. Serpêhatiya Wezîr û Paşê

Navê Pirtûkê: Serpêhatiya Wezîr û Paşê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2006

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 31

ISBN: 91 89491 64 5

Ev çîrok cara ewil di *Xwençe Xan* de bi sernavê *Derdê Paşê û Wezîr* derçûbû. Piştî gelek salan Zinar sernavê vê çîrokê diguherîne û ji nû ve bo zarokan çap dike. Mijara çîrokê; wezîr û paşa rojekê ji rojan ji xwe re dimeşin li erdê zêrek dibînin. Lê her du li ser wê zerê hevdu nakin, ew dibêje ji min re ê din dibêje ji min re. Dinêrin ku mesele wiha safî nabe, dibêjin herkes bila derdê xwe bibêje derdê kê giran be zêr dibê para wî. Ji vê şûnde herdu dest bi serpêhatiyên xwe û derdên xwe dikin. Lê gava me çîrok xwend dawîya çîrokê tune bû. Yanî di dawiyê de nabêje ka zêr bûn para kê.⁸¹

⁸⁰ Zeynelabidîn Zinar, *Miriyê Li Ser Bîrê*, Pencînar, Stockholm, 2006.

⁸¹ Zeynelabidîn Zinar, *Serpêhatiya Wezîr û Paşê*, Pencînar, Stockholm, 2006.

2.42. Mado Paşa û Keça Dêwê

Navê Pirtûkê: Mado Paşa û Keça Dêwê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2006

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 63

ISBN: 91 89491 30 0

Li welatekî paşayek hebûye û tenê kurekî wî hebûye. Kurê paşê gihiştîye dema zewacê lê ne kesekê bi dilê xwe dîtiye û ne jî xwestîye bizewice. Rojekî Kurê Paşê çûye nêçîrê, li wir rastî qesrekê hatiye û tê de keçikeke gelek xweşik hebûye. Ev keç keça dêwekî bûye. Kurê Paşê û ev keçîk dil ketine hev û bi hev re reviyane. Lê di rê de Kurê Paşê xwastiye her tişt li gor adetan be û gotiye tu li vir bimîne ez ê te bi dawet bibim mal. Di wê navê de keçîkek gerok hatiye û bi fend Keça Dêwê wînda kiriye ku bixwe bibe bûk. Lê di dawiyê de hemû xerabiyê wê derketine holê û Kurê Paşê û Keça Dêwê gihiştine mirazên xwe.⁸²

2.43. Mîr Mihê û Gulîzar

Navê Pirtûkê: Mîr Mihê û Gulîzar

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2006

⁸² Zeynelabidîn Zinar, *Mado Paşa û Keça Dêwê*, Pencînar, Stockholm, 2006.

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 32

ISBN: 91 89491 33 5

Mîr Mihê vê carê bi sê birayên xwe ve tê pêşiya me. Li bajarekî sê bira hebûne û navê birayê piçûk Mîr Mihê bûye. Van her sê bira bi nêçîrê debara xwe dikirin. Rojekê diçin nêçîrê û rêya xwe şaş dikin, diçin rastî bajareke vala tîn. Li wî bajarî bi cih dibin û jiyana xwe li wir didomînin. Dem dibuhure û Kalikek tê dibe bela serê wan. Mîr Mihê li pey şopa wî dikeve da ku wî bikuje lê tiştên nema tîn serê wî. Di wê navê de Mîr Mihê rastî Gulîzarê tê lê ji ber belayan nikare xwe bigihîne wê. Piştî gelek serpêhatiyên ecêb axir digihijin hevdû û çîrok bi şadî diqede.⁸³ Ev çîrok di *Xwençe IXan* de derbas dibe wek gelek çîrokên din ev jî mîna pirtûkekê, cuda tê çapkirin.

2.44. Heft Sal Şivantî

Navê Pirtûkê: Heft Sal Şivantî

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 30

ISBN: 91 89491 74 2

⁸³ Zeynelabidîn Zinar, *Mîr Mihê û Gulîzar*, Pencînar, Stockholm, 2006.

Lawikekî bi navê Xorto hebûye, hêj biçûk bûye dê û bavê wî çûne rihma Xwedê. Apê Xortoyî, Xorto xweyî kiriye. Kêfa gundiyan ji Xorto re pir dihat. Çimkî zarekî aqil, jêhatî û lihevhatî bûye. Xorto mezin dibe tê wextê zewacê, dilê xorto dikeve dotmama xwe. Lê apê Xortoyî kesekî xerab û zikreş bûye. Nexwastiye ku keça xwe bide biraziyê xwe yî belengaz û feqîr. Çimkî çavên apê wî her tim li pera û meqaman bûye. Lê dilê keça wî di pismamê xwe de bûye, bavê keçikê bi dek û dolaban xwestiye ku rê li pêş Xorto bigire. Bavê keçikê rojekê dibêje Xorto tamam ez ê keça xwe bidim te lê şertekî min heye. Şertê bavê keçikê jî heft sal şivantîkirina Xorto bo sewalên bavê keçikê bûye. Axir Xorto vê yekê qebûl kiriye û piştî heft sal şivantîkirinê dîsa diçe keçikê dixwaze. Bavê keçikê ji bo ku keça xwe nede Xorto îcar jî şertekî din dide pêşiya Xorto. Xorto van hemû şertên ku apê wî didine pêşiya wî yeko yeko tamam dike û di dawiyê de jî apê Xortoyî neçar dîmîne keça xwe dide Xorto.⁸⁴

2.45. Çepgera Aşê Dewletê

Navê Pirtûkê: Çepgera Aşê Dewletê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 32

ISBN: 91 89491 78 5

Di vê çîrokê de paşayekî bi navê Dewlet û du heb wezîrê wî hebûne, wezîrê milê rastê û wezîrê milê çepê. Wezîrê mile rastê merivekî tiral, pîs û çavsor e û gel jê hez nake, wezîrê milê çepê jî berovajî wî baş, camêr û dilpak e û gel jê hez dike.

⁸⁴ Zeynelabidîn Zinar, *Heft Sal Şivantî*, Pencînar, Stockholm, 2011.

Ligel ku wezîrê milê çepê baş e jî Paşa Dewlet jê hez nake û peywireke dijar didê û dibêjê here 21 celeb heywanan ji her yekî 100 hebî bîne, heke tu neînî wê serê te here.

Herçiqas wezîrê milê çepê dikeve tengasiyê jî axirî diçe ba eşîreke kurdan ku serokeşîrê wê ereb e van heywanan peyda dike û tîne teslîmî paşa dike, paşa bawer nake û dixwaze ji paceyê binêre; lê jê dikeve û dimire. Piştî mirina paşa, wezîrê milê çepê dibe paşayê nû û navê wî dibe Dewlet.

Paşayê me yê nû her rojê bi cilûbergên cuda diçe nava gel û pirsgerêkên gel guhdar dike. Rojekî dinêre ku ew kal û pîrê ku serokên eşîrê bûn ku alikariya wî kiribûn pars dikan. Dewlet diçe ba wan û wana dike mêvanê xwe, alikariya wan dike û karê aşvaniyê dide sereşîr lê aşê sereşîr çep vedigere, herçiqas paşa bixwaze çareser bike jî sereşîrê kal qebûl nake û dibêje: ev bextê min e çep vedigere paşayê min tu dest nedê. Rojekî aş rast vedigere û sereşîr diçe mizginiyê ji paşa dixwaze û dibêje, paşa me bişîne welatê me, paşa wan dişîne welatê wan û mêrik çawa ku dighîje welatê xwe bi aramî dimire.⁸⁵ Em vê çîrokê di *Xwençe Van* de jî dibînin ku paşê ek pirtûkekê bi awayekî cuda hatiye çapkirin.

2.46. Xeyda Pisîkê

Navê Pirtûkê: Xeyda Pisîkê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 30

⁸⁵ Zeynelabidîn Zinar, *Çepgera Aşê Dewletê*, Pencînar, Stockholm, 2011.

ISBN: 91 89491 14 9

Di vê çîrokê de serpehatiya pişikêki hatiye vegotin. Xwediyê pişikê pîrek e. Pîrê belengaz û feqîr e debara xwe bi parsê dike. Rojekî pîrê diçe parsê û dereng tê ji ber vê yeke pişîka pîrê di hundir de birçî dimîne. Lê axir pişik e di nav malê de ji xwe re xwarinê digere rastî şîrê pîrê tê. Pişik şîrê pîrê dixwe pîrê jî vê yekê dibîne û hêrs dibe şivnikê li piştê pişikê dixwe. Pişîka pîrê jî ji pîrê dixeyide û ji mala pîrê diçe. Pişik dikeve nav dehleke gewre û rastî roviyekî tê. Pevçûnek di navbera pişik û roviyê de çêdibe. Rovî ji pişik dipirse dibêje tu kê yî? Pişik jî fêlbaziyekî dike xwe wekî heywanekî xeternak dide nasîn û hevokeke tirsnak hazir dike her tim vê hevokê bi kar tîne. Hevoka pişikê jî wiha ye “Ez Îçaxasî Kurê Têjikê Şêrê Mezin im”. Rovî ji vê yekî şaş û mehtel dimîne û jê ditirse. Rovî êdî dibe xulamê pişikê. Piştî vê bûyerê êdî li çolê çî cure heywan rastî pişik bên jî bi heman rê rêbazî dibêje “Ez Îçaxasî Kurê Têjikê Şêrê Mezin im” û heywanan dixapîne. Qederekî wiha dewam dike lê pişik ji vê rewşê aram nîn e xwe bi xwe dibêje eger ev heywanên dirinde bizanibin ku ez ne kesekî wiha me dê halê min perişan e. Û dest ji vî karî berdide vedigere ba pîrê. Pîrê jî bi hatina pişîka xwe gelekî şa dibe. Çîrok jî li vir diqede.⁸⁶

2.47. Çêleka Zer

Navê Pirtûkê: Çêleka Zer

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 35

ISBN: 91 89491 73 4

⁸⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Xeyda Pisîkê*, Pencînar, Stockholm, 2011.

Ev çîrokeke derheqê hesûdî û dilsaxiyê de ye. Di çîrokê de du keçik hene; Eyşo û Fato. Diya Fato dema ku Fato tîne dinê dimire û bavê wê ji nû ve dizewice û ji wê zewacê jî keçeke bi navê Eyşo çêdibe, diya Eyşo her dem qîza xwe ya helal dihewîne lê ji keça ewil ya mêrê xwe re xwedi dernakeve û hesûdiya wê dike ta ku rojekî dewran vedigere Çend heb dewarên vê malê hebûne û çêlekeke zer di nav de hebûye, ev çêleka zer her wexta ku Fato tê ber dewaran rehet disekine û dema Eyşo tê li cihekî nahewe, rojekê diya Eyşo ya dilreş ji ber acizîya keça xwe ya li hemberî çêlekê ji mêrê xwe re dibêje em çêlekê şerjê kin û axiriyê tînin çêlekê şerjê dikin. Fato tê ji çêlekê re hal û meseleyê dibêje û çêlek lê vedigerîne dibêje meraqan neke ji xeynî te wê kesek nikaribe goştê min bixwe û divê tu hestiyê min bavêjî nav kayê. Piştî demekê ew hestî gişk bûne zêr û zîv û kinc. Li wê derê ber dewaran jî pîrek hebûye bi seredorî ji her du keçikan jî daxwaz kiriye ku porê wê şe kin lê Eyşo şe nekiriye û Fato bi dilrehetî û dilsaxî porê pîrê şekiriye. Pîrê ji Eyşo re gotiye li mala we du av hene yek spî û yek reş tu here bi ava reş serê xwe bişo û gotiye Fato tu jî here bi ava spî sere xwe bişo, piştî vê yekê Eyşo her ku diçe nerindtir û pîstir û Fato jî her ku diçe bedew û baştir dibe. Rojekê Fato kare xwe yê malê zû diqedîne û kincên xwe yên pak li xwe dike û diçe dawetê di dawetê de kurê Axê wê dibîne û dil berdide wê bi hev re şa û bextewar dijîn.⁸⁷

2.48. Daweta Hirç û Rovî

Navê Pirtûkê: Daweta Hirç û Rovî

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 32

⁸⁷ Zeynelabidîn Zinar, *Çêleka Zer*, Pencînar, Stockholm, 2011.

ISBN: 91 89491 71 8

Ev, çîroka hirç û roviyekî ye ku her du jî dewa zewacê dikin, her du daxwazkar li hev rûdinên, qise dikin, biryara zewacê didin û gazî qewm û xizmên xwe dikin lê qewm û xizmên hirç ne razî bûne û nexwestine ku ew bizewice û xwarziyên wan di rengê roviyan de be.

Li gor qanûnên çolê dizewicin û def û zirne lê dikeve, daweta wan pir rengîn derbas dibe û hemû ajalên daristanê tîn daweta wan, piştî dewatê şêr heya malê bi hirçê re xeber dide, gur jî vê yekê dibîne û vê xeberê digîhîne hirç, herçiqas hirç ji rovî bikeve şikê jî sebir dike hetanî ku têjikên wan çêdibin. Roj û meh derbas dibin û zarokên wan çêdibin. Bavo têjka wan serî mîna şêr, gewde mîna rovî û ling jî mîn rovî ye. Rovî bi vê yekê qayîl nabe û acizîya xwe tîne zimên, hirç hêrs dibe û rovî bi yek derbê dike du qetan û davêje. Pismamên rovî hêrs dibin û dixwazin heyfa rovî hildin û bi hirçan re şer dikin. Şêr bi vê yekê dihesê û ev gotina pêşiyar tîne bîra xwe “Xwîn bi xwînê nayê şuştin lê xwîn bi avê tê şuştin” û mezin û piçûkên rovî û hirçan top dike û wan li hev tîne. Roviye ku niyeta wî bi dek û dolaban hebû û di hewla ziktêriyê de bû jî dikeve gora sar. Mesele jî wiha xelas dibe...⁸⁸ Ev çîrok di *Xwençe IV*an de jî tê pêşberî me. Zinar ev çîrok wek berhemeke serbixwe jî çap kiriye.

2.49. Dêwê Heftreng

Navê Pirtûkê: Dêwê Heftreng

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 44

⁸⁸ Zeynelabidîn Zinar, *Daweta Hirç û Rovî*, Pencînar, Stockholm, 2011.

ISBN: 91 89491 32 7

Li gundekî mêrikekî bi navê Qember hebûye û sê keçên wî yên bi navê; Zîn, Xecê û Homê hebûne. Rojekî bavê wan diçe sûkê û Zînê guhar û bazinekî, Xecê fistanekê û Homê şe û neynikekê dixwaze. Bavê wan diçe bajêr lazimiyên malê û keçên xwe re tiştan distîne lê tiştên ku Homê xwestibû ji bîr dike, dema ku nêzî gund dibe tê bîre, dilê wî bi Homê dişewite û dixwaze paş de vegere bajêr lê êdi derengî dikeve. Li wir dêwekî bi navê heftreng heye ku xwe dixê şûna xortekî û dertê pêşiya Qember. Dêw ji bo keçikên Qember gelek dek û dolaban dike da ku bi her sêyan re bizewice. Bi heman dek û dolaban her sê keçikên Qember dixapîne û dibe şikefta xwe. Lê keçika biçûk aqil bûye dawîya dawî bi planekî xwe û her du xwişkên xwe ji destên dêw xelas dike.⁸⁹

2.50. Gemiya Nokan

Navê Pirtûkê: Gemiya Nokan

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 46

ISBN: 91 89491 43 2

Ev çîrok cara pêşîn di *Xwençe III*an de çap bûye. Çîrok bo zarokan hatiye amadekirin. Naveroka çîrokê wiha ye; merivekî bi navê Kaşo hebûye. Pir feqîr û belengaz bûye. Kaşo dibêje debara min li vir nabe, hinek nan û pêxwarin dike çentê xwe, bi rê dikeve. Nêzî bajarekî çavê wî bi aşxaneyekê dikeve. Hahanga diçe aşxanê û ji şagirdan xwarinê dixwaze. Hingî birçî bûye wê xwarinê di carekî de dixwe û

⁸⁹ Zeynelabidîn Zinar, *Dêwê Heftreng*, Pencînar, Stockholm, 2011.

çend caran dîsa dixwaze. Paşê heqê xwarinê tê bîrê lê dizane ku li cem pere nîne. Îcar dikeve xeyal û fikaran, paşê tiştek tê hişê wî. Xeyala wî ya gemiya nokan tê bîrê û dibişire. Bi van xeyalan dest bi derewan dike û bi vî şiklî derew li derewan zêde dibe. Heta namê wî digihe paşayekî bi navê Dewlet hebûye û gazî Kaşo kiriye da ku Kaşo nokan bifiroşê rûdinên xeber didin û kêfa paşê ji Kaşo re tê, dibêjê ez ê qîza xwe bidime te û wan dizewicînin, rojekê paşê jimara xiznê dike û lê dinêre ku sîh zêr kêr in, Paşê ji qîza xwe Gulxanê rica dike ku ew ji Kaşo sîh zêran deyn bistîne û bide wî hetanî ku da, Gulxan ji Kaşo re meselê dibêje lê Kaşo dibêje li cem min niha zêr tunin, Gulxan bi vê yekê xemgîn dibe, sibetirê dema li derve paqijiyê dike di bin tûmekî de zêran dibîne û hew dizane ku ew zêrên Kaşo ne û Kaşo jê re rastiye negotiye, Gulxan ji ber vê meselê hêrs dibe û dema êvarê Kaşo ji dikana xwe tê zêran hirdişîne ber Kaşo, lê haja Kaşo bi zêran tune, Kaşo dema çev bi zêran dikeve pir şa dibe û hema dibêje gişkî bibe bide Paşê. Gulxan zêran hildide diçe cem Paşê, zêran didê, Paşê pir kêfa wî pê tê, lê tenê sîh zêran hildide. Piştê Kaşo diçe sûkê û deynê aşxanê dide lê hê jî gemiya wî ya nokan nayê. Dem û dewran wisa derbas dibe û ew jî jiyanê xweş derbas dikan. ⁹⁰

2.51. Gurê Nalbend

Navê Pirtûkê: Gurê Nalbend

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 26

ISBN: 91 89491 14 9

⁹⁰ Zeynelabidîn Zinar, *Gemiya Nokan*, Pencînar, Stockholm, 2011.

Ev çîrok cara pêşîn di *Xwençe VI*an de çap bûye. Çîrok bo zarokan hatiye amadekirin. Naveroka çîrokê wiha ye; çîroka bi navê *Gurê Nalbend* qala serpêhatiya gurek û roviyekî dike. Gurekî mêrxas û roviyekî fêlbaz hebûye. Herdu jî ji hev pir tirsîya bûne, rojekî her du diçine cem hev û dibêjin ev dujminatî bes e em ê bibin destebirakê hev, ma çi heye ku em parve nakin. Piştî ku dibine destebirak êdî bi hev re digerin û diçin nêçîrê. Rojekî çavên wan bi kerekî dikeve, dibêjin em ê herin nêçîra kerê. Dema ku xwe ditelînin dinerin ker li wir e diçin cem kerê, ker dibîne ku ev ne îşê xêrê ye dest bi planekê dike. Dema ku gur diçe cem ker, ker bi fend û fêl tev digere û ji gur re dibêje ku bizmarek di nelê sima wê re çûye û pir diêşîne. Gur şa dibe, ji ber ku wê bikaribe plana xwe pêk bîne, xwedêgiravî diçe ku alikariya kerê bike, ji nişkê ve ker zirtikeke wisa li gur dide ku gur gêj dibe dikeve erdê û serpiştî vedizele. Bi vî şiklî gur û rovî nagêhin armanca xwe.⁹¹

2.52. Keçelok û Gurrî

Navê Pirtûkê: Keçelok û Gurrî

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 36

ISBN: 91 89491 64 5

Ev çîrok cara pêşîn di *Xwençe III*an de çap bûye. Çîrok bo zarokan hatiye amadekirin. Ev çîroka du birayan e ku diya wan miriye û ji aliyê jinbavê ve têne azirandin. Ev jinbav yeke pir xerab bûye, zef neheqî li birayan kiriye. Piştî wextan ku her du bira mezin dibin dixwazin ji bin siya jinbavê birevin û aza bibin. Keçelok û Gurrî êdî

⁹¹ Zeynelabidîn Zinar, *Gurê Nalbend*, Pencînar, Stockholm, 2011.

mezin dibin ji mala jinbavê dûr dikevin û diçin bajarekî din bixebitin da ku debara xwe bikin. Her du bira gelek wext bo xebatê bi hev re diborînîn lê îdara wan jiber xizaniyê çênabe. Keçelok birayara firotina birayê xwe yî Gurrî dide. Li bazara bajêr birayê dide gelek pereyan. Lê gelek sal dibore îcar Keçelok û Gurrî rastî hevdu tên. Îcar jî Gurriyê bira dewlemend e Keçelok feqîr e. Lê dîsa jî Gurrî birayê efû dike. Ji vê şûnde herdu bira şad û bextewar dijîn.⁹²

2.53. Kund û Bilbil

Navê Pirtûkê: Kund û Bilbil

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 30

ISBN: 91 89491 21 1

Ev çîrok cara pêşîn di *Xwençe Vîan* de çap bûye. Çîrok bo zarokan hatiye amadekirin. Ev meseleya kund û bilbilekê ye, şevêk ji şevên zivistanê yên sar, kundek dema ku şev ber bi hêlîna xwe diçe rêya xwe winda dike û hêlîna xwe nabîne. Dema hêlîna xwe digere rastî hêlîna bilbilekê tê û diçe ber hêlîna bilbil û deng bi wê dike ku wî hilde hindir. Lê bilbil wî hildade hindir û dibêje ez te hildim hindir wê mêrê min were min bikuje, wê bêje te bêbextî kir. Lê kund bi tu cihî de naçe, jê rica dike ku wî hilde hinder. Bilbil planekî çêdike da ku kundê bêyom hildade hundir. Bilbil dibêje ez ê te hildim hindir lê bi şertekî.. Dibêje ez ê ji te re çîrokekî bibêjim eger tu guhdariya çîroka min bikî ez ê te hildim hindir. Kund qebûl

⁹² Zeynelabidîn Zinar, *Keçelok û Gurrî*, Pencînar, Stockholm, 2011.

dike. Bilbil dest bi çîrokan dike lê dawîya çîrokên wê nayên. Kund jî jiber sir û seqema derve tamîş nade dimire.⁹³

2.54. Mamê Mamcel

Navê Pirtûkê: Mamê Mamcel

Amadekar: Zeynelabîdîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 46

ISBN: 91 89491 58 0

Ev çîrok cara pêşîn di *Xwençe IV*an de çap bûye. Çîrok bo zarokan hatiye amadekirin. Mijara çîrokê wiha ye; li gundekî melayekî sefîk hebûye. Rojekî bo serdana dostekî xwe biryara rêwîtiyekî dide. Haja rovî ji rêwîtiya mele çêdibe û xwe bi xwe dibêje ez ê mele bixapînim da ku hemû tiştên wî jê bîstînim. Di rê de bi awayekî rovî mele dixapîne. Şaşîk, kurk û qurana mele direvîne û xwe dixê şûna mele. Rovî bi navê meletiyê gelek têjîkên heywanan dixwe. Kesekî bi navê Mamê Mamcel jî heye ku li ber qula rovî zeviyên wî hene û cotkariyê dike. Hemû heywanên zirar ditî xwe davêjin ber bextê Mamê Mamcel da ku wan ji vê roviyê fêlbaz xelas bikin. Mamê Mamcel alikariya wan dike û bi defîkekî rovî digire. Êdî heywan wê şûnde bi aram û şad dijîn.⁹⁴

2.55. Mîrzoyê Kurê Paşê

Navê Pirtûkê: Mîrzoyê Kurê Paşê

⁹³ Zeynelabîdîn Zinar, *Kund û Bilbil*, Pencînar, Stockholm, 2011.

⁹⁴ Zeynelabîdîn Zinar, *Mamê Mamcel*, Pencînar, Stockholm, 2011.

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 40

ISBN: 91 89491 76 9

Di çîroka bi navê *Mîrzo yê Kurê Paşê* de lehengwariya Mîrzo hatiye behs kirin. Naveroکا çîrokê wiha ye; Zemanekî paşeyekî pir dewlemend û destvekirî hebûye û sê kurê paşa hebûne bi navê Bengî, Lezgîn û Mîrzo. Bengî yê mezin, Lezgîn yê navîn, Mîrzo yê biçûk bûye. Hemû macera û bela tên li serê Mîrzo. Herdu birayên Mîrzo bêkêr û newêrek bûne. Piştî wextan paşa dimire, hemû mîrate ji her sê kurên paşa re dimîne. Her du birayên mezin hesudiyê bi Mîrzo dîkin. Lê Mîrzo ji birayên xwe re ne wisan e. Dixwaze her sê bira hev re tifaq bin. Li welatekî din pêşbirkek çêdibe. Mîrzo jî tevî vê pêşbirkê dibe û serkeftî jê dertê. Paşayê vî welatê jî ji ber qehraminaya wî keça xwe dide Mîrzo. Piştî wextekî paşa nexweş dikeve û dimire. Mîrzo dibe paşayê vî welatî. Mîrzo bangî herdu birayên xwe dike û êdî bi hev re şad û bextewar dijîn.⁹⁵

2.56. Pîra Bênefs

Navê Pirtûkê: Pîra Bênefs

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

⁹⁵ Zeynelabidîn Zinar, *Mîrzo yê Kurê Paşê*, Pencînar, Stockholm, 2011.

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 40

ISBN: 91 89491 75 0

Ev çîrok derheqê pîreke nefsek de ye, û cara ewil di *Xwençe IV*an de hatiye weşandin. Paşê wek berhemeke cuda hatiye çapkirin. Mesela pîra bînefs jî wiha ye; Zemanekî pîreke bînefs hebûye, ewqasî çavçil bûye ku têrxwarin nizanibûye, çî bidîta diviyabû bixwara. Ji ber bînefsî û çevnebariya pîrê jê re gotine Pîra Bînefs. Pîrê bi kurê xwe re dijî, navê kurê pîrê Xusro ye, tenê du heb gayê wan hebûne. Bi herdu gayan erdê xelkê cot kiriye, pê debara xwe kirine.

Rojekî pîrê çav li qelîyê dikeve, diçe ji kurê xwe re dibêje em ji xwe re qelîyê çêbikin. Ga serjê dîkin, qelîyê çêdîkin û çendek şûnde ga ji Xusro re lazim dibe lê gayek kême. Piştî vê Xusro macbûr dimîne ku li cem gayê tek diya xwe qoş bike. Rojekî dema ku cot dîkin merivek tê halê pîrê pirs dike, Xusro hal û mesela pîrê jê re dibêje. Mêrik ji cêba xwe kaxizekî derdixe û tiştêkî dinivîse û dide Xusro û jê re dibêje here filan gundî, bide filan kesî wê gayekî bide te. Xusro diçe cem Zilamê Nêçîrvan, ew gayekî didê, ew gayê xwe hildide û diçe malê.

Keçeke Zilamê Nêçîrvan hebûye, pir tiral bûye kesekî ew nexwestiye. Rojekî Zilamê Nêçîrvan dibêje ku ez keça xwe bidim Xusroyî. Ew cotkarê feqîr jî qîza mi nexwaze êdî tu kes naxwaze. Gazî Xusro dike û jê re meselê dibêje. Paşê Xusro qebûl dike û qîza xwe bi wî mar dike.

Xusro ji diya xwe re dibêje ku bûk çiqas bixebite tu jî ewqasî xwarinê bidê. Sibetirê Xusro diçe kar, bûk heta êvarê ji nava cihê xwe dernayê û hêviya pîrê disekine ku jê re xwarinê bîne lê kesek jê re xwarinê nayne, roja din dîsa wisa. Hişê bûkê tê serî û dest bi kirina şixulên malê dike. Rojekî bavê bûkê tê, dinêre ku keça wî

jêhatî bûye pir diheyire, kêfa wî zehf xweş dibe û bi bextewarî jiyana xwe didomînin.⁹⁶

2.57. Pîra Xwînxwur

Navê Pirtûkê: Pîra Xwînxwur

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 26

ISBN: 91 89491 60 2

Ev çîrok, meseleya sê bira, xwîşkek û pîreke xwînxwur e, Mala wan li nêzî çiyayekî bûye û li nêzî mala wan tu mal tunebûye.

Navê xwişka van birayan Narîn bûye. Pişikeke wan hebûye, navê wê Xeydokê bûye, dema xwarina wê nedidanê dixeyîdî û diçû bi ser agirê tifikê de dimîst. Îcar vemirîna agirê tifikê wekî bêyomî dihat qebûlkin.

Rojekî dema ku her sê bira diçin nêçîrê, Narînê ji bîr dike û xwarina Xeydokê nadê, dibîne ku agir vemiriye. Tê bîrê ku xwarina Xeydokê nedayê, çavê xwe li derdorê digerîne dibîne ku ji dûr ve dîyekî zirav hildikişe, ber bi wir ve diçe ku pizotekî bîne. Diçe wir û dibîne ku heft heb sîtil û li ber her yekî jî bûkek heye, dan dikelînin. Bûk hinekî dan û pizoteke agir didinê û dibêjinê ku bila zû here ku hê Pîra Xwînxwur nehatiye. Narînê diçe malê dinêre ku pêşa wê qul bûye û libek dan tê de nemaye.

⁹⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Pîra Bênefs*, Pencînar, Stockholm, 2011.

Pîra Xwînxwur tê, bêhna merivekî tê pozê pîrê, ew li derdora xwe mêze dike û wan libikên dan dibîne. Pîrê libikên dan dişopîne û diçe dertê ber mala Narînê, li derî dixwe lê Narîn wê nas nake û derî venake. Pîrê jê re dibêje ku bila destê xwe di ber derî re derxe da ku destê wê maçî bike. Narînê dema ku destê xwe derdixwe, pîrê pêçiyeye wê dixwe devê xwe xwîna wê dimije û têr dixwe, çavên Narînê tarî dibin û gêj dibe. Pîrê tema xwîna wê hildide, çend rojan dîsa tê û xwîna wê dimije. Lê Narînê ditirse ku tiştekî bîne serê birayên wê, ji birayên xwe re nabêje. Lê roj bi roj jartir dibe û birayên wê Narîn didine zorê ku xeber bide ku çi hatiye serê wê. Narîn dawiya dawî ji wan re dibêje. Ew sibehtirê naçin nêçîrê û çalekî li ber derî dikolin, hinekî pûş diavêjin ser. Dema ku Pîra Xwînxwur tê, tep dikeve çehlê û her sê bira wê qet qetî dikin. Ji wê rojê şûn de bi bextewarî dijîn.⁹⁷

2.58. Rasto û Xwaro

Navê Pirtûkê: Rasto û Xwaro

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 32

ISBN: 91 89491 69 6

Di vê çîrokê de jî behsa paşayek û du wezîrên wî hatiye kirin. Wezîrê Milê Rastê pir merivekî xirab û dexes bûye, ne paşa ne jî xelkê jê hez kiriye. Lê Wezîrê Milê Çepê merivekî baş û jêhatî bû, paşe û xelkê jê hez dikir.

⁹⁷ Zeynelabidîn Zinar, *Pîra Xwînxwur*, Pencînar, Stockholm, 2011.

Wezîrê Milê Rastê ji Wezîrê Milê Çepê pir dihesidî, rojekî difikire ku dek û dolabekî bîne serê wî da ku paşe êdî pê bawer nebe. Wezîrê Milê Rastê, Wezîrê Milê Çepê vedixwîne mala xwe, ji jina xwe re dibêje ku bila gelek pîvaz bîne û sîrê bike xwarinan Wezîrê Milê Çepê ji wê xwarinê gelek dixwe paşê tê birê ku sibê civîbek heye û bêhn ji devê wî tê. Wezîrê din pêşniyariyekê dike ji Wezîrê Milê Çepê re ku sibê potikekî li devê xwe girê bide da ku bêhna pîs neçe paşe. Mêvan diçe malê û Wezîrê Milê Rastê jî diçe cem paşe ku derewan bavêje ser Wezîrê Milê Çepê. Ji paşe ra dibêje ku Wezîrê mile çepê pir gotinên pîs derbarê paşe de gotine û dibêje ku wî gotiye bêhneke pir pîs ji devê paşe tê. Paşe ewilî baweriyê pê naîne lê Wezîrê Mile Rastê dibêje eger ku sibê wî potikek neda ber devê xwe tê bizanibî ku ez derewan dikim. Paşe pir hêrs dibe heya sibê ranazê û dibêje ku ez ê serê Wezîrê Milê Çepê jê bikim. Dema ku sibehê ew tê, paşe potikê ber devê wî dîbîne û bêhtir qîma xwe bi meselê tîne. Paşe nameyek ji Wezîrê Parastinê re dişîne û dibêje kê ku vê nameya min bide te di cî de serê wî jê bike. Wê nameyê digire û dide Wezîrê Milê Çepê dibêje here cem Wezîrê Parastinê bide wî, herin gencîneyê bila xelata te bide te. Lê Wezîrê Milê Rastê matmayî dimîne ku paşe qet hêrs nabe û di dewsa wî da xelat da Wezîrê Milê Çepê. Wezîrê Milê Çepê namê digire û lê Wezîrê Milê Rastê mereq dike û diheside dide pey û diçe cem wî. Ji Wezîrê Milê Rastê re dibêje ku ew ê here xelata wî bîne, Wezîrê Milê Çepê kêfxweş dibe û ji ber bêhna devê xwe vedigere diçe malê.

Wezîrê Milê Rastê diçe cem Wezîrê Parastinê nameyê didê, dema ku nameyê dixwîne hema çavên wî girê didin û gazî cellad dikan, serî jê dikan. Tabî haya Wezîrê Milê Çepê ji bayê felekê tine, diçe cem paşe, dema ku paşe wî dibîne şaş û metel dimîne. Jê dipirse ku name çawa kiriye, ew meseleyê ji paşe re dibêje. Dema ku paşa meseleyê hîn dibe dibêje: Rasto bi rastiya xwe ve hat, xwaro bi xwariya xwe ve çû.⁹⁸

2.59. Rênçberiya Mîrzo û Keleş

Navê Pirtûkê: Rênçberiya Mîrzo û Keleş

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

⁹⁸ Zeynelabidîn Zinar, *Rasto û Xwaro*, Pencînar, Stockholm, 2011.

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 36

ISBN: 91 89491 71 X

Du bira hebûne, navê yê mezin Mîrzo yê biçûk Keleş bûye. Keleş ji Mîrzo serwexttir bûye, sermiyantiya malê dest wî de bûye. Karê wan cotkirin bûye. Bi pîranî Keleş dixebite, Mîrzo egle dibe. Rojekî Mîrzo ji keleş re dibêje ez ê herim rênçberiyê bikim, du heb ga bikirim, em ê ji xwe re tev bixebitin. Mîrzo çend gundan digere, li cem cihûyekî ji xwe re kar peyda dike. Cihû sê şertan ji bo Mîrzo dibêje:

Yek: Tajiyê min bi xwe re bibe li ku mexel hat tu yê wira cot bikî.

Du: Dema ku xwarin û vexwarin ji te re hat, tu yê bi serî ve nexwî û keviyê nan neşkênî.

Sê: Dema ku tu êvarê hatî malê tu yê barek êzingên hûrîrî bi xwe re bînî.

Lê tu vana nekî ez ê qetek çerm ji pişta te rakim. Mîrzo şertan qebûl dike, sibetirê diçe ser kar, tajî diçe li ser erdekî hişk mexel tê, Mîrzo wira cot nake. Keçika Cihû jê re nan tîne, hahanga dixwe û şertên Cihû nayên bîrê. Keça Cihû diçe gişkî ji bavê xwe re dibêje. Dema ku Mîrzo diçe malê, Cihû jê re hêrs dibe ku şertên wî neanîne cih. Ew parçe çerm ji pişta Mîrzo diqetîne. Îcar Mîrzo di nava xwînê de, revîrevî diçe mal û hal û meseleyê ji birayê xwe re dibêje. Roja din îcar Keleş diçe mala Cihû ku jê re rênçberiyê bike, dîsa Cihû hemû şertên xwe ji wî re jî dibêje. Mîrzo şertên wî qebûl dike û sibetirê diçe kar. Tajî diçe li cihekî mexel tê û ew diçe wê derê cot dike, paşê lédixe pişta tajî dişkêne. Keça Cihû nan jê re tîne, ew li gor wan şertan nanê xwe dixwe. Êvarê dema ku diçe malê Cihû wî dibîne xofek dikeve dilê wî. Mîrzo êvarê çavê xwe digire mîna ku radizê disekine, Cihû eşyayên xwe li

kerên xwe bar dike ku here. Mîrzo diçe dikeve cemikekî. Hema sibê zû radibin berê xwe didine gundekî din, di rê de çend kelbên dirinde li wan diqelibin. Cihû dibêje xwezî xulamê min li vir bûya niha stû li wan şikandibû, Mîrzo hema ji nava cemik derdikeve û bi keviran dide kûçikan, kûçik direvin diçin. Keleş dibêje ez birayê Mîrzo me min ji bo heyfa birayê xwe wiha kir, ez ê qetek çerm ji piştta te rakim ku ji vir şûndatir tişteki wisa nekî. Cihû sond dixwe ku êdî tişteki wisa nake, Keleş wî efû dike û Cihû barê kerên xwe dide wî û her kes ber bi rêya xwe ve diçe.⁹⁹

2.60. Sêva Paşê

Navê Pirtûkê: Sêva Paşê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 32

ISBN: 91 89491 62 9

Zemanekî axayekî zehf dewlemend û destvekirî hebûye. Navê axê Camêr bûye, jineke axê hebûye bi navê Pîvokê.

Axê ji jina xwe zef hez dikir, jina axê rojekî diwelide û keçekê ji axê re tîne. Navê keçikê datîne Sêvê, dema ku Sêvê mezin dibe, dibe keçeke pir delal. Axê dixwest jina wê jê re kurekî bîne, ji ber ku jina axê jê re kur naîne axê jina xwe û keça xwe ji mal diqewirîne û çêlekekê dide wan. Pîvokê û Sêvê diçin di gomekî de debara xwe bi firotina şîrê çêlekekê dikin. Axê diçe ji xwe re jineke din tîne, jina nû jî diwelide, ew jî ji axe re keçekê tîne

⁹⁹ Zeynelabidîn Zinar, *Rençberiya Mîrzo û Keleş*, Pencînar, Stockholm, 2011.

Pîvokê rojekî nexweş dikeve û ji Sêvê re wesiyeta xwe dibêje:

-Ku ez mirim vê çêlekê serjê bike, bide cîranan lê bila ji te re hestiyê çêlekê bi şûn de bînin, tu wan hestiya bike bin axê.

Diya Sêvê dimire, Sêvê wesiyeta diya xwe tîne cîh, çendek li ser mirina diya xwe re diçe wan hestiyên ji bin axê derdixe dibîne ku hestî gişk bûne zêr. Sêvê diçe stû û zendên xwe bi zêran tijî dike. Dêmarîya wê dibîne ku ew dewlemend bûye gazî Sêvê dike, dibe mala xwe. Rojekî xortek çav bi Sêvê dikeve û evîndarê wê dibe. Ew xort kurê paşa bûye, xort diçe ji bavê xwe re meseleye dibêje. Bavê wî kurê xwe û cemeatekê dişîne ku keçikê jê re bixwazin. Dêmarî pir ji Sêvê diheside. Ji sêvê re dibêje ku wê îro zîpikên hesin bibarin û wê herkes bimire û seqet be. Dêmarî dibe Sêvê dike tendûrê sîtilek dide ser tendûrê hinek jî qut dike nav. Dema ku mîrîşka qut dixwin dibe teqereq û Sêvê jî hew dizane ku zîpikên hesin dibarin. Dîkek li wir tê zimên, diqîre û cemeatê bi keçikê dihesîne. Cemeat tê keçikê dibîne û wê ji axê dixwezin. Dewata xwe çêdikin û bi bextewerî jiyana xwe didomînin.¹⁰⁰

2.61. Simbêlşonik

Navê Pirtûkê: Simbêlşonik

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 42

ISBN: 91 89491 65 3

¹⁰⁰ Zeynelabidîn Zinar, *Sêva Paşê*, Pencînar, Stockholm 2011.

Ev çîrok cara pêşîn di *Xwençe Vlan* de çap bûye. Çîrok bo zarokan hatiye amadekirin. Naveroka çîrokê wiha; Wextekî paşayekî bi navê Kaşo Paşa hebûye. Kurekî wî yê bi navê Mîrze Miheme hebûye. Paşa rojekî nexweş dikeve û dermanê paşê jî xwarina masiyekî bûye. Diçin masiyeke sax digirin tînin lê kurê paşê dixeyîde, nahêle û masiyê digire û davêje golê. Paşa ku dibihîze ji kurê xwe re pir hêrs dibe û ferman dide ku wî bikujin. Lê wezîrên paşê nahêlin û li dewsa kuştinê Mîrze Miheme sirgûn dikin. Dema ku Mîrze Miheme diçe di rê de rastî merivekî tê Navê mêrik Simbêlşonik bûye. Ji vê şûnde Mîrze Miheme bi nasîna Simbêlşonik gelek macerayên xerîb û balkêş tên serê Mîrze Miheme.¹⁰¹

2.62. Toz Paşayê Kurê Çeqçeq Paşa

Navê Pirtûkê: Toz Paşayê Kurê Çeqçeq Paşe

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 28

ISBN: 91 89491 59 9

Ev çîrok cara pêşîn di *Xwençe Vlan* de çap bûye. Çîrok bo zarokan hatiye amadekirin. Ev çîroka rovî û qeraş e. Qeraş û rovî destebirayê hev bûne. Rojekî mesela zewacê vedibe, Rovî ji Qeraş re dibêje ez ê te bizewicînim. Diçe li nêz qesra paşê li ser textê xwazgîniyan rûdinê. Dibînin ku wa ye roviyek hatiye li ser textê xwazgîniyan e, ji paşe re dibêjin. Paşa bawer nake, tê bi xwe dibîne ku rast e, roviyek hatiye. Gava ku Paşa ji rovî dipirse tu keça min kê re dixwazî? Rovî jî navê Toz Paşayê Kurê Çeqçeq Paşe dide. Paşe çawa ku navê paşetiyê dibihîze qebûl dike û

¹⁰¹ Zeynelabidîn Zinar, *Simbêlşonik*, Pencînar, Stockholm 2011.

dibêje here gazî kurê paşê bike. Qeraş kincan li xwe dike diçe qesra paşê. Paşa mehra wan dibire, daweta wan dike bûkê dişîne mala zavê. Rovî dibêje karekî min heye, di pêş de diçe. Dikeve mala hirçê, hirçê ditirsîne, dibêje ku nêçîrvan tên. Li pey donê hirçan digerin, hirç direve ji wê deverê diçe. Rovî gazî qeraş dike û diçin mala hirçê ya xweş û şên. Baweriya bûkê bi paşatiyê çêdibe. Ji xwe re bi xweşî jiyana xwe didomînin.¹⁰²

2.63. Tûtika Cinî

Navê Pirtûkê: Tûtika Cinî

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 30

ISBN: 91 89491 21 1

Li welatê cinan keçeke pîrr bedew hebûye. Kurê paşê dilê wî dikeve wê keça bedew. Paşe diçe wê keçikê ji kurê xwe re bixwaze lêbelê kurê paşê yekî pîrr pîs bûye, keçik nazwaze bi wî re bizewice.

Ji ber ku keçik cin e rojekê dibe tûtîyekî û diçe li ber derê gavanê gundekî, gavan wexta ku diçe ber dewara tûtî dibe keçeke malê û malê dide hev, xwarinê ji wî re çêdike. Li nêzî mala wan maleke paşê hebûye, bexçeyekî wî yê gir hebûye. Tûtî diçe ji wir pincarê diçine. Rojekî dema ku keçik diçe pincarê biçine, kurê paşê wê keçika bedew dibîne û dişopîne. Paşê keçik dibe tûtîyekî diçe mala gavan. Kurê paşê jî wê dişopîne dibîne ku diçe mala gavên.

¹⁰² Zeynelabidîn Zinar, *Toz Paşayê Kurê Çeqçeq Paşe*, Pencînar, Stockholm, 2011.

Rojekî diçe ji bavê xwe dixwaze ku wê tûtîyê jê re bixwaze. Bavê wî û diya wî qirfê xwe bi wî dikin lê ew lawa û rica dike wan qayîl dike. Diçin tûtîyê jê re tînin û dibin qesra paşê. Rojekî li mêvandariyê diya gede çev bi keçeke bedew dikeve û şaşwaz dibe. Dema ku diçe mala xwe dibêje xwezî ev bûka min bûya, gede dibêje ez wê nîşanê te bidim tu yê nas bikî, diya gede dibêje erê. Gede keçika bedew dîne nîşanê diya xwe dide û dibêje ev bûka te ye. Diya wê şaş û matel dimîne û dewateke şên ji wan re li dar dixê û bi bextewerî dijîn.¹⁰³

2.64. Keça Sêvê

Navê Pirtûkê: Keça Sêvê

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 50

ISBN: 91 89491 61 0

Ev pirtûka çîrokî ya li ber destê me, li ser serpêhatiyên di navbera keçeke xerîb, paşa û kurê paşê de derbas dibe. Di çîrokê de zarokên paşê çênabin û rojekê dîsa paşa ketiye nav lez û beza dermanên ji bo zarokan. Piştî gelek wextan paşa ji sêvekê şîfa dibîne û kurekî wî çêdibe. Kurê Paşê mezin dibe tê çaxê zewacê û dixwaze bizewice. Li gelek deveran digere û didawiyê de sêvek dibîne û ew sêv dibe keçikek pir bedew. Lê keçikek reşik û hesûd jî heye, ji bo ku bibe jina kurê paşê xirabiyan li Keça Sêvê dike. Bixwe dibe jina kurê paşê. Lê di dawiyê de fendên keçika reşik derdikeve holê û kurê paşê wê berdide. Di dawiyê de jî Keça Sêvê û Kurê Paşê digêhêjin hev.

¹⁰³ Zeynelabidîn Zinar, *Tûtika Cinî*, Pencînar, Stockholm, 2011.

2.65. Daweta Kurê Paşê û Qîza Gavan

Navê Pirtûkê: Daweta Kurê Paşê û Qîza Gavan

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 40

ISBN: 91 89491 66 1

Çîroka ku em ê qal bikin berê pêşîn di *Xwençe Van* de bi awayê kurt çap bûye. Paşê Zinar vê çîrokê jî wekî yên din tenê wekî pirtûk dide çap kirin. Mijara çîrokê tenê kurekî paşê hebûye ku hatiye wextê zewacê. Lê paşa kiriye nekiriye, keçên ku paşa dîtine bi dilê kurik nebûne. Paşa jî edî ji vê rewşê acizbûye û karê çavgerandina keçan daye destê lawik bixwe. Lawik şa dibe ku dê bi dilê xwe ji xwe re keçan bigere. Axir ha vî gundî ha vê gundî rastî keçikekê tê. Lê keçik şareza bûye zanibûye ev kesê li ser hespê boz û xurcezîna wî ne kesê ji rêzê ye. Lê keçik jî bi têra xwe bedew bûye. Di wê rojê de lawê mîrê cinan ji wir derbas dibe wa dibîne bûkê şaşamoşo bûye nizane tayê ser hevdu re bavêje. Lawê mîrê cinan pê dikene lê pir dikene ser piştê erdê dikeve. Lê heft sal e birîneke lawê mîrê cinan hebûye ku tu bijîşk û hekîm nikaribûne wê birînê biteqînin da ku kêma wê derxin der. Lê bi wê ketina kurê mîrê cinan birîna wî didere û ew ji vê nexweşiyê xelas dibe. Îcar lawê mîrê cinan ji bûkê re dibêje tu çi divê. Bûk jî jê xurcezînekê dixwaze da ku bibe nîşanê şeniyên qesrê û paşayê xwezûrê xwe bike. Wisa jî dibe û bûkê vê rewşê xelas dibe. Ew û merê xwe edî bi aramî dijîn.¹⁰⁴

¹⁰⁴ Zeynelabidîn Zinar, *Daweta Kurê Paşê û Qîza Gavan*, Pencînar, Stockholm, 2011.

BEŞA SEYEM

3. Pirtûkên Tîpguhêziyê

Zinar li ser ziman û berhevkarîya kurdî bi piralî tevgeriyaye û li ser qadên cuda xebitiye. Piştî folklorê wî herî zêde bala xwe daye xebatên transkrîpsiyonê. Ji ber ku piştî ku Celadet Alî Bedirxan (1893-1951) alfabeya latînî bo kurdî damezirand, rêjeya xwendewarên kurdiya bi tîpên erebî kêmtir bû. Xasma li Tirkiyeyê tenê kesên ku perwerdehiya medreseyan didîtin û vê kevneşopiyê re nas bûn dikaribûn pirtûkên bi tîpên erebî bixwendana. Lewra hejmareke mezin ya xwînerên kurdî ji wan pirtûkên klasîk bêpar diman ku pîrriya wan berhemên herî sereke yê edebiyata klasîk bûn. Bi mebesta ku xwendevan zêdetir ji pirtûkên kurdî yê bi tîpên latînî îstifade bikin Zinar bi karekî wiha rabûye û bi dehan berhemên kevn ên destxet aniye bi tîpên latînî amade kiriye û pêşkêşî xwendevanên kurdî kiriye. Herwiha divê bête gotin ku berhemên ku hatine latînîzekerin hemû ne berhemên klasîk in. Di nav wan de berhemên wekî *Çanda Warên Talankirî* (1997) *Hostanîbêja Zarhawayên Kurdî* (1996) û hwd. hene ku ne berhemên klasîk in.

Li gorî lêkolîna ku me li ser vê mijarê kiriye, heta niha 32 berhemên kurdî (klasîk û yê din) ku bi tîpên ‘erebî hatibûne nivîsîn, ji aliyê Zinar ve hatine latînîzekerin. Herwiha Zinar edîtorî û weşangerî jî ji wan re kiriye. Yanê wî him tîpguhêziya berhemê bo alfabeya latînî û him jî wî bi xwe çap û mizanpaj kirine. Di nav van xebatên tîpguhêziyê de neh berhemên wî bi dest neketin. Gelek xebatên Zinar bi hejmareke bi sînorkirî hatine çapkirin, hin pirtûkên tîpguhêziyê bi daktîloyê hatine nivîsîn û nusxeyên wan jî kêmtir in an jî nayên dîtin. Îcar me pirtûkên ku nehatin bi destxistin bi rêya malpera Zinar ya pirtûkên wî da nasîn.

Pirtûkên tîpguhêziyê, xebatên nivîskar ên ewil in. Nivîskar di xebatên xwe yê ewil de ji ber ku wê demê hê biryara guhertina paşnavê xwe nedaye wekî Zeynelabidîn Kaya xuya dike. Piştî çend xebatên ewil paşnavê xwe wekî Zinar (Kaya) dinivîse. Di berhema bi navê *Sirmehşerê* (1990) paşnavê xwe êdî tenê wekî Zinar dinivîse. Herwiha berhemên ewil ên Zinar de herfa “î”yê wekî “i” hatiye nivîsandin.

3.1. Nûbara Ehmedê Xanî

Navê Pirtûkê: Nûbara Ehmedê Xanî

Nivîskarê Berhemê: Ehmedê Xanî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Roja Nû

Sala Weşanê: 1986

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 80

ISBN: 91 767201 7 9

Ehmedê Xanî kitêba xwe ya bi navê *Nûbihara Biçûkan* ji bo zarokên kurmancan ên ku diçine medreseyê nivîsiye. *Nûbihara Biçûkan* ji aliyê nivîskar Zinar ve di sala 1986an de tîpguhêziya alfabeya erebî ji bo alfabeya latînî kiriye. Ehmedê Xanî ji bo telebeyên kurmancan zûtîr hînê zimanê erebî bibin, berhema navborî wekî materyaleke dersê ya fêrkirinê amade kiriye. Ehmedê Xanî ev armanca xwe di destpêka *Nûbiharê* de wiha diyar dike:

Ne ji bo sahib rewacan,

Belkî ji bo biçûkêt Kurmancan¹⁰⁵

Kitêb yekem ferhenga kurdî ye, bi awayekî helbestî erebî-kurdî, kurdî-erebî hatiye nivîsîn. Gava ku em destpêka berhemê dinêrin wekî kitêbên klasîk ên din bi spasdariya Xwedê, dû re pesnê pêxemberê Xwedê Hezretî Muhammed (s.x.l) û paşê jî mexseda nivîsîna vê kitêbê dibînin. Di her beşê de piranî ji bo perwerdehiya zarokan şîretên cihêreng tê kirin. Di honandina helbestan de, carcaran peyva pêşîn

¹⁰⁵ Ehmedê Xanî, *Nûbara Biçûkan*, amd. Zinar, Roja Nû, Stockholm 1986, r. 7.

yan jî çend peyv bi erebî ne piştire kurdî ne an jî pêşî kurdî ne dû re erebî ne. Zinar di derbarê tîpguhêziya vê berhemê de di pêşgotinê de xwînêran haydar dike. Ev çapa ku di destê Zinar de çapa sala 1903an e ku li Stenbolê derketiye. Nusxeyek din jî ku bi destê Mele Mihemed Wanî hatiye nivîsandin di sala 1903an de ji aliyê A Von Le Coq ve li Berlînê çap bûye. Herwiha em di vir de bi bîrbixin ku lêkolîner/nivîskar Zinar her du nusxeyên vê kitêbê daye berhev û cudatiya di nabera wan de wekî têbinî di vê çapê de nîşan kiriye. Ango ev berhem ne tenê transkrîpsiyon e herwiha edîsyon-krîtîk jî hatiye kirin.

Zinar sedema vê xebatê wiha tine ziman: “Amaca me ji çapkirina *Nûbara* Xanî li welêt ev e ku em wê pêşkêşê xwendevanên kurd bikin û wan ji wêjeya klasîk a kurdî agahdar bikin.”¹⁰⁶ Di pirtûkê de pêşgotineke Zinar û 37 rûpelên bi tîpên erebî, 39 rûpelên bi tîpên latînî heye. Di pêşgotinê de jiyana Ehmedê Xanê hatiye nivîsîn. Dîsa di pêşgotinê de qala pêvajoya çapkirina kitêbê tê kirin. Berhem bi tevahî ji 14 beşan pêk tê, her beşek bi malikekê ve dest pê dike.

3.2. Dîwan

Navê Pirtûkê: Dîwan

Nivîskarê Berhemê: Melayê Cizîrî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar û Emîn Narozi

Weşanxane: Roja Nû

Sala Weşanê: 1987

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 560

ISBN: 91 767202 1 7

¹⁰⁶ Xanî, *h. b.*, amd. Zinar, Roja Nû, Stockholm 1986, r. 6.

Dîwana Melayê Cizirî, cara yekem di sala 1904an de bi tîpên erebî ji aliyê lêkolîner Martin Von Hartman ve li Elmanyayê tê çapkirin. Piştî vê çapê, gelek caran ji aliyê çend kesan ve *Dîwan* tê çapkirin û di gelek zimanên din de jî tê şerhkirin. Dîwana Melayê Cizirî ya latînîzekerî bi temamî cara ewil ji ber destên lêkolîner Zinar û Emîn Narozi derçûye.

Du pêşgotinên *Dîwanê* hene. Pêşgotina ewil aidê çapa bi tîpên erebî ye ku jê tîpguhêziyê kirine. Lê Zinar û Emîn Narozi wekî têbinî diyar kirine ku nivîskarê vê pêşgotin û çapê ne diyar e. Ji ber vê yekê Zinar û Narozi navê vê çapê danîne “çapa bînav”. Pêşgotina ewil a “çapa bînav” ji deh rûpelan pêk tê. Pêşgotin beş bi beş hatiye hazirkirin. Ji nav û bernavkê Mela bigire hetanî nakokiyên li ser dema tarîxa rojbûyînê, eşîr, xwendin û wefata wî nivîsiye. Pêşgotina duyem jî ji aliyê Zinar û Narozi ve hatiye nivîsîn. Ev pêşgotin jî pênc rûpel e ku zêdetir qala wextê tarîxa rojbûyîna Mela kiriye.

Çapa bi navê “çapa bînav” ku Zinar û Narozi tîpguhêziya wê kirine, ji 123 beşan pêk tê. Lê her du lêkolîner di pêşgotinê de jî behs kirine ku her çiqas ev “çapa bînav” esas girtine jî ji gelek çapên din jî îstifade kirine. Gava ku em helbestan dinêrin sernivîsa her beşekê li gor dengê qafiyeya wê beşê, pîtek lê hatiye dayîn. Amadekaran ji bilî van sernivîsên orjînal, li serê her beşekê navek nivîsîne. Ew navên ku li serê her beşeke helbestê kirine jî ji naverok an jî peyveke hatiye hîlbijartin. Dîsa amadekaran ferhengê çêkirine bo peyvên nenas yê ku di *Dîwanê* de derbas dibin. Çimkî di helbestên Mela de peyvên erebî û farisî gelek in. Di pirtûkê de destxeta ku jê hatiye îstifadekirin di dawiya kitabê de hatiye bicihkirin. Herwiha Zeynelabidîn Zinar di vê pirtûkê de paşnavê xwe bi awayê fermî wekî Kaya nivîsiye.

3.3. Mewlûda Kurmancî

Navê Pirtûkê: Mewlûda Kurmancî

Nivîskarê Berhemê: Melayê Bateyî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Roja Nû

Sala Weşanê: 1987

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 64

ISBN: 91 767201 8 7

Zinar *Mewlûda Kurmancî* ya Melayê Bateyî di sala 1987an de bo çapê amade kiriye.¹⁰⁷ Ev berhem yekem mewlid e di kurdî de. Ev mewlid di heman demê de mewlida herî berbelavbûyî ya kurmancî ye jî. Zinar ev mewlid dema di salên 1989-90 li Pirtûkxaneyê Qiraliyetê ya Swêdê şixuliye, dîtiye. Nuxxeya ku bi dest xistiye ya A. v. Le Coq e. Li gorî nivîsa di danasina pirtûkê de cih digire *Mewlûda Kurmancî* ji 19 beşan û 582 malikan hatiye avakirin.¹⁰⁸

3.4. Nehc-ul Enam

Navê Pirtûkê: Nehc-ul Enam

Nivîskarê Berhemê: Mele Xelîlê Sêrtî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Weşana Kurdistan

Sala Weşanê: 1988

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 54

ISBN: 91 870960 2 1

¹⁰⁷ Me ev pirtûk bidest nexist. Lê me agahiyên di derbarê pirtûkê de ji malpera pirtûka Zinar wergirt.

¹⁰⁸ <http://www.pencinar.se/bocker/bocker2/Nr-4.htm> 15.04.2018.

Pirtûkeke bi nav û deng e ku gelek salên dirêj li medreseyên Kurdistanê hatiye xwendin û hê jî tê xwendin. Zinar ji vê pirtûkê re pêşgotinek nivîsiye û behsa jiyana Mele Xelîl û armanc û girîngiya berhemên klasîk û tîpguhêziyê kiriye. Herwiha destxeta *Nehc-ul Enamê* di dawiya pirtûkê de bi cih digire.

3.5. Dîwana Rûhî

Navê Pirtûkê: Dîwana Rûhî

Nivîskarê Berhemê: Şêx Evdirehmanê Axtepi

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Jîna Nû

Sala Weşanê: 1988

Ciyê Weşanê: Uppsala

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 140

ISBN: 91 970927 6 2

Şêx Evdirehmanê Axtepi şairê herî navdar ê malbata axtepiyan e. Malbatê de xêncî Axtepi kesên wekî Şêx Eskerî, Şêx Mihemed Can û Şêx Hesîb heye. Ango malbat di edebiyata kurdî de cihekî muhim digire. Zinar tîpguhêziya pirtûka *Dîwana Rûhî* ya Axtepi kiriye û bo çapê amade kiriye.¹⁰⁹ Li gorî danasîna ku ji aliyê Zinar ve bo pirtûkê hatiye amadekirin dîwan di 1876an de hatiye nivîsandin. Bi tevayî 28 beş û 471 malik in. Tê de hin pêncok jî hene. Ev çapa latînî 140 rûpel e û di 1988an de li Uppsalayê çap bûye.¹¹⁰

¹⁰⁹ Me ev pirtûk bidest nexist. Lê me agahiyên di derbarê pirtûkê de ji malpera pirtûka Zinar wergirt.

¹¹⁰ <http://www.pencinar.se/bocker/bocker2/Nr-10.htm> 18.04.2017

3.6. Iqdê Durfam

Navê Pirtûkê: Iqdê Durfam

Nivîskarê Berhemê: Şêx Eskerî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Apec- tryck

Sala Weşanê: 1989

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 203

ISBN: 91 877301 6 2

Pirtûka li ber destê me ya Şêx Eskerî ye ku di sala 1988an de ji aliyê nivîskar Zinar ve ji tîpên erebî bo tîpên latinî hatiye tîpguhêzîkirin. Şêx Eskerî kurê Şêx Evdirehmanê Axtepî ye. Şêx Eskerî di sala 1938an de dest bi kitêba *Iqdê Durfam* kiriye û di sala 1942an de red kiriye. Wexta ku meriv li kitêbê dinêre di destpêkê de wêneyekî Şêx Eskerî û pêşgotineke Zinar heye. Di dawiyê de jî naverokê heye. Zinar di pêşgotina du-rûpelî de qala jiyana Şêx Eskerî, girîngiya malbata Axtepiyan, serboriya bidestxistina nusxeyan û bi berfirehî jî *Iqdê Durfamê* kiriye.

Şêx Eskerî di *Iqdê Durfamê* de çîrokên kurdî yên folklorîk bi awayê helbestkî nivîsiye. Berhem ji sêzdeh beşan pêk tê. Bo nimûne, sernava ewil bi navê “Bendê Ewwel Der Mebhesê Tewhîdê Xuda We Ezmîhî” ye û sernav heta dozdehan bi vî rengî diçe. Lê ji nav wan sêzdeh beşan de beşek ji wan cuda ye ku bi navê bendan nehatiye binavkirin. Navê wê beşê “Ev Zeyla Sebebê Nezma Kîtab” e. Hemû bi qafiye û wezn in. Hejmara malikan 2584 in.

3.7. Mîrsad-ul Etfal

Navê Pirtûkê: Mîrsad-ul Etfal

Nivîskarê Berhemê: Şêx Mihemed Kerbela

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar (Kaya)

Weşanxane: Jîna Nû

Sala Weşanê: 1989

Ciyê Weşanê: Uppsala

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 125

ISBN: 9197092754

Pirtûka bi navê *Mîrsad-ul Etfal* ji aliyê Şêx Mihemed Kerbela ve di sala 1921an de hatiye nivîsin. Zinar jê re pêşgotinek nivîsiye û behsa nusxeya li ber destê xwe kiriye ku ji Zeynelabidîn Amedî wergirtiye. Ev pirtûk ferhengeke menzûm e. Ferhengeke kurdî/kurmancî-farisî ye. Kerbelayî ji bo zarokên kurd wekî materyaleke dersê ev ferheng amade kiriye. Di berhemê de ji bo her peyvekê hevokeke kurmancî hevokeke farisî li dû hevdu ne.¹¹¹ Li gor Çeçen ev ferheng li seranserê Kurdistanê berbelav nebûye û nehatiye nasîn. Çeçen jî sedema vê yekê wiha tîne ziman: “Nûbehar, Gulzar, Ehmedî di medreseyan kurdan de wekî pirtûkên dersê hatine xwendin. Lê belê ji ber şert û mercên taybetî yên heyama Kerbelayî, ev ferhenga wî ya hêja di medreseyan kurdî de belav nebûye. Tenê li medresa Aqtepeyê û li derûdora wê hatiye xwendin.”¹¹²

¹¹¹ Şêx Mihemed Kerbelayî, *Mîrsad-ul Etfal*, amd. Zinar, Jîna Nû, Uppsala 1989.

¹¹² Ramazan, Pertev, *Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) Ferhenga Menzûm A Kurdî-Farisî (Vekolîn-Text)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2012, r. 130.

3.8. Sirmehşer

Navê Pirtûkê: Sirmehşer

Nivîskarê Berhemê: Feqe Reşîdê Hekarî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: YDK

Sala Weşanê: 1990

Ciyê Weşanê: Düsseldorf

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 112

ISBN: Nehat dîtin

Pirtûk bi awayê helbestkî hatiye nivîsîn û bi hûrgilî behsa mehşer û axretê dike. Tê de bîst û çar beş hene. Di pêşgotinê de di derbarê peydekirina vê nisxeyê de Zinar diyar kiriye ku ji nusxeya 1984an ya Mele Ehmedê Qoxî latînze kiriye. Nusxeya resen bi tîpên erebî jî di pirtûkê de berdest e.¹¹³

3.9. Herdubat

Navê Pirtûkê: Herdubat

Nivîskarê Berhemê: Mele Zahidê Diyarbekrî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Apec-tryck

Sala Weşanê: 1990

Ciyê Weşanê: Stockholm

¹¹³ Feqe Reşîd, Hekarî, *Sirmehşer*, amd. Zinar, YDK, Dusseldorf 1990.

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 74

ISBN: 91 877301 8 9

Pirtûka bi navê *Herdubat* ya Mele Zahidê Diyarbekrî mewlûd e. Ji aliyê aliyê riste û şêwazê ve ji Melayê Bateyî tesîr girtiye. Zinar ji pirtûkê re pêşgotinek nivîsiye. Di pêşgotinê de di derbarê kurtejiyana Mele Zahidê Diyarbekrî, zimanê mewlûdê, bisdestxistana pirtûkê de agahî dane. Mele Zahidê Diyarbekrî kitêba xwe, li gor hesabê ebcedê 1964an de nivîsiye. Gava em naveroka pirtûkê dinêrin pirtûk 667 beyt û ji bîst û du beşan pêk tê.¹¹⁴

3.10. Rêberê Sanî, Şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî

Navê Pirtûkê: Rêberê Sanî, Şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî

Nivîskarê Berhemê: Mele Ehmedê Qoxî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: YDK

Sala Weşanê: 1990

Ciyê Weşanê: Düsseldorf

Ebada Pirtûkê: 20 X 15 cm.

Jimara Rûpelan: 180

ISBN: Nehat dîtin

Ji navê pirtûkê jî tê fehm kirin ku pirtûk pirtûkeke şerhê ye. Mele Ehmedê Qoxî *Eqîdeya Ehmedî Xanî* ya bi nav û deng bi pexşanî şîrove kiriye. Qoxî, *Rêberê Sanî, Şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî* di sala 1984an de nivîsiye. Gava em pirtûkê

¹¹⁴ Mele Zahidê, Diyarbekrî, *Herdubat*, amd. Zinar, Apec-tryck, Stockholm 1990.

dinêrin tîpguhezerê pirtûkê Zinar ji vê kitêbê re pêşgotinek nivîsiye. Zinar di hazirkirina pirtûkê de kîjan teknîk, rêgeh û pergala bi kar aniye yeko yeko di pêşgotinê de destnîşan kiriye.¹¹⁵

3.11. Dîwan

Navê Pirtûkê: Dîwan

Nivîskarê Berhemê: Pertew Begê Hekarî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Rewşen

Sala Weşanê: 1991

Ciyê Weşanê: Bonn

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 271

ISBN: Nehat dîtin

Gorbihişt Sadiq Behaedîn Amêdî dîwana Pertew Begê Hekarî berhev kiriye û dîsa bi tîpên erebî di 1978an de li Bexdadê çap kiriye.¹¹⁶

“Tê gotin ku ev dîwan di 1806an de hatiye nivîsandin. Birêzkirina wê mînaye Dîwana Melayê Cizîrî; bi kêş û nîkl e. Qafiyeya wê li gor tîpên elîfbêtika erebî çêbûye. Tê de 30 sernav, şeş şeşkok hene û bi temamî 238 rûpel e.”¹¹⁷

3.12. Rewdneîm

Navê Pirtûkê: Rewdneîm

Nivîskarê Berhemê: Şêx Evdîrehmanê Axtepî

¹¹⁵ Mele Ehmed Qoxî, *Rêberê Sanî, şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî*, amd. Zinar, YDK, Dusseldorf 1990.

¹¹⁶ Ev pirtûk bi dest neket.

¹¹⁷ <http://www.pencinar.se/bocker/bocker2/Nr-8.htm> 17.05.2017.

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1991

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 438

ISBN: 91 830 0620 0

Rewdinne'îm mîraçnameyeke Kurdî/Kurmancî ye. Mijara wê ya sereke mîrac û şemaîla Hezretî Pêxember e.¹¹⁸ Bergê pirtûkê şîn e û li ser vê bergê bi tîpên reş û qalîn peyva *Rewdneîmê* nivîseke mezin heye. Di pirtûkê de pêşgotinek, naverokek, rûpelek ji desxeta *Rewdneîmê* jî tê de heye. Lê naveroka vê pirtûkê di dawîya pirtûkê de hatiye bicihkirin. Di bergê dawî de jî helbesteke Şêx Evdîrehmanê Axtepî heye.

Zinar diyar kiriye ku di sala 1988an de latînîze kiriye û E. Narozi jî alîkariya wî kiriye. Lê derfet çênebûye ku wê demê *Rewdneîmê* çap bikin. Di pirtûkê de 35 beş hene, babeta her beşekê jî ya din cihê ye. Çawa ku Axtepî bixwe di paşîya pirtûkê de nivîsiye, tê de 4531 beyt hene. Tev, mînane kêş û nikla Mewlûda Melê Bateyî û malik hemû bi yazde kiteyan dikişin, her du rêz jî bi eynî tîp qafîye ne.

3.13. Leyl û Mecnûn

Navê Pirtûkê: Leyl û Mecnûn

Nivîskarê Berhemê: Şêx Mihemed Can

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

¹¹⁸ M. Zahir Ertekin, "Şeyh Abdurrahman Aktepî'nin Rewdinne'îm Adlı Eserinde Kalem". *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Cilt. 1, Sayı. 2, Bingöl 2015, r. 15.

Sala Weşanê: 1992

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 352

ISBN: 91 630 1486 6

“Mihemed can yek ji şairên serdema klasîk a Kurdî ya Kurmancî ye”.¹¹⁹ Zinar di pêşgotina pirtûkê de behsa jiyana Şêx Mihemed Can kiriye. Paşê jî serboriya bidestxistina nusxeya pirtûkê kiriye. Ev nisxeya ku Zinar latînîze kiriye ya Şêx Eskeriyê kurê Şêx Mihemed Can e.

Gava em latînîzeyê Zinar dinêrin tê de wekî terzên klasîkên kurdî bi besmeleye dest pê kiriye ku ev beş şazdeh rûpel e. Paşê jî beşeke bi navê “Sebebê Telîfî Kitab” heye. Dû re êdî bend dest pê dikin heta benda hevdehan. Piştî xelabûna bendan beşeke bi navê “saqîname û xetmê kitab” heye. Di dawiya pirtûkê de jî ferhengokek heye. Bi kurtasî ev pirtûk çîroka Leyla û Mecnûnê ye ku Şêx Mihemed Can du malik du malik çîrokê bi kêş û kafiye ristiye.¹²⁰

3.14. Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî

Navê Pirtûkê: Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî

Nivîskarê Berhemê: Mela Nûriyê Hesarî

Amadekar û Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1996

Ciyê Weşanê: Stockholm

¹¹⁹ Zeydîn Güllü, “Leyl û Mecnûn’a Şêx Mihemed Can”, *Zarema*, j.9, Diyarbekir 2017, r. 110.

¹²⁰ Şêx Mihemed Can, *Leyl û Mecnûn*, amd. Zinar, Pencînar, Stockholm 1992.

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 244

ISBN: 91 972779 2 4

Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî pirtûkeke rêzimanê ye ku heta niha xebateke zanistî li ser nehatiye kirin. Hesarî di pirtûkê de bi temamî ji xwe re termînolojiyêke rêzimanî ya cuda afirandiye. Berhem ji 18 beşên serbixwe, sernivîsek û pêşgotinekê pêk tê. Ev pirtûk bi şiklê desxetê de bûye. Zinar pirtûkê latînîze dike. Herwiha ev pirtûk li tu deverî bi tîpên erebî çap nebûye.

3.15. Serfa Kurmancî

Navê Pirtûkê: Serfa Kurmancî

Nivîskarê Berhemê: Mele Elî Teremaxî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1997

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 140

ISBN: 91 972779 4 0

Serfa Kurmancî ya Elî Teremaxî di sala 1997an de ji aliyê lêkolîner Zeynelabidîn Zinar ve hatiye latînîzekirin. Zinar ji vê kitêbê re agahdariyek nivîsiye. Em, ji agahdariya Zinar pê dihesin ku wexta nivîsîna *Serfa Kurmancî* ne diyar e. Zinar radigihîne ku ew di sala 1986an de rastî *Serfa Kurmancî* ya çapkirî hatiye. Lê ev çapa destxet ku Zinar latînîze kiriye ji aliyê Dr. Marûf Xeznedar ve di sala 1971an de li Bexdayê ligel serarastkirinan çap bûye. Herwiha, Dr. Marûf Xeznedar ev

destxet li Bexdayê dîtiye. Destxet bi destê Mela Mehmûdê Bazîdî hatiye nivîsandin û Mela Mehmûdê Bazîdî jî jê re pêşgotinek nivîsiye. Mela Mehmûdê Bazîdî di pêşgotina de xwe de behsa Elî Teremaxî, gundê wî, zehmetiya ilmê serfê û dersdayîna Elî Teremaxî ya ku di gundê xwe de kiriye.

Gava ku meriv li naveroka kitêbê dinêre Elî Teremaxî di destpêka kitêbê de hin agahî dane. Ev agahî derbarê muhîmiya ilmê serfê de ye. Em ê di vir de rasterast ji hevoka pêşîn a Elî Teremaxî neqil bikin. ”Î’lem! Tu bizan! Ey mufredê muzeker ê muxattek ku ji boyî tayîfa Ekradan ra jî lazim e ku bi zimanê kurmancî ew ji ‘ilmê serfê bizanin. Lewra bina û asasa hemû ‘ilman, li ser ‘ilmê serfê ye”¹²¹. Dîsa di vê destpêkê de diyar kiriye ku eger axaftin û nivîsandin li gor qaîdeyên rêzimanî nebe dê gelek şaşî û tevliheviyê çêbibe. Kitêb bi awayê fêrkirina zimên hatiye amadekirin û rêzimana erebî bi kurmancî şîrove kiriye. *Serfa Kurmancî* ji 33 mijarên rêzimanî pêk tîn. Her babetek bi serê xwe ye. Di her mijareke *Serfa Kurmancî* de Teremaxî mînakên xwe ji erebî û farisî girtiye, pê re jî berawirdî kurmancî kiriye.¹²² Li gorî Leezenberg *Serfa Kurmancî* hem ji bo xebatên zimanê kurdî hem jî ji bo dîroka hînkirina kurdî xwediyê giringiyeke mezin e.¹²³

3.16. Çanda Warê Talankirî

Navê Pirtûkê: Çanda Warê Talankirî¹²⁴

Nivîskarê Berhemê: Ebas Alkan

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1997

¹²¹ Mele Elî Teremaxî, *Serfa Kurmancî*, Amd. Zeynelabidîn Zinar, Pencînar, Stockholm, 1997, r, 9.

¹²² Elî, Teremaxî, *Serfa Kurmancî*, amd. Zinar, Pencînar, Stockholm 1997.

¹²³ Michiel Leezenberg, “Elî Teremaxî and the Vernacularization of Medrese Learning in Kurdistan”, *Iranian Studies*, 2014, Vol. 47, No.5, r. 713.

¹²⁴ Me ev pirtûk bidest nexist. Lê me agahiyên di derbarê pirtûkê de ji malpera pirtûka Zinar wergirt.

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 140

ISBN: 91 972779 5

“Ji folklorê kurdî hatiye amadekirin. Du beş e. Di beşa pêşî de 24 zargotin, 16 zûgotin û 352 mamik hene. Di beşa diduyan de heft çîrokên rawilan hene ku nivîskar bi hawayekî helbest, bi kêş û qafiye ristine. Ji bo zarûkan pir xweş e û hêjayê xwendinê ye.”¹²⁵

3.17. Sêkêşan

Navê Pirtûkê: Sêkêşan

Nivîskarê Berhemê: Mela Evdilhadiyê Comanî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1998

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 200

ISBN: 91 973403 0 8

Kitêba bi navê *Sêkêşan*, di sala 1963-64an de ji aliyê Mela Evdilhadiyê Comanî ve hatiye nivîsîn. Lêkolîner Zinar, ev pirtûk di sala 1998an de bi têkilî û piştgiriya hin dost û hevalên xwe latînîze kiriye. Di rûpela pêşîn a pirtûkê de bi erebî navê pirtûkê Selasetu Menzûmatîn, dîsa di rûpela sisêyan de jî navê pirtûkê *Kîtab-ul*

¹²⁵ <http://www.pencinar.se/bocker/bocker2/Nr-18.htm> 25.05.2017

Muhîmmatî fî beyan-îl kufri wel muhlîkatî hatiye nivîsîn. Gava ku Zinar pirtûkê latînîze kiriye navê pirtûkê li gor sernava erebî kiriye *Sêkêşan*. Ango ji mijarên pirtûkê jî xuya ye ku sê problem û kêşeyên misilmanan hene ku Zinar jî kiriye *Sêkêşan*. Pirtûk ji sê beşan pêk tê. Em dikarin tesnîf û navlêkirina pirtûkê rasterast ji hevokên Zinar ragihîni. El Menzûmet-ul Ûla: Fîrredetî. (Kêşana pêşî: Kafîrbûn e). El Menzûmet-ul saniyetî: Fîl ‘Eqaidî. (Kêşana diduyan: Pêbawertî ye). El Menzûmet-ul salîsetî: Fîl Feraizî. (Kêşana sisêyan: Mîrate ye) Me‘e be‘z-il qesaidî (Digel hin helbestên din).¹²⁶ Pirtûk zêdetir li ser babetên wekî dîn, bawerî û hûqûqê ye. Zinar ji vê kitêbê re pêşgotinek nivîsiye û di pêşgotinê de jî girîngiya vê pirtûkê destnîşan kiriye. Dîsa di vê pêşgotinê de qala serboriya dîtina vê destxetê kiriye. Zinar bi kurtasî jiyana Mela Evdilhadiyê Comanî di pêşgotinê de bi cih kiriye. Li gor analîzên Zinar pirtûk ji aliyê şêwaz û rûxsarê ve dişibe tevna *Mewlûda Kurmancî* û *Rewdnêma Şêx Evdîrehmanê Axtepî*.

3.18. Hozanvanê Kurd

Navê Pirtûkê: Hozanvanê Kurd

Nivîskarê Berhemê: Sadiq Behaedîn Amêdî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1998

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 17 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 465

ISBN: 91 973403 1 6

¹²⁶ Mele Evdilhadî Comanî, *Sêkêşan*, Amd. Zinar, Pencînar, Stockholm, 1998, r. 2.

Sadiq Behaedîn Amêdî di sala 1918an de li Amêdiyê hatiye dinê. Amêdî yek ji nivîskar û folklorzanê kurd e û gelek berhemên girîng berhev kiriye û ji mirinê filitandiyê. Di sala 1982an de li Bexdayê çûye rihma Xwedê. Ev xebata antolojîk ku li Başûrê Kurdistanê hatiye çapkirin ji aliyê Zinar ve hatiye latînzekirin bo istifadeya kurdên li Bakurê Kurdistanê. Xebat lêkolînek e ku li ser jiyana 19 helbestvanên kurmançaxêf hatiye amadekirin û cara ewil di sala 1980an de li Bexdadê 3000 nixwe hatine çapkirin.

3.19. Mamikên Kurdî

Navê Pirtûkê: Mamikên Kurdî

Nivîskarê Berhemê: M. Xalid Sadînî

Amadekar û Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1999

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 130

ISBN: 91 973403 6 7

M. Xalid Sadînî bi dehan salan e ku ji çanda devkî ya kurdî gelek kereste berhev kirine û ev nimûneyên folklorîk wekî pirtûk çap kirine. Yek ji van xebatan jî pirtûka bi navê *Mamikên Kurdî* ye.¹²⁷ Di pirtûkê de 534 mamikên kurdî hene. Her mamikek tiştêkî sergirtî şirove dike. Bersiva wan li gorî reqema rêza mamikan, li paşya pirtûkê hatiye bicihkirin. Pirtûk ji bo zarokan, ji bo xortikan, ji bo mezinan û ji bo her kesî hêjayê xwendin û ramandinê ye.¹²⁸

¹²⁷ Pirtûk nehate peydakirin.

¹²⁸ <http://www.pencinar.se/bocker/bocker2/Nr-22.htm> 22.06.2017

3.20. Rênasî

Navê Pirtûkê: Rênasî

Nivîskarê Berhemê: Xiyasedîn Emre

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1999

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 165

ISBN: 91 973403 5 9

Xiyasedîn Emre pirtûka xwe ya bi navê *Rênasî*¹²⁹ di 1967-68an de bi tîpên erebî, bi kêş, niql û qafiye hatiye nivîsandiye. Tê de 20 beş hene ku her yekê li ser babeteke cuda hatiye nivîsandin. Tevek 684 malik in. Çapa bi tîpên latînî û ya bi tîpên erebî digel êk hatine çapkirin^{»130}

3.21. Rêgeha Perestiniyê

Navê Pirtûkê: Rêgeha Perestiniyê

Nivîskarê Berhemê: Nûrullah Kodişkî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2000

¹²⁹ Ev pirtûk li ba Zinar peyda nebû û me nekarî cihekî dîtir peyda bikin.

¹³⁰ <http://www.pencinar.se/bocker/bocker2/Nr-21.htm> 20.06.2017

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 250

ISBN: 92 973403 9 1

Ev pirtûka Kodişkî temamî li ser îbadeta hecê ye. Ango di derbarê çûyîn û hatina hecê ye. Navê resen ê kitêbê *Elsebailku Kitêb* e. Di her rûpeleke pirtûkê de bi du zimanî agahdariyên derbarê hecê de hene. Di dawiya pirtûkê de kismek helbestên belawela yên Kodişkî cih digirin. Zinar gava ev pirtûk ji bo tîpguhêzî û mîzanpajê hazir kiriye navê wê jî bi kurmancî kiriye *Rêgeha Perestenyê*.¹³¹

3.22. Eqîdeya Îmanê

Navê Pirtûkê: Eqîdeya Îmanê

Nivîskarê Berhemê: Şêx Fethulah Werqanisî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2000

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 40

ISBN: 91 89491 11 4

Di pirtûkê de pêşgotineke heft rûpelî ya Zinar heye. Zinar di pêşgotinê de ji naveroka kitêbê zêdetir qala jiyan, xwendin, malbat, şecere, girîngiya terîqata bav û kalên Şêx Fethulah Werqanisî kiriye. Dû re di pêşgotinê de behsa rêç û terîqeta Siltan

¹³¹ Mele Nurullah Kodişkî, *Rêgeha Perestenyê*, Amd. Zinar, Pencînar, Stockholm, 2000.

Şexmûsê Zûlî kiriye ku çawa bandoreke zexm li seranserê Kurdîstanê hiştiye. Dîsa di pêşgotinê de Zinar, têkiliya tarîqatan wekî Qadirî, Naqşibendî, Rêçika Zûlî, Rêçika Farûqî îzeh kiriye. Gelek kesên navdar jî li ba Şêx Fethulah Werqanisî xwendine û îcazet girtine ku meriv hewceyî bi parvekirina navê wan xwe mesûl dibîne. Hinek jî wan kesan Mele Seîdê Kurdî, Mele Evdirehman Norsî, Hezretî Norşênî ne.

Pirtûk ji du beşan pêk hatiye. Beşa yekem li ser şertên îslamê, ya duyem jî li ser şertên îmanê ye. Şêx Fethulah Werqanisî gava ku hin riknan de hewceyî pê dîtiye şîrove ango rave kiriye hin riknan de jî tenê navê wê rikne nivîsiye û derbas bûye. Di pirtûkê de li hember her rûpeleke latînîzekirî, rûpela resen a destxetê hatiye bicihkirin.¹³²

3.23. El Hemaîlu Fîş‘Şemaîlî

Navê Pirtûkê: El Hemaîlu Fîş‘Şemaîlî

Nivîskarê Berhemê: Şêx Fethullah Werqanisî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2000

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 740

ISBN: 91 89491 06 8

Zinar di pêşgotinê de ji naveroka kitêbê zêdetir qala jiyan, xwendin, malbat, şecere, girîngiya terîqata bav û kalên Şêx Fethulah Werqanisî kiriye.

¹³² Şêx Fethulah Werqanisî, *Eqîdeya Îmanê*, amd. Zinar, Pencînar, Stockholm 2000.

Di pêşgotina pirtûkê de Zinar dibêje ku Şêx Fethulah Werqanisî *El Hemaîlu Fîş‘Şemaîlî* bi şiklekî pexşanî nivîsiye. Dû re Şêx Xalidê neviyê Şêx Fethulah Werqanisî daxwaz ji feqiyê xwe yê bi navê Mele Nûrulah Kodişkî kiriye ku ew vê pirtûka bapîrê xwe, ji pexşanê bike kêşan û bi forma helbestê binivîse. Mele Nûrulah Kodişkî jî di sala 1940î de bi awayê helbestkî ev berhem nivîsiye. Lê dema nivîsîna pirtûkê ya ku Şêx Fethulah Werqanisî bi awayekî pexşanî nivîsiye ne diyar e.¹³³ Mele Nûrulah Kodişkî kitêb kiriye çil û şeş beşan. Hemû sernavên beşan bi erebî ne lê Zinar diyar dike ku wî bi xwe ev sernav ji erebî bo kurmancî wergerandiye. Pirtûk ji mijarên di derbarê avabûna dinyayê bigre, afirandina Hz. Adem, jiyana Resûlê Xwedê (s.x.l), hetanî roja wefata Resûlê Xwedê bi dubeytî û kafiye nivîsiye. Zinar, destxeta resen jî di dawiya pirtûkê de bi cih kiriye.¹³⁴

Çawa ku ji pêşgotina berhemê tê fêmkirin herçiqas navê Werqanisî li ser pirtûka *El Hemaîlu Fîş‘Şemaîlî* be jî helbestên ku di pirtûkê de cih digirin aidê Mele Nûrulah Kodişkî ne lêbelê navê wî wekî nivîskar xuya nake.

3.24. Rîsalet-UI Kufrî W‘el Kebairî

Navê Pirtûkê: Rîsalet-UI Kufrî W‘el Kebairî

Nivîskarê Berhemê: Şêx Fethullah Werqanisî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2000

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 150

¹³³ Şêx Fethulah Werqanisî, *El Hemaîlu Fîş‘Şemaîlî*, amd. Zinar, Pencînar, Stockholm 2000, r.7

¹³⁴ Şêx Fethulah Werqanisî, *El Hemaîlu Fîş‘Şemaîlî*, amd. Zinar, Pencînar, Stockholm 2000.

ISBN: 91 89491 10 6

Şêx Fethullah Werqanîsî (1847-1900) yek ji alim û wêjevanê kurd e. Li Bedlîsê hatiye dinê. Gelek medreseyan Bakurê Kurdistanê geriyaye û xwendiyê. Zinar jî tîpguhêziya xebata wî bi navê *Rîsalet-Ul Kufri W'el Kebairî* bo alfabeya latînî kiriye.¹³⁵ Pirtûk, li ser babetên kufre û gotinên ku pir gunehên mezin hatuye amadekirin. Pirtûk hem kêşan û hem pexşan e, nivîsa bi tîpên erebî digel ya bi tîpên latînî bi hev re hatine weşandin.¹³⁶

3.25. Eqîdeya Ehmedê Xanî

Navê Pirtûkê: Eqîdeya Ehmedê Xanî

Nivîskarê Berhemê: Ehmedê Xanî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2000

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 18 X 24 cm.

Jimara Rûpelan: 54

ISBN: 91 89491 13 0

Berhem ji pêşgotinekê û 73 malikan pêk tê. Di pêşgotinê de derbarê bidestxistana nusexeyên vê berhemê, keda lêkolînerên kurd û yên Ewropê de agahî tên dayîn. Xanî, zarokên kurd yên ku Qûrana Pîroz diqedandin ji bo ku şert û şirûtên dîne îslamê bi zimanê xwe binasin *Eqîdeya Îmanê* helbestkî û bi zimanê kurmancî nivîsiye. Xanî pirtûka xwe çar sal piştî *Nûbihara Biçûkan* di sala 1687an de nivîsiye. “Ev kitêb, di warê ‘ilmeke olî de yekem kitêb e ku kurdî hatiye nivîsîn. Piştî *Eqîdeya*

¹³⁵ Ev pirtûk li ba Zinar peyda nebû û me nekarî cihekî dîtir peyda bikin.

¹³⁶ <http://www.pencinar.se/bocker/bocker2/Nr-25.htm> 02.05.2017

Îmanê hemû berhemên olî yê menzûm tesîreke mezin ji *Eqîdeya Îmanê* girtine.”¹³⁷
Bi vî awayî zarokên kurdan ên ku bi *Nûbihara Bîçûkan* têgeh û peyvên zimanê kurdî nas dikin, bi *Eqîdeya Îmanê* jî ilmên eqîdeyê yê bingehîn dîsa bi zimanê dayikê fêr dibin û dinasin.¹³⁸

3.26. Dîwana Hesbî

Navê Pirtûkê: Dîwana Hesbî

Nivîskarê Berhemê: Şêx Hesîb Axtepî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Doz

Sala Weşanê: 2009

Ciyê Weşanê: Stenbol

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 456

ISBN: 978 9944 227 64 3

Zinar, berhema Şêx Hesîb Axtepî tîpguhêzî kiriye di sala 2008an de ji bo çapê amade kiriye. Hesîb endamekî ekola Axtepiyan e. Ev pirtûk beriya Zinar ji aliye Mela Zeynelabidîn Amedî ve ji ber nusxeya Şêx Eskerî bi tîpên erebî bi navê *Dîwana Hesbî* hatiye amadekirin û çapkirin. Berhema navborî ya ku Zinar tîpguheziya wê kiriye dîsa bi heman navî, lêbelê bi tîpên latînî hatiye çapkirin. Şêx Hesîb Axtepî di 1885an de, li Axtepeya girêdayê bi qeza Çinara Amedê, hatiye dinyayê, di 1947an de jî, li Çinara Amedê çûye ber dilovaniya Xwedê. Zinar dema

¹³⁷ Kadri Yıldırım, *Ehmedî Xanî Fikir Dünyası*, Ağrı Kültür Yardımlaşma Ve Dayanışma Derneği, Stenbol, 2011, r. 33.

¹³⁸ Ehmedê Xanî, *Eqîdeya Îmanê*, amd. Zinar, Pencînar, Stockholm 2001.

pirtûk latînzê kiriye ji bo her navbira helbestekî ji serê helbestê malika pêşîn wekî sernav hildaye û pirtûk li ser 94 beşan dabeş kiriye.¹³⁹

3.27. Keşkol

Navê Pirtûkê: Keşkol

Nivîskarê Berhemê: Şêx Eskerî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Doz

Sala Weşanê: 2009

Ciyê Weşanê: Stenbol

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 272

ISBN: 978 9944 227 63 6

Şêx Eskerî di sala 1898an de li gundê Axtepeyê hatiye dinê. Wekî ku tê zanîn gundê Axtepeyê di edebiyata klasîk a kurdî de qonaxeke xurt pêk aniye. Xwendina xwe ya ewil li ba bavê xwe kiriye, piştî ku bavê wî diçe ber rehma Xwedê, Eskerî li ba kekê xwe Şêx Kerbelayî xwendina xwe domandiye û dû re li medreseya Axtepeyê xwendina xwe kuta kiriye.

Di pirtûkê de pêşgotin û naverokê, 65 beş, 784 malik, sêkokek, 195 çarîne û 17 pêncok hene. Xêncî van tiştan di dawiya pirtûkê de destxeta vê berhemê jî hatiye bicihkirin. Tîpguhêzer Zinar pirtûkê re pêşgotineke şeş rûpelî nivîsiye. Gava ku latînzê kiriye her helbesteke serbixwe bi reqemekê ve diyar kiriye. Di derbarê çawaniya bidesxistina destxetê de û amadekirina beşên kitêbê de Zinar di pêşgotinê de bi berfirehî qal dike. Agahiyên paşxaneyê yên bo vê pirtûkê bo xwendevanan

¹³⁹ Şêx Hesîb Axtepî, *Dîwana Hesbî*, amd. Zinar, Lîs, Diyarbekir 2008.

berçav dike. Em ji pêşgotina pirtûkê fêm dikin ku Zinar bi rêya eqrebayekî Şêx Eskerî yê bi navê Şêx Şafîî ev pirtûk bi dest xistiye. Dîsa di pirtûkê de tê gotin ku ew kesê ku destxeta Keşkolê amade kiriye Zeynelabidîn Amedî ye.

Berhema bi navê Keşkol, ji aliye mijarên xwe ve, ne mîna dîwanekî xwediyê hevgeriyekî ye. Wate, pirtûk ji beşên cûrbicûr ên derbarê mijarên cihêreng de hatiye amade kirin û têkiliyeke rastetrast di navbera beşên pirtûkê de tune ye. Meriv dikare bi çend mînakên ve vê hevokê pişt rast bike. Di beşa 2yan de behsa misilmantiya heqiqî kiriye. Di beşa 49an de behsa kurmamê xwe Fehmî kiriye ku daxwaza hevdîtîne jê kiriye. Dîsa di beşa 57an de jî qala kiteba xwe ya bi navê “Memozîna Ehmedê Xanî” kiriye. Herwiha di pirtûkê de hin helbest hene ku bi farîsî û tirkî hatine nivîsandin. Em ji vê yeke jî fêm dikin ku Eskerî di van zimanan de jî şareza bûye.¹⁴⁰

3.28. Kulîlka Nîsanê

Navê Pirtûkê: Kulîlka Nîsanê

Nivîskarê Berhemê: Şêx Edhem Barzanî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2010

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 14 X 21 cm.

Jimara Rûpelan: 70

ISBN: 91 89491 87 4

¹⁴⁰ Şêx Eskerî Axtepî, *Keşkol*, amd. Zinar, Doz, Stenbol 2008.

Pirtûka bi navê *Kulîlka Nîsanê* pirtûkeke helbestî ye. Şêx Edhem Barzanî di pazdeh saliya xwe de ev helbest nivîsîne. Di sala 1979an de li Bexdayê bi tîpên erebî cara ewil çap dibe. Tê de li ser gelek babetên cihê cihê helbest hene. Pirtûk ji bîst û şeş sernavan pêk tê. Şêx Edhem zêdetir li ser evîna Kurdistanê, êş û azara kurdan, xwezaya Kurdistanê û hwd tişt nivîsîne. Di sala 2010an de jî Zinar rastî Şêx Edhem tê û hev dinasin bi hev nasînê Şêx Edhem gelek belgeyan dide Zinar. Yek ji wan belgeyan jî ev kitêba helbestê ye ku Zinar tîpguhêzî kiriye.¹⁴¹

3.29. Dîwançeya Xakî

Navê Pirtûkê: Dîwançeya Xakî

Nivîskarê Berhemê: Şêx Qutbedîn Korikî

Wergêr: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 12 X 19 cm.

Jimara Rûpelan: 120

ISBN: 91 8491 89 0

Navê orjînal yê kitêbê *Haza Hediyet-ul Îxwan Fî Eqîdet-il Îman* e. Zinar tîpguhêziya kitêbê bi tîpên latînî dike û kitêbê bi navê *Dîwançeya Xakî* ji çapê re hazir dike. Di pirtûkê de nivîsa bi tîpên erebî li aliyê rastê û ya bi tîpên latînî li aliyê çepê hatine bicihkirin. Şêx Qutbedîn di helbestên xwe de nasnavê Xakî bi kar aniye. Di pirtûkê de 402 malikên durêzî, 18 malikên pêncrêzî, 14 rûpel nivîsa destûrnameya medreseya kurdî ya Şêx Qutbedîn, destûrnameya Rêçika Nexşebendî û destûrnameya Delîl-ul Xeyrat di dawîya kitêbê hatine bicihkirin. Ji bo ku ev her sê destûrnameyên

¹⁴¹ Şêx Edhem Barzanî, *Kulîlka Nîsanê*, Pencînar, Stockholm 2010.

Şêx Qutbedîn winda nebin û wekî belgeyên orîjînal bimînin ew jî di vê kitêbê de bi rengê xwe yên eslî hatine tomarkirin.

Zinar di pêşgotinê de bi berfirefî hem qala jiyana Şêx Qutbedîn kiriye û hem jî navên bav û kalên Şêx Qutbedîn bi awayekî kronolojîk hetanî heft bavan vegotiye. Herwiha Korikî dîwana xwe dabeşî du beşan kiriye. Beşa ewil li ser rîknên îmanê, beşa duyem jî li ser rîknê îslamê ye. Digel vê yekê di dîwançeyê de qala mezheb û çar xelîfeyên mezin jî tê kirinê.¹⁴²

3.30. Jinavbirina Barzaniyan

Navê Pirtûkê: Jinavbirina Barzaniyan

Nivîskarê Berhemê: Siyamend Sêlekî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2011

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 130

ISBN: 91 89491 88 2

Pirtûka bi navê *Jinavbirina Barzaniyan* gelemperî qala komkujiya merivên herêma Barzan dike. Di bergeha pirtûkê de wêneya belgenameya fermana Barzaniyan heye. Di kitêbê de naverokê, kurtejiyana nivîskar û du pêşgotin hene. Ji van her du pêşgotinan yek ya tîpguhêzer Zinar e, ya din jî ya nivîskarê vê pirtûkê Siyamend Sêlekî ye. Sêlekî, kitêba xwe bi tîpên erebî bi devoka kurmanciya behdînî di sala 2007an de li Hewlêrê weşandiye. Navê kitêbê yê orîjînal “Ji Çiyayê Şêrînê

¹⁴² Şêx Qutbedîn Korikî, *Dîwançeya Xakî*, Pencînar, Stockholm 2011.

Heta Yabanê Mirinê” ye. Lê paşê lêkolîner Zinar li ser daxwaza Sêlekî hin babet, wêne û dokumanên din jî lê zêde dike. A herî muhîm jî lêkolîner Zinar li ser xwesteka Sêlekî navê pirtûkê dike “*Jinavbirina Barzaniyan*”.

Zinar di pêşgotinê de bi hûrgulî qala jiyana Sêlekî, zîldayina şoreşvaniya Sêlekî dike û pey re jî hêviya xwe tîne ziman ku gelê kurd xasma jî zarokên kurd ji vê kitêbê hin şîret û dersan bigirin. Pirtûk ji du beşan pêk tê. Beşa yekem hetanî rûpela şêstî kurdên herêma barzan bi awayekî sosyolojîk, çandî, erdnîgarî, olî û siyasî tehlîl kiriye. Ji şêstî şûn de êdî pirtûk dikeve nav meseleya komkujiya barzaniyan û paşxaneyê karesatê. Beşa duyem jî bi belge û wêneyên ku derbarê qirkirina barzaniyan de ye.

Kitêb piştî serhildanên têkçûyî ya kurdan, zilma ku li ser barzaniyan hatiye kirin ji xwe re kiriye babet û ew kesên ku hatine kuştin, awayê kuştina wan êş û azara wan bi kitekit hatiye vegotin. Pirtûk bi dokument û bibîrxistina karesatê ve dikare di bîra civakî de cihê vê bûyerê qehîm bike û wê nede jibîrkin.¹⁴³

3.31. Yûsuf û Zuleyxa / Gulzarîcan

Navê Pirtûkê: Yûsuf û Zuleyxa / Gulzarîcan

Nivîskarê Berhemê: Mele Arifê Dêrişî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2014

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 21 X 30

Jimara Rûpelan: 130

¹⁴³ Siyamend Selekî, *Jinavbirina Barzaniyan*, Pencînar, Stockholm 2011.

ISBN: 91 89491 96 3

Pîrtûka li ber destê me li ser meseleya Hz. Yûsif e. Zinar di pêşgotinê de behsa kurtejiyana Mele Arifê Dêrişî, destxetên wê yên cuda cuda û bidestxistana maceraya vê pirtûkê kiriye. Di vê pirtûkê de 1.127 malik û yazdeh beş hene û her beşek li ser serpêhatiyên Hz. Yûsif radiweste. Di hin rûpelan de Zinar di binê rûpelan de hin têbînî nivîsîne ango lê zêde kirine. Yanî hinek peyvên xerîb rave kiriye. Nivîsa bi tîpên erebî jî di pirtûkê de heye.¹⁴⁴

3.32. Serpêhatiya Îsa Pêxember

Navê Pirtûkê: Serpêhatiya Îsa Pêxember

Nivîskarê Berhemê: Mele Arifê Dêrişî

Tîpguhêzî: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2014

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 21 X 30

Jimara Rûpelan: 130

ISBN: 91 89491 95 5

Pirtûk qala serpêhatiya Îsa Pêxember kiriye. Mele Arif Dêrişî kitêbê bi helbestkî, kêş û kafiye ji roja ku Îsa Pêxember ketiyê zikê diya xwe bigre ji her meselokên ku li ser Îsa Pêxember têne gotin, mucîzeyên wî, rêwîtiya Şamê, daketina sifra xwarinê ji asîmanan, gengeşiya di navbera wî cihûyan de û hwd nivîsiye. Pirtûk ji deh beşan pêk tê. Zinar jî ji vê pirtûkê re pêşgotineke fireh nivîsiye. Di pêşgotinê de Zinar ev mesele bi sûret û ayetên Qurana pîroz piştrast kiriye. Ferqa hin

¹⁴⁴ Mele Arif Dêrişî, *Gulzarîcan/Yûsuf û Zuleyxa*, Pencînar, Stockholm 2014.

meseleyên Îsa Pêxember bi sê dîn û kitêbên heq berawird kiriye. Zinar dibêje ku Mele Arif ev kitaba xwe di sala 1969an de nivîsiye. Lê nisxeya li ber destê Zinar aidê sala 2002an ya Zeynelabidîn Amedî ye. Di hin rûpelan de Zinar peyvên ku nehatibin fêmkirin di binê rûpelê de wekî têbînî rave kiriye.¹⁴⁵

¹⁴⁵ Mele Arif Dêrişî, *Serpêhatiya Îsa Pêxemberî*, Pencînar, Stockholm 2014.

BEŞA ÇAREM

4. Pirtûkên Telîf û Wergerê

Ev beşa bi navê “pirtûkên telîf û wergerê” ji du paran pêk tê. Para ewil pirtûkên telîf yê nivîskar ku zafê wan derheqê serpêhatî, lêkolîn û adaptosyona çîrokên folklorîk e. Para duyem jî pirtûkên ku nivîskar wergerandiye bi kurtasî dide nasîn.

Pirtûkên Telîf

Ev beş ji pirtûkên telîf pêk tê. Li gor danasînê ev berhemên ku di vir de ne ji pirtûkên beşên din zêdetir hatine nasîn. Dema em naveroka vê beşê dinêrin tê de pirtûkeke bi zimanê tirkî jî heye. Ev pirtûk jî li ser îşkencedîtina Zinarî ye ku di salên 1980-83an de ji aliyê cunta leşkerî ya Tirkîyeyê ve lê hatiye kirin. Di vê beşê de pir cure nivîs hene. Ji folklorê bigire, bawerî, çîrok, biyografiya şexsiyetên mezin, heta nivîsên ku li ser tora civakî ya medyayê û hwd.

4.1.1. Îşkencede 178 Gün

Navê Pirtûkê: Îşkencede 178 Gün

Nivîskarê Pirtûkê: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Komkar/Tyskland

Sala Weşanê: 1987

Ciyê Weşanê: Köln

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 240

ISBN: Nehat dîtin

Pirtûka bi navê *Îşkencede 178 Gün* ji serboriyên îşkenceyan pêk tê. Zinar îşkenceyên di navbera salên 1980-83an de ji aliyê cuntaya eskerî ya Tirkîyeyê ve ku li ser wî hatiye kirin libo libo ji serî heyanî binî vedibêje. Di navbera van her sê salan de bi tevahî 178 roj îşkence dîtîye. Zinar pirtûkê kiriye heşt beş. Di binê hine beşan de jî binbeş vekiriye.

Gava meriv kitêbê dinêre ji destpêka roja îşkenceyê û heta dawiya pirtûkê wekî kronolojî dema bûyeran, mahkemeyan û axaftinan hwd yek bi yek nivîsiye. Di pirtûkê de nivîskar çend cureyên îşkenceyan hebin hemû hatine ravekirin. Bi zimanê tirkî nivîsiye. Jixwe tenê ev pirtûk bi tirkî nivîsiye wekî din pirtûkê wî yên bi zimanê tirkî tune ne.¹⁴⁶

4.1.2. Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî

Navê Pirtûkê: Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî

Nivîskarê Berhemê: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxwane: Pencînar

Sala Weşanê: 1991

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 378

ISBN: 91 830 0622 7

Ev pirtûka Zinar li gor terza xwe kitêbeke antolojîyê ye. Di bergê pêşîn ê pirtûkê de bi neh zimanên biyanî navê pirtûkê hatiye nivîsin. Pirtûk ji naverokê û pêşgotineke çar rûpelî hatiye pê. Pirtûk li ser du beşan hatiye sazkirin. Beşa Kurmancî û Beşa Dimilî (Zazakî). Di pirtûkê de tevahî heftê nivîskar û helbestvan hene. Zinar di beşa zazakî de şeş kes daye nasîn. Lê beşa kurmancî giran û fireh e. Beşa kurmancî di nav xwe de dibe sê pişk. Zinar her sê binbeşên beşa kurmanciyê jî li gor naverok û terza wan ji hev kiriye. Her sê binbeşan sernavên wekî A, B, C hazir kiriye. Li gor senifandina Zinar binbeşa Ayê li ser nivîskar û helbestvanên kevn çêkiriye. Binbeşa Byê li ser nivîskar û helbestvanên dindar û ên ku pesnê şêxan didin hatiye amadekirin. Binbeşa dawî jî wekî Cyê jî helbest û bêjokeyên efare ne. Ango helbestên belawela ne ku ji aliye derwêşan ve di derbarê Mihemed Pêxember de û

¹⁴⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Îşkencede 178 Gün (178 Roj Di Îşkencê De)*, Tyskland, Köln 1987.

hwd hatine gotin. Di pîrtûkê de xebat, taybetî, berhem û jiyana heftê nivîskar, helbestvan û alimên kurd hatiye nivîsîn. Ji nav wan ên wekî Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Mele Xelîlê Sêrtî, Siyapoş, Mala Axtepiyan, Celadet Elî Bedirxan, Mûsa Enter, Seyid Eliyê Findikî hene. Gava ku Zinar jiyana nivîskaran dirêse ji kîjan pirtûkê îstifade kiribe, bi navê nivîskar û pirtûka wî li wir dinivîse. Piştî jiyana nivîskar eger ku hebe yan dîwan an jî ji nav helbestên wî kesî wekî nimûne çend beyt û malikan kiriye dawiya wê rûpelê. Lê divê em bibîr bixin ku ew bend û malikên ku di kitêbê de dane, navdartirîn helbest û beytên wî nivîskarî ne. Wexta ku em ew nimûneyên helbestan dinêrin dibînin ku Zinar berê destpêka helbestan derbarê teknîka wan de agahî daye. Zinar, di kitêba xwe de rêbaza kronolojiyê bikar aniyê yanî nivîskaran li gor tarîxa jidayikbûna wan hilgirtiye. Mînak di beşa kurmancî de ya binbeşa A'yê de ji Elî Herîrî dest pê kiriye hetanî Firat Cewerî hatiye. Lê dîsa em qala taybetiya vegotina pirtûka Zinar bikin; mesela di hin nasandina kes û berheman de tiştekî din heye ku Zinar hin agahiyan de nakokî çêbûne van nakokiyan li ber xwendevanan bi çavkanî nîşan daye.¹⁴⁷

4.1.3. Balafira Jînê

Navê Pirtûkê: Balafira Jînê

Nivîskarê Pirtûkê: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1993

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 134

ISBN: 91 972090 3 1

¹⁴⁷ Zeynelabidîn Zinar, *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Pencînar, Stockholm 1991.

Ev berhem çavkaniya xwe ji çîroka folklorîk a kurdî ya bi navê “Kerkerokê Bayê” hildaye. Nivîskar hin bûyerên sereke yên “Kerkeroka Bayê” istifade kiriye û çîroksaziyeke bi temamî cuda afirandiye.¹⁴⁸ Gava ku em destpêka çîrokê dinêrin, Zeynelabidîn Zinar bi teswîrên kitekit qala xwezaya ew mekanê ku parçeya çîrokê lê derbas dibe kiriye. Piştî şayesandina wê xwezayê Zinar xwe berdide nava çîrok. Di çîrokê de kesekî bi navê Baroz Paşa ji bo kurê xwe yê bi navê Gurgîn balefireke ji daran çêdike û macerayên bi vî rengî yên sêrê hatiye vegotin.

4.1.4. Xwendina Medresê

Navê Pirtûkê: Xwendina Medresê

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1993

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 102

ISBN: 91 8949192 0

Pirtûka bi navê *Xwendina Medresê* yek ji pirtûkên lêkolînî yên Zeynelabidîn Zinar e. Zinar kitab li ser du beşan saz kiriye. Ji vê pirtûkê re wekî pêşgotinekê bi navê “Xwendina Medresê Çi Bû?” nivîseke destpêkê nivîsiye. Di vê nivîsê de gelemperî qala rewşa medreseyan berê kiriye. Dîsa di vir de behsa berxwedana gelê kurd kiriye ku li hember zordestiya rejîma kemalîstan, bi ol, bawerî û çanda xwe ya dewlemend ve bi çî şiklî hewl daye. Zinar, armanca nivîsîna vê pirtûkê di dawiya vê

¹⁴⁸ Ev çîrok di heman demê de ji aliyê Zinar ve hatiye berhevkerin û di *Xwençe VIIan* de di navbera rûpelên 245-260an de hatiye weşandin. Herwiha heman çîrok bi navê *Kerkeroka Bayê* (2005) wekî pirtûka zarokan hatiye adaptekirin. Ev çîroka dirêj a kurdî bi navên cuda li herêmên cuda belav bûye. Herî dawî ev çîrok ji aliyê Dilêr Serhed ve hate berhevkerin, bnr. Dilêr Serhed, *Teyara Textik*, weş. Lîs, Diyarbakir, 2018.

nivîsê de wiha nivîsiye: “Ez bi vê pirtûka xwe, ne bi awayê lêkolîn, lê tenê bi rewşa ku min bi çavên xwe dîtiye hewl didim. Her çiqas bi kurtî û kêmasî ye jî rewşa xwendina medreseyan û feqîtiyê bi xwendevanên nûjen bidim zanîn û wan hinekî bi wê sazgehê agahdar bikim.”¹⁴⁹

Beşa duyem jî tenê li ser mijarekê ye ku navê wê jî “pirtûkên xwendinê” ne. Di vê beşê de jî Zinar, ji destpêka xwendinê û hetanî dawiya xwendinê di medreseyê de gelemperî çî pirtûk hebin yekoyek daye nasîn. Lê divê em li vir bibêjin ku Zinar tenê navê 89 pirtûkan di vê berhema xwe de nivîsiye. Zinar dibêje ku yên ku meşhûr û têne bîra min ev in. Di vê beşê de jî zêdetir bi awayekî berfireh behsa çend kitêbên ku destpêka medreseyê de têne xwendin kiriye. Ew kitêb jî *Elbêtk*, *Qurana pîroz*, *Mewlûda Kurmancî*, *Nûbihar*, *Nehc-ul Enam*, *Eqîdeya Ehmedê Xanî* ne.

Xwendina Medresê, ji ber girîngî û reseniya xwe ku rasterast nivîskar jî ji pêvajoya medreseye re derbas bûye wekî xebateke li ser mifredata medreseyên kurdî bûye çavkanî bo pirtûkên li ser kurdî û xebatên kurdnasiyê. Herwiha kurteyeke dirêj ya vê pirtûkê ji aliyê Martin van Bruinessen ve bi sernavê *Medrese education in northern Kurdistan*¹⁵⁰ (Xwendina Medreseyê li Bakurê Kurdistanê) bo zimanê îngilîzî hatiye wergerandin û ev pirtûk di gelek berhemên îngilîzî de hatiye behskirin.

4.1.5. Kadîna Mişkan

Navê Pirtûkê: Kadîna Mişkan

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1993

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 16 X 20 cm.

¹⁴⁹ Zeynelabidîn Zinar, *Xwendina Medreseyê*, Pencînar, Stockholm, 1993, r.18.

¹⁵⁰ Zeynelabidîn Zinar “Medrese education in northern Kurdistan”, ji aliyê Martin van Bruinessen ve hatiye wergerandin û şîrovekirin *Les Annales de l’Autre Islam* 5 (1998).

Jimara Rûpelan: 144

ISBN: 91 972090 0 7

Kadîna Mişkan, di eslê xwe de ji pirtûka *Abidê Şikeftê* (2003) hatiye wergirtin. Ango bingeha wê çîroka Abidê Şikeftê ye¹⁵¹. Zinar formeke nû daye vê çîrokê û wekî pirtûkeke telîf çap kiriye. Zinar di vê pirtûkê de navê şexsan guhertiye lê honaka bingehîn ya çîrokê ji *Abidê Şikeftê* hildaye. Kitêb kiriye heft beşan lê beşên wê ne ji hev qetyayî ne.

Pirtûk bi kurtasî wiha ye: Paşayek bi navê Kurzad hebûye. Bîst û yek lawên wî hebûne. Navê lawê wî yê herî biçûk Rêzan bûye. Gava ku Rêzan tê wextê zewacê çîrok zêdetir bi çoš û eş dibe. Welatî pir dixwazin kurê paşayê biçûk bizewice û bigê mirada xwe. Çimkî Rêzan kesekî jîr û jêhatî, tije fehm û hezkiriyê gelê xwe bûye ku welatî xwestine Rêzan bizewice da ku jiyanêke aram bijî. Gava ku Kurzad Paşa jê re keçika paşayê Tengavistanê ya bi navê Şîlanê dibîne û dawetan wan dike. Wextê dawetvan siwarkirina bûkê de bûka xwe hildidin tên di veşerê de li baxçeyekî dihêwirin. Êdî ji vê şûnde çîrok dikeve rewşeke din serpêhatî li ser serpêhatiyan yê Rêzan bê navber dest pê dikin. Marê mezin ê bi navê Ziya nahêle eşîra Rêzan ji wê baxçeyê derkevin da ku hetanî Rêzan daxwazî marî bîne cih. Bi daxwaza Ziya Rêzan dikeve rêwitiyeke wisa ku her car ji qonaxekî din dikeve qonaxekî, ji bajarekî din dikeve bajarekî din û hwd. Di dawiyê de Rêzan bi feraset û hûnera xwe hemû karan pêk tîne û digêhê armanca xwe.¹⁵²

4.1.6. Çarmix

Navê Pirtûkê: Çarmix

Nivîskarê Pirtûkê: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1996

Ciyê Weşanê: Stockholm

¹⁵¹ Di heman demê de ev çîrok bi navê Abidê Şikeftê di Xwençe VIIan de cih digire. Bnr. Zinar, *Xwençe VII*, r. 188-214.

¹⁵² Zeynelabidîn Zinar, *Kadîna Mişkan*, Pencînar, Stockholm, 1993.

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 70

ISBN: 91 972779 1 6

Çarmix yekem pirtûka helbestî ya Zinar e. Di bergê pêşîn ê pirtûkê de wêneyê kesekî tazî heye wekî ku çarmixekê xistibin û îşkence lê kiribin. Di bergê paşîn de jî helbestek hatiye bicihkirin. *Çarmix* ji dozdeh helbestan pêk tê. Tê de hem helbestên bi kêş û serwa hem jî yên serbest hene. Mijarên helbestên vê pirtûkê zêdetir li ser babetên eşqa welêt, sirgûn, ziman, netewe, rojên îşkenceyan e.

4.1.7. Fermana 33 Rewşwebîran

Navê Pirtûkê: Fermana 33 Rewşwebîran

Amedekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2000

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 167

ISBN: 91 89491 05

Ev pirtûka bi navê *Fermana 33 Rewşwebîran* pirtûkeke li ser siyasî-lêkolîniyê ye. Di pirtûkê de pêşgotineke Zeynelabidîn Zinar heye. Di sala 1998an de serokê PKKê Abdullah Öcalan, hatiye Romaya paytexta Îtalyayê û mafê rûniştinê ji hikûmeta Îtalyayê xwestiye. Di wê wextê de jî Tirkiyeyê zor daye hikûmeta Îtalyayê da ku Öcalan teslîm bikin. Kurdên gelek deveran xasma yên li Ewropayê ji bo mafê penaberiyê bidine Öcalan pir deng derxistine û çalakî amade kirine. Yek ji wan jî komeleya nivîskarên kurd a Swedê bûye ku ji bo Öcalan bi name daxwaza penabertiyê ji hikûmeta Îtalyayê kiriye.

Di wê pêvajoya mafhildan û hilnedana penabertiyê de, şevekê Öcalan derketiye kanala Med TVê çêr û dijûn bi hin kes û koman kiriye û heqerat li wan barandiye. Li ser vê meseleyê nivîskarên kurd ên ku li Swedê dijîn, nerazîbûnên xwe li hemberî Öcalan bi nameyekê nîşan dane.¹⁵³

Piştî vê bûyerê ji aliyê Med TV û rojnameya *Özgür Politakayê* ve êrîş anîne ser wan sî û sê rewşenbîran. Zinar kitêba xwe wiha amade kiriye; pêşî destpêka meseleyê vegotiye, dû re ew pênc kesên ku di rojnameya *Özgür Politakayê* de li dijê wan sî û sê rewşenbîran de nivîsîn yek bi yek wergerandiye kurmançî û metnên wan yên orjînal jî di kitêbê de bi cih kiriye. Nivîskar wan nivîsên ku di *Özgür Politakayê* de derçûne di kitêba xwe de navnîşana wan a înternetê jî daye. Ew pênc kesên ku di rojnameya *Özgür Politakayê* de nivîsîne; Yaşar Kaya, Selîm Ferat, Sebrî Agir, Siraç Bilgin, Zeynel Abidin in.

Di vê pirtûkê de agahiyeke bi vî rengî jî heye ku piştî wextekê, nivîskarên kurd ên li Swedê dijîn nameyek bi îmzeya bîst û pênc kesan, li hemberî wan sî û sê rewşenbîran bi sernavê “Însanların haykırışlarına kulak verin” û bi tercûmeya wê ya îngilîzî ji serokwezîrê Îtalyayê Massîmo D’Alema re şandine da ku statûya siyasî bidin serokê PKKê.

Dû re berî çapkirina vê pirtûkê Zeynelabidîn Zinar ji çend rewşenbîrên bêalî xwestiye ku li ser vê meseleyê kurtenivîsek jî hazir bikin û ji wî re bişînin da ku mijar zelaltir bibe. Kesên ku kurtenivîs amade kirine; Malmîsanij, Hesênê Metê, Saîd Aydoğmuş, Mûrad Ciwan, Mustafa Aydoğan in. Zeynelabidîn Zinar van pênc kurtenivîsan jî di pirtûkê de bi cih kiriye. Piştî van kurtenivîsan êdî Zeynelabidîn Zinar dest bi bersivdayina wan nameyan kiriye ku sî û sê rewşenbîran xayîn îlan kiribûn. Paşê jî bi sernavê “Sosreta Fermana 33 Rewşenbîran”ê ve meseleyê cardin ber çavan re derbas kiriye û sedema nivîsandina vê pirtûkê xal bi xal nivîsiye. Di dawiya kitêbê de jî nivîsek bi navê “Nivîsek ji Merivatiyê re” heye ku gilî û gazinan

¹⁵³ Kesên ku name îmza kirine ev in: Abdulbasid Seyda, Abdurrehman Zengene Abdurrahmanê Gundikî, Aram Gernas, Arif Zêrevan, Burhan Yasîn, Cemşîd Heyderî, Hesênê Metê, Helim Can, Hüsamettin Aslan, Laleş Qaso, Lezgîn Salih, Lokman Polat, Malmîsanij, Mahmûd Lewendî, Mihemed Dehsîwar, Mûrad Ciwan, Mûmtaz Aydın, Mustafa Aydoğan, Nedîm Dağdeviren, Pişko Necmedîn, Remzî Kerîm, Saîd Aydoğmuş, Segvan Abdülhekim, Serdar Roşen, Sidqî Hirorî, Sidîq Bozaslan, Süleyman Demir, Temûrê Xelîl, Zeynelabidîn Zinar, Zinar Soran.

ji raya giştî û siyasetmedarên kurd re kiriye da ku bêwicedanî nekin û meseleyan bi awayekî dirûst binirxînin.¹⁵⁴

4.1.8. Bingeha Çîroka Kurdî

Navê Pirtûkê: Bingeha Çîroka Kurdî

Nivîskarê Berhemê: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2000

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 134

ISBN: 91 89491 12 2

Pirtûka bi navê *Bingeha Çîroka Kurdî* pirtûkeke di derbarê folklorê de ye. Ango xebateke lêkolînî ye ku derheqê hîmên çîroka kurdî de. Di agahdariyê de Zinar behsa serpêhatiya destpêk û nivîsandina vê pirtûkê kiriye. Cara ewil wekî nivîsarekê di sala 1996an de li kovarekê weşandiye lê bi awayê kurt û ne berfireh. Piştî wextan nivîsar firehtir dike û di sala 2000î de wekî kitêb çap dike. Di 2003an de dîsa hewceyî hin mijarên din dibîne û li pirtûkê zêde dike heman sal çapa duyem derdixe. Zinar bi xwe diyar kiriye ku çavkaniya vê pirtûkê her deh *Xwençe* ne. Jixwe Nivîskarê pirtûkê ji hêla berhevkeriyê ve bi tecrûbe ye. Bi van tecrûbe û xwendinên dû û dirêj hin xebatên bi vî rengî li nivîskar didin peydakirin. Ew jî çiqas mijar û motîfên muhîm yên çîroka kurdî hebe dinivîse da ku hîm û esasên çand û folklorê kurdî raxe li ber çavan. Di vê kitêbê de Zinar qala 133 mijarên cihêreng kiriye. Li ser her mijarekê axiviye, taybetiya mijarê di cihê çîrokê de çibe daye. Divê em bi mînaekeke biçûk vê pirtûkê biqedin.

¹⁵⁴ Zeynelabidîn Zinar, *Fermana 33 Rewşenbîran*, Pencînar, Stockholm 2000.

Di pirtûkê de wiha behsa gustilê dike. “Gustîl: Ji bo lehengê çîrokê, bûjeneke pir nirxdar û bikêrhatî ye. Çi dema ku leheng dikeve tengasiyan, gustîla di tiliya xwe de badide, pêre pêre du efrît li ber wî hazir dibin û çî tiştê ku ew bixwaze, mîna daxwaza wî çêdikin.”¹⁵⁵

4.1.9. Bawermendî -I-

Navê Pirtûkê: Bawermendî -I-

Nivîskarê Berhemê: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2002

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 26

ISBN: 91 89491 46 7

Zinar pêşgotineke kurt ji vê kitêbê re amade kiriye. Dîsa di pêşgotinê de Zinar êşkere kiriye ku ji bo amadekirina vê pirtûkê xwe spartiyê du berhemên klasîk ên kurdî. Navê wan her du pirtûkan jî *Eqîdeya Îman* û *Eqîdeya Îslamê* ya Ehmedê Xanî, *Eqîdeya Îmanê* ya Şêx Fethullah Werqanisî ye. Yanî fêrkirin û rêbazên ilmî li gor qaîdeyên her du kitêbên navborî hatiye hazir kirin.

Piştî pêşgotinê Zinar qala dema hatina dîne îslamê û bingeha dîne îslamê kiriye. Zinar dibêje ku bingeha ola misilmantiyê li ser du esasa ne. Ew jî dîn û îman in. Zinar, pêşî her pênc şertên îslamê vegotiyê. Dû re van her pênc şertên îslamê bi awayekî hêsan yekoyek şîrove kiriye. Paşê heman şiklî ji bo şertên îmanê jî hazir kiriye. Ji hevok û şewaza nivîskar xuya ye ku kitêb ji bo zarok û ciwanên navbera 6-12 salî re amade kiriye. Zinar di dawiya bergê pirtûkê de jî bi hevokêkî hişyariyek li

¹⁵⁵ Zeynelabidîn Zinar, *Bingeha Çîroka Kurdî*, Pencînar, Stockholm 2000, r.71.

ciwanên kurd kiriye ku dibêje eger hûn bi zimanê xwe ola xwe hîn bibin dê hûn ê serkeftî bin. Na eger ku hûn dînê xwe bi zimanê fêr nebin dê hûn ê belengaz û hejar bin.¹⁵⁶

4.1.10. Bawermendî -II-

Navê Pirtûkê: Bawermendî -II-

Nivîskarê Berhemê: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2003

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 43

ISBN: 91 89491 47 5

Pirtûka bi navê *Bawermendî II* ne berdewama *Bawermendî Iê* ye. Meriv dikare bibêje ku *Bawermendî II* halê berfireh ya *Bawermendî I* ê ye. Heman terz û şikl di vê kitêbê de jî heye. Di pêşgotina *Bawermendî II* de Zinar qala çar kitêbên klasîk ên kurdî kiriye ku îlham û çavkaniyên xwe ji van pirtûkan girtiye. Nivîskar Zinar di destpêka pirtûkê de bi berfirefî qala bawermendiyê û olên asîmanî kiriye. Her du kitêb jî li ser mijarên şertên Îslam û Îmanê rawestiyane. Eger bi awayekî gelemperî meriv qala *Bawermendî II* bike dê behsa berfirehkirina mijaran bike. Ango di beşa şertên îslamê de qala şertê ewil; bêjeya tewhîdê hatiye kirin dû re sifetên Xwedê jî di dawiyê de nivîsiye. Dîsa di beşa şertên Îmanê ya ruknên baweriya milyaketên Xweda de dibînin ku her erkên milyaketekî li gor *Bawermendî I* bi

¹⁵⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Bawermendî -I-*, Pencînar, Stockholm 2002.

ketekit hatiye nivîsîn. Dawiya dawî ji naverok û hevokên kitêbê xuya ye ku *Bawermendî II* li gorî *Bawermendî I*ê ji bo xwînerên asteke bilind hatiye nivîsîn.¹⁵⁷

4.1.11. Kurdistana Xwedê jî Şewitî

Navê Pirtûkê: Kurdistana Xwedê jî Şewitî

Amadekar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2003

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 25 cm.

Jimara Rûpelan: 120

ISBN: 91 89491 49 1

Pirtûka bi navê *Kurdistana Xwedê jî Şewitî* pirtûkeke cerîbînî ye. Zinar di pirtûkê de bal kişandiyê li ser weranbûn û talankirina xwezaya Kurdistanê. Lê vê meseleyê hin caran bi awayê çîrokane hin caran jî bi awayê lêkolînî raxistiye pêş xwendevanên kurd. Zinar di destpêka pirtûkê de gelek cureyên gihayên Kurdistanê bi navê wan ên kurmançî digel taybetî û feydeyên wan pesnên wan daye. Dû re jî Nivîskarê pirtûkê xwîneran bi carakê de dibe hezar sal berê. Navê gelek kesên wekî qral, mîr, key, şah û hwd bilêv dike da ku ew jî şahidê talana axa Kurdistanê bûne. Paşê jî li Kurdistanê çiqas navên heywan û gihayan hebin hemûyan nivîsiye û her hevokekê de jî lêkera şewitînî bikaraniye. Piştî vê jî şewitîna xaka Kurdistanê bi çîrokekê didomîne. Zinar di vê beşê de heywanên daristanê daye axaftin û ev rewşa sosret, ecêb, trajîk bi devê wan xwîneran pê hayedar kiriye. Di vê çîrokê de leşkerên xezebê hene ku Kurdistana Xwedê dişewitînin, ajalên daristanê jî nerazîbûn û protestoyên xwe nîşan didin. Lê axir Kurdistanê dişewitînin, talan û bela wela dikin. Di dawiya pirtûkê de jî Zinar hin agahî û statîstîkên di derbarê gundên ku ji aliyê

¹⁵⁷ Zeynelabidîn Zinar, *Bawermendî –II–*, Pencînar, Stockholm 2003.

dewlata tirk ve hatine şewitandin dide. Li gor agahiyan 5000 hezar gundên Kurdistanê hatine şewitandin lê Zinar li vir tenê navê 900 gundî li gorî parêzgehan nivîsiye.¹⁵⁸

4.1.12. Di Çanda Kurdî De 37 Şaxên Zanistiyê

Navê Pirtûkê: Di Çanda Kurdî De 37 Şaxên Zanistiyê

Nivîskarê Berhemê: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2009

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 220

ISBN: 91 89491 82 3

Di destpêkê de pêşgotinek, lîsteya naverokê û ji aliyê weşanxaneyê ve jî kurtejiyana nivîskar hene. Bi vî şiklî nivîsar ango şaxên zanistiyê wekî nivîsar yek bi yek li hevdu teqîp kirine. Di dawiya pirtûkê de jî paragrafek heye ku Zinar giringiya çand, folklor û zimên destnîşan kiriye.

Wekî ji navê kitêbê jî diyar e ku Zeynelabidîn Zinar qala sih û heft şaxên zanistiyê kiriye. Gava ku em van sih û heft şaxan dinêrin dibînin ku mijar zêdetir li bin pênc siwanên mezin hêwirîne. Em ê ji nav wan sih û heft nivîsaran jê qala pênc nivîsaran bikin.

Nivîsara ku em ê kurteya wê vebêjin di rêza pirtûkê de bi nimreya duyem bi navê saziyên parastina zimanê kurdî ye. Di vê nivîsarê de mebest jê ew e ku çar sazî

¹⁵⁸ Zeynelabidîn Zinar, *Kurdistana Xwedê ji Şewitî*, Pencînar, Stockholm 2003.

û dezgehên kurdan hene ku zimanê kurdî ji rûxandin û komkujiyê rizgar kirine. Zeynelabidîn Zinar navê çar saziyan wiha ristiye:

- 1- Medreseya Kurdî
- 2- Rêçika Şêxantiyê
- 3- Sazûmana Axatiyê
- 4- Dibistina Zindî

Li gor Zinar ev çar sazî zimanê kurdî ji gelek tade, zilm, zordariyê û hwd parastine û heyanî vê rojê anîne.

Nivîsareke din jî ku em ê behsê bikin di rêza pirtûkê de bi nimreya çardehan bi navê “Girîngiya Yekbûna Alfabeyê” ye. Mijara vê nivîsarê jî li ser alfabeya latînî ya kurdî ye. Zinar dibêje ku kurd divê alfabeyeke hevpar û yekgirtî bikarbînin. Ev alfabe jî teqez alfabeya latînî ye. Dîsa diyar kiriye ku ji alfabeya erebî zêdetir alfabeya latînî nêzî fonetîka kurdan e.

Nivîsara bi navê “Çêkirina Filman Ji Naveroka Çîrok û Destanên Folklorî” nivîsarek heye. Zinar di vê nivîsara xwe de balê kişandiye ser çîrokên kurdî ku tê de malzemeyên ji bo filmên karton pir in. Zêdetir jî çîrokên rawilan li gor van filman in. Zinar dibêje ku eger niha ve dest biavêjin karên bi vî rengî, dê di pêşerojê de bo kurdan bibe çavkaniyeke xurt.

Di nivîsara bi navê “Klasîkên Kurdî û Bingeha Wan” de Zeynelabidîn Zinar îdîa dike ku milletên pêşketî yê dinyayê bi saya du tiştan pêş de ketine ku ew jî folklor û klasîk in. Qala hewcedariya klasîkan kiriye ku ev klasîk jî bingeha xwe ji toreya kurdî ango folklorê kurdî digirin. Herwiha Zinar dibêje eger xort û ciwan klasîkên xwe nezanibin û nexwînin ji bo mala kurdî nikarin kevirek daynin ser kevirekî.

4.1.13. Zerdeşt Pêxember

Navê Pirtûkê: Zerdeşt Pêxember

Nivîskarê Berhemê: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2007

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 66

ISBN: 91 89491 81 5

Pirtûka *Zerdeşt Pêxember* pirtûkeke lêkolînî ye. Zinar di vê pirtûkê de hemû alî û taybetiyên Zerdeşt Pêxember û dînê ku jê re dibêje Bahdîn, vedikole. Pirtûk tevahî ji bîst û yek sernavan ango bîst û yek mijarên curbecur pêk hatiye. Di pirtûkê de gelek mijarên balkêş û cuda hene. Navên çend mijarên ji pirtûkê wiha ne: Malbata Zerdeşt Pêxember, Hatina Wehyê Ji Zerdeşt Pêxember Re, Ola Zerdeşt Pêxember: Bahdîn, Di Ola Bahdînê De Şeş Ayîniyên Olî. Wexta em jêgirtin û çavkaniyên vê pirtûkê dinêrin tu çavkaniyên vê pirtûkê nîn in.¹⁵⁹ Lewma meriv dikare bibêje ku pirtûk di qada xwe de ne pirtûkeke zanistî û qanihker nîne.

4.1.14. Jînewariya Derwêşê Sado

Navê Pirtûkê: Jînewariya Derwêşê Sado

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2010

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 14 X 21 cm.

Jimara Rûpelan: 228

¹⁵⁹ Zeynelabidîn Zinar, *Zerdeşt Pêxember*, Pencînar, Stockholm 2007.

ISBN: 91 89491 84 X

Ev berhem li ser sê beşan hatiye sazkerin. Beşa yekem bi hurgilî li ser jiyana û eşîra Derwêşê Sado ye. Beşa duyem qala serhildan û şerên wê demê kiriye. Zinar vê beşê kiriye du binbeş. Binbeşa Ayê li ser şer û serhildanên nijadî ne binbeşa Byê jî li ser şerên birakujiyê ne. Di vê beşe de zêdetir em rastî bûyer û gengeşiyên mala Bişar û Cemîlê Çeto tên. Di beşa sêyem de jî behsa sirgûn û trajediya binxetê ya mala Derwêşê Sado kiriye. Piştî van her sê beşan lêkolînerê pirtûkê hin foto û belgeyên Derwêşê Sado li dawiya pirtûkê bi cih kiriye. Her çiqas navê kitêbê jiyana *Jînewariya Derwêşê Sado* be jî em tê de pêrgî agahiyên sosyolojîk û politîk yê civata kurdên wê dewrê jî tên.¹⁶⁰

4.1.15. Govenda Mirinê

Navê Pirtûkê: Govenda Mirinê

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2010

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 212

ISBN: 9189491 86 6

Govenda Mirinê herçiqas di sala 2010an de hatibe weşandin nehatiye bidestxistin.¹⁶¹

¹⁶⁰ Zeynelabidîn Zinar, *Jînewariya Derwêşê Sado*, Pencînar, Stockholm 2010.

¹⁶¹ Pirtûk ji Zeynelabidîn Zinar hate xwestin lêbelê nehatiye bidestxistin. Dibe ku ji ber naveroka pirtûkê nivîskar nexwestibe pirtûk zêde belav bibe.

4.1.16. Arşîva Şêxên Axtepeyê

Navê Pirtûkê: Arşîva Şêxên Axtepeyê

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2012

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 260

ISBN: 91 8949190 4

Ev pirtûka ku em ê bidin nasîn ne tam be jî lê li gor beşeke xwe ji aliyê naverok û şiklê xwe kitêbeke biyografîk e. Eger hevokeke kurt û kurmancî ji bo vê kitêbê tiştek bê gotin ew jî ev hevok e; pirtûka li ber destê me tabloyeke an jî katalogeke mala Axtepiyan e. Zinar kitêbê kiriye du beş. Di bergê pêşîn ê pirtûkê de resmê kumbeta Şêx Hesenê Nûranî heye. Di dawiyê de jî çend helbestên endamên mala axtepiyan hene. Di destpêka pirtûkê de jî Zinar diyar kiriye ku çawa û kengê mala axtepiyan nas kiriye û çima bala wî kêşeya.

Di beşa yekem a pirtûkê de ji rojbûna Şêx Şafî dest pê kiriye hetanî zarokatî, sêwîmayîna wî, xwendin, zor û zehmetiyên ku kêşaye, jiyana bav û kalên wî, kêşeyên nav civakî û malbatî û gelek mijarên ji hev cuda dewam kiriye.

Zinar gava ku mala Axtepiyan dide nasîn herî zêde giraniyê dide ser Şêx Ebdurehman Axtepî. Çimkî di malbata Axtepiyan de yekem kes Şêx Ebdurehman Axtepî ye ku berhemên kurmancî nivîsiye. Dîsa di kitêbê de methiye û pesnên li ser Şêx Ebdurehman Axtepî heye.

Beşa duyem jî çî dokumant, belge, foto û hwd li ser malbata Axtepiyan hebin bi têbînî hatiye sazîkirin. Ev beş ji aliyê foto û belgeyan ve bi awayekî kronolojîk hatiye tanzîmkirin.¹⁶²

4.1.17. Jîneweriya Şêx Edhem Berzanî

Navê Pirtûkê: Jîneweriya Şêx Edhem Berzanî

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2013

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 14 X 21 cm.

Jimara Rûpelan: 306

ISBN: 91 89491 91 2

Ev xebat biyografiya Şêx Edhem Barzanî ye. Di vê pirtûkê de Zinar pêşî fikra nivîsîna pirtûkê ango serpêhatiya nivîsîna pirtûkê rave dike. Zinar bo amadekirina vê pirtûkê destûr ji Şêx Edhem dixwaze da ku hevpeyvîneke dûvûdirêj bo nivîsîna vê pirtûkê hewce ye. Zinar kitab kiriye şeş beş. Di her beşeke wê de mijarên cihê cihê hem li ser jiyana Şêx Edhem hem jî eşîr û civata Barzanan rawestiyaye. Ji roja ji dayikbûna Şêx Edhem bigire, heyânî xwendin, eşîr, şecere, şoreşên wê dewrê û mijarên cîkavî ku li Kurdistanê qewîmîne hwd tê de heye.¹⁶³

4.1.18. Karoka Evsûn

Navê Pirtûkê: Karoka Evsûn

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

¹⁶² Zeynelabidîn Zinar, *Arşîva Şêxên Axtepeyê*, Pencînar, Stockholm, 2012.

¹⁶³ Zeynelabidîn Zinar, *Jînewariya Şêx Edhem Berzanî*, Pencînar, Stockholm 2013.

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2013

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 172

ISBN: 91 8949192 0

Pîrtûka bi navê *Karoka Evsûn* ji aliyê nivîskar Zeynelabidîn Zinar, li ser pênc mijarên cuda hatiye saz kirin. Ji wan çar mijar wekî çîrokan in, yek jî jê ceribîn e. Pênc meseleyên ji hev cuda û her yek jî peyamekê dide xwendekar û ciwanan. Beşên pirtûkê; “Karoka Evsûn”, “Sê Rojên Tofanê”, “Zinarê Xûl”, “Dilopa Xwînê û Ava” ne. Di destpêka pirtûkê de naverokê û pêşgotineke Zeynelabidîn Zinar heye. Nivîs li gor rêza jorîn hatiye ristîn. Em ê jî naveroka van nivîsan yeko yeko vebêjin.¹⁶⁴

4.1.19. Lehengwariya Zarûkekî Kurd

Navê Pirtûkê: Lehengwariya Zarûkekî Kurd

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2013

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 300

ISBN: 91 89491 55 6

¹⁶⁴ Zeynelabidîn Zinar, *Karoka Evsûn*, Pencînar, Stockholm 2013.

Ev pirtûk ji serpêhatiyên curbecur yên zarokê bi navê Efrasiyab e. Zinar di vê pirtûka xwe de navên lehengan ên rastî bi kar neanîne. Di pêşgotina pirtûkê de Zinar dibêje tu peyveke vê pirtûkê vajî rastiye nîne. Ango hemû ji jiyana rastîn a Efrasiyab dagirtiye. Serlehengê pirtûkê Efrasiyab e û hemû bûyer li dora Efrasiyab diqewime.

Zinar tenê di destpêka pirtûkê de sernavek vekiriye û bi tîpên mezin sernavê nivîsiyê û bi nimroya yekê dest pê kiriye. Wekî din berdwama pirtûkê de tenê bi her bûyer û mijareke din re pê de pê de nimro lê kiriye. Zinar ji 5-6 saliya Efrasiyab dest pê kiriye ka çi celeb zar bûye, çi kiriye, çi aniye serê zarên gund û hwd. Efrasiyab li aliyekî xwe zarekî jîr, aqil, zana, tijefehm li aliyekî din jî zarekî nestar, nerehet, mizûr û hwd bûye. Ji bavê xwe zaf lêdan û îşkence dîtîye. Pir birçî û bê pere maye. Ev hemû bobelat Efrasiyab kiriye kesekî bi hêz û balkêş. Efrasiyab li hember jiyana xerab, li ber bayê felekê xwe zexm girtiye û xwendîye bûye parêzer. Û paşê jî bi vê şexsiyeta xwe ya saxlem û jîrekane ji herkesê ku Efrasiyab nas dikin re, bûye mînaekeke bêhempa û cihê şanaziyê.¹⁶⁵

4.1.20. Serpêhatiya Mele Xelîl

Navê Pirtûkê: Serpêhatiya Mele Xelîl

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2013

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 14 X 21 cm.

Jimara Rûpelan: 156

ISBN: 91 89491 83 1

¹⁶⁵ Zeynelabidîn Zinar, *Lehengwariya Zarûkekî Kurd*, Pencînar, Stockholm 2013.

Pirtûka bi navê *Serpêhatiya Mele Xelîl* ji pênc beşan pêk tê. Lêkolîner Zinar pêşgotineke kurt ji vê pirtûkê re hazir kiriye. Di beşa yekem de qala destpêka jiyana Mele Xelîl û bi berfirehî jî qala eşîra wî kiriye. Ango rîspî, serok, mêrxas, cih û war hwd yên eşîrê yeko yeko nivîsiye. Di beşa duyem de jî ya ku kok û hîmê beşê ye behsa serpêhatiya Mele Xelîl kiriye. Di vê beşê de Zinar dipirse Mele Xelîl bersivê dide. Gelek babetên cihê cihê di vê beşê de hene. Yek ji wan sohbetan jî nefkirina ermenan û eskeriya Mele Xelîl e. Di beşa sêyan de kesên bi navê Dadê Tewrad û Meta Hawê hene ku ew behsa meletiya Mele Xelîl û zewaca wî dikin. Beşa çaran ji hevpeyvînê pêk tê ku Şefîqê birayê Zinar di sala 1988an bi Mele Xelîl re çêkiriye. Hevpeyvîn li ser serpêhatiyên meletî û eskeriya Mele Xelîl e. Di beşa pêncan de jî nexşeya famileyê mala Hacoemeran çêkiriye da ku eşîr ji aliyê kesên ku lêkolîner in ve baş bê dîtîn.¹⁶⁶

4.1.21. Serhildana Eşîra Jêlî 1929

Navê Pirtûkê: Serhildana Eşîra Jêlî 1929

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2014

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 14 X 21 cm

Jimara Rûpelan: 336

ISBN: 91 89491 94 7

Pirtûk, lêkolîneke li ser eşîra jêliyê ye. Ji navê pirtûkê jî tê fem kirin ku pirtûk di derbarê serhildaneke kurdan de ye. Pirtûk qala serhildana eşîra Jêlî dike. Gava em pirtûkê dinêrin Zinar kitab kiriye sêzdeh beş. Di pirtûkê de wêneyê Resûl Axa heye ku rêvebir û serlehengê serhildanê ye. Di pirtûkê de du pêşgotin hene: yek ya

¹⁶⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Serpêhatiya Mele Xelîl*, Pencînar, Stockholm 2014.

Kamîran Haco ye ya din jî ya Zinar e. Rûpelek bi tena serê xwe jî nexşeya mala Resûl Axa ye ango şecera malbata wan e. Her beşekê bi nimroyekê nîşan daye û di destpêka her beşê de çavkaniya agahiya xwe nivîsiye. Pirtûk ji aliyê rêzebûyerê ve bi awayekî kronolojîk û sistematîk nehatiye nivîsîn. Di hin beşan de mijar li nava hev ketine. Her çiqas pirtûk qala serhildanê bike jî lê naverokê de gelek mijarên din jî hene. Agahiyên (nifûs, erdnîgarî, edet, tore, heywan, nebat) di derbarê deşta Mişarê pirtûk ji mijara serhildanê dûr xistiye. Ango bûye wekî kitêbeke coxrafîk. Tê de agahiyên di derbarê komele û saziyên wê dewrê de jî hene. Yek ji wan komele û saziyan rêxistana Xoybûnê ye ku bi berfirehî qala wê dike. Divê bê gotin ku lêkolîner beşeke dirêj jî li ser koça eşîra jêliyan a ber bi Binxetê kiriye.¹⁶⁷

4.1.22. Gotinên Watedar

Navê Pirtûkê: Gotinên Watedar

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2015

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 240

ISBN: 91 89491 97 1

Pirtûka bi navê *Gotinên Watedar* ji 290 nivîsarên biçûk hatiye honandin. Zinar li gor rêza alfabeyê gotinên cihêreng hazir kiriye û li ser her peyvekê meseleyek vekiriye. Û li ser her peyvekê xwendin, nivîsîn, maneyên wan ên cihêreng tişt nivîsîne. Em dikarin bi mînakekê mijarê nîşan bidin. Zinar bi tîpa Ayê dest pê kiriye û li ser wekî peyvên agir, av, aş û hwd. ramanên xwe aniye ziman. Dîsa di tîpa

¹⁶⁷ Zeynelabidîn Zinar, *Serhildana Eşîra Jêli 1929*, Pencînar, Stockholm 2014.

Byê de behsa ba, balgîv, benîşt, benikê xav, berda, beroş, berû, bext, bêserî, bihar, bihn, bilind, bindemayî, bîr, bira, birçî, birîn, birinc, bizin, berîk, berojk kiriye.

Di pirtûkê de hin çîrok û meselokên cihê cihê hene. Nivîs bi puntoyên mezin hatine ristîn. Di her peyvekê de Zinar biwêjeke eleqedar nivîsiye. Bi vê teknîkê hem karîgeriya wê peyvê ya di nav xelkê de daye der û hem jî dewlemendiya zargotina kurmancî raxistiye li ber çavan. Wekî kêmasiyekê bê gotin ku Zinar peyvên ku li pirtûkê nivîsiye maneyên wan ên ferhengî nedaye.

4.1.23. Gotarxane

Navê Pirtûkê: Gotarxane

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2015

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 578

ISBN: 978 91 87787 00 3

Kitêba bi navê *Gotarxane* ji 303 nivîsarên ji hev cuda pêk tî. Zinar, nivîsên kitêbê di sala 2013-2014an de li ser facebookê weşandine û pey re kiriye pirtûk. 150 nivîsar ên sala 2013an e û 160 nivîsar jî yê sala 2014an e. Nivîsarên kitêbê rrojane ne ku Zinar her roj, yek bi yek li ser tora civakî weşandiye. Her nivîsarek bi tena serê xwe xwediyê babetên cihê ye. Di van nivîsaran de gelemperî mijar li ser ziman, edebiyat, çand, tore, dîn, sosyolojî, erdnîgarî, şîretan bigire hetanî meseleyên li ser aborî, psîkolojiyê û antropolojiyê ye. Nivîsên nivîsaran ne dirêj in. Herî zêde sê rûpel û piranî li dora rûpelekê ne. Û di binê her nivîsa Zinar de tarîxa wê rojê û cihê ku nivîs lê hatiye nivîsîn heye. Armanca Zinar bi vê teknîka nivîsîna kurt ew e ku xwînerên li ser tora civakî an jî dinyaya dijîtal zû ji nivîsên bi vî rengî aciz nebin da

ku bixwînin. Destpêka nivîsaran bi heman şiklî ye ku bangî ciwanan dike. Zinar dixwaze zêdetir ciwan bi van meseleyan eleqeder bibin, lêkolînê bikin û serê xwe pê re biêşînin da ku milletekî xwenda û zana peyda bibe.¹⁶⁸

4.1.24. Sêwirxane

Navê Pirtûkê: Sêwirxane

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2016

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 570

ISBN: 978 91 87787 04 3

Kitêba bi navê *Sêwirxane*, 270 nivîsarên Zinar pêk tê ku di sala 2015an de li Facebookê hatine weşandin. Her nivîsarek bi naverokeke cuda hatiye nivîsandin û bi jimareke cuda hatiye destnîşankirin. Gelemperî nivîs yek an jî du rûpelî ne. Nivîsar exlebî li ser çand, ziman û edebiyatê ne. Herwiha ev nivîsar rê li gelek babetên cihê vedikin ku xwendevan têkevin nava lêkolînên cihêreng û xebata xwe bidomînin. Navê çend nivîsaran wekî nimûne Zinar li dawiya pirtûkê listeya pirtûkên xwe yên çapkirî û piştî vê jî naveroka pirtûkê bi cih kiriye.¹⁶⁹

4.1.25. Qolinc

Navê Pirtûkê: Qolinc

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

¹⁶⁸ Zeynelabidîn Zinar, *Gotarxane*, Pencînar, Stockholm 2007.

¹⁶⁹ Zeynelabidîn Zinar, *Sêwirxane*, Pencînar, Stockholm 2016.

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2017

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 296

ISBN: 978 91 87787 07 02

Pirtûka bi navê *Qolinc* pirtûkeke helbestê ye. Zinar ji pirtûkê re agahdariyeke kin nivîsiye. Di vê pirtûkê de 153 helbest hene. Dema em mijarên helbestan dinêrin zêdetir meseleyên ku Zinar tesîr kirine –çi mijarên neyînî çi yên erênî- hatiye honandin. Mijarên helbestan jî celeb celeb in û tê de mijarên koçberî, ziman, çand, netewe, evîndarî, hesreta welêt û hwd hene. Nivîskar di piraniya helbestan de wext, saet û cih diyar kiriye. Helbestên xwe di pirtûkê de li gorî kronolojiyê bi cih kiriye. Di pirtûkê de helbestên ji sala 1988an bigire heta sala 2017an hene. Hin helbest bi kêş û kafiye ne hin helbest jî serbest in. Hin helbestên xwe de jî terzek cuda bi kar aniye. Di destpêka hin helbestên xwe de helbesteke şairekî klasîk wekî epîgraf nivîsiye.¹⁷⁰

4.1.26. Çandxane

Navê Pirtûkê: Çandxane

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2017

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

¹⁷⁰ Zeynelabidîn Zinar, *Qolinc*, Pencînar, Stockholm 2017.

Jimara Rûpelan: 664

ISBN: 978 91 87787 08 9

Pirtûka bi navê *Çandxaneyê*, ji 293 nivîsaran pêk tê ku di sala 2016an de li ser Facebookê hatine weşandin. Zinar di nava salekê de hemû nivîsên ku li Facebookê weşandine di pirtûkekê de civandiyê û li çape xistiye. Her nivîsarek bi naverokeke cuda hatiye nivîsandin û bi jimareke cuda hatiye destnîşankirin. Gelemperî nivîs yek an jî du rûpelî ne. Nivîsar exlebî li ser çand, ziman û edebiyatê ne. Herwiha ev nivîsar rê li gelek babetên cihê vedikin ku xwendevan têkevin nava lêkolînên cihêreng û xebata xwe bidomînin. Navê çend nivîsaran wekî nimûne; *Tîpa Gir Navên Taybet, Texlîtên Pincara Welêt, Kevneşopiya Şinê...* Zinar li dawiya pirtûkê listeya pirtûkên xwe yê çapkirî û piştî vê jî naveroka pirtûkê bi cih kiriye.

4.1.27. Pirsname

Navê Pirtûkê: Pirsname

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2017

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 152

ISBN: 978 951 3189 49 5

Pirtûka bi navê *Pirsname* pirtûkeke rexneyî ye. Zinar di destpêkê de pêşgotineke dîrêj nivîsiye. Di dawiyê de jî paşgotinek nivîsiye. Pirtûka bi navê *Pirsname* di derbarê kitêba Cîgerxwîn ya bi navê *Jînenîgariya Min* de ye. Zinar di pirtûka xwe de 171 gotinên Cegerxwîn ji pirtûka *Jînenîgariya Min* wergirtiye. Zinar

171 yek pirs ji Cegerxwîn kirine û hin caran jî şîroveya gotinên Cegerxwîn kiriye. Divê bê gotin ku Zinar rasterast ev pirs ji Cegerxwîn nepirsîne. Li gor Zinar mebesta nivîsana vê pirtûkê; “Bêguman ne ew e ku ez bihadariya Cegerxwînê Hesarî daxînim û rûmeta wî biqumînim. Tenê ez gotinên wî yên çewt û vajî, tînim ber hevûdu û nîşanê xwendevanan didim û pirs jê dikim.”

4.1.28. Axaftina Wêneyan

Navê Pirtûkê: Axaftina Wêneyan

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2017

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 150

ISBN: 91 89491 97 1

Axaftina Wêneyan, di sala 2017an de hatiye weşandin.¹⁷¹ Di bergê pirtûkê de mêrikekî rûdirêj yê ku serê pênc kesan serjêkirî ye û serê wan li ba hevdu rêz kiriye, xuya dike. Wêneyê bergê şiddetê bêsînor dihewîne û meriv ji dehşeta wêneyî aciz dibe. Ev pirtûk ji pîr aliyên ve xwediyê problemên mezin in. Li gorî danasîna pirtûkê, ew 262 wêne dihewîne û tê de nivîs jî tune. Nivîskar xwestiya ku ev wêne bibin belge bo dahatûyê lêbelê pêkhatina armanca wî cihê nîqaşê mezin e.¹⁷²

¹⁷¹ Ev pirtûk jî bi dest neket. Nivîskar ji ber hin sedemên taybet nexwest vê pirtûkê bi me re parve bike.

¹⁷² <https://www.rojevakurd.com/pirtuk-axaftina-weneyan/> 09.07.2018

4.1.29. Vêjexane

Navê Pirtûkê: Vêjexane

Nivîskar: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 2018

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 19 X 11 cm.

Jimara Rûpelan: 717

ISBN: 978 91 87787 14 0

Pirtûka bi navê *Vêjexane*, 741 nivîsar û kurtenivîsên Zinar pêk hatiye ku di sala 2016an de li Facebookê hatine weşandin. Zinar her nivîsareke xwe li ser meseleyeke cuda nivîsiye. Zinar wekî pirtûkên xwe yê din (*Gotarxane*, *Sêwirxane*, *Çandxane*) ku ji nivîsarên Facebookê pêk tên, *Vêjexaneyê* jî li ser mijarên ziman û çanda kurdî hazir kiriye. Tenê bo kurtenivîsan li dawiya pirtûkê beşeke cuda bi navê kurtenivîsên bêjimar terxan kiriye. Pîraniya kurtenivîsan du an sê hevok in. Ev kurtenivîs jî bi şiklê şîret, hişyarî û baldariyê ne.

4.2. Pirtûkên Werger

Me binbeşa wergerê jî di bin vê beşê de ediland. Du pirtûkên wergerê tê de hene. Yek ji zimanî tirkî ye ya din jî ji zimanî swêdî hatiye wergerandin.

4.2.1. Jiyana Mele Seîdê Kurdî

Navê Pirtûkê: Jiyana Mele Seîdê Kurdî

Nivîskarê Berhemê: Ebdurehman Norsî

Wergêr: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Pencînar

Sala Weşanê: 1996

Ciyê Weşanê: Stockholm

Ebada Pirtûkê: 12 X 19 cm.

Jimara Rûpelan: 138

ISBN: 91 972090 6 6

Jiyana Mele Seîde Kurdî, bi navê xwe yê resen *Bediuzzeman'ın Tarihçe-i Hayatı* pirtûka Ebdurehman Norsî ye ku di sala 1919an de bi tirkîya dewra osmanî hatiye nivîsîn. Pirtûk piştî demekê (1978), ji aliyê Osman Resûlan ve hem hatiye latînîzekirin hem jî tirkîya wê ya osmanî li gorî dewrê hatiye sivikkirin.

Gava ku Zinar di sala 1996an de dest bi wergera vê kitêbê dike ev pirtûk heyânî wê demê tenê ji aliyê weşanxaneyê Pîranî û Nûbiharê ve hatibûne çapkirin. Ya ku Zinar ji tirkî werdigerîne kurdî çapa Nûbahirê ye. Dema ku em pirtûkê dimêzînin bergê pêşîn de wêneyekî Bediuzzeman heye. Di pirtûka navborî de naverokê û sê pêşkêşî hene. Pêşgotina yekem a Zinar e a duyem weşanxaneyê Pîranî ye a sêyem jî ya Nûbiharê ye. Berdewama pêşgotinê de Zinar sedema wergera vê kitêbê vedibêje. Paşê bi kurtasî qala jiyana Bediuzzeman dike. Zinar pêşgotina xwe de pêşî kitêbê daye nasîn. Nivîsara bi navê *Lisanımız Kürtçe: Bediüzzaman Mola Said-i Kürdi'nin Nesayihî* ya Bediuzzeman ku di rojnameya *Kürt Teavün ve Terrakî* de hatibû çapkirin, ji aliyê Zinar ve di pêşgotinê de hatiye bicihkirin. Di heman pêşgotinê de qala sedema latînîzekirina Osman Resulan kiriye. Piştî hersê pêşgotinên ku bîst rûpel girtiye, pirtûk dest pê dike.

Di vê pirtûka biyografîk ya li ser Bediuzzeman de, Ebdurehman Norsî wekî bi çavê kesekî nêzik û nas, jiyana apê xwe Bediüzzaman pêşkêşî xwînêran dike. Pirtûk, bi seredorî, li ser jidayîkbûnê, zarokatî, salên wî yên xwendekariyê, tevgerên wî, têkiliya wî ya bi kesên muhim re, fikra wî ya avakirina zanîngehekê li Kurdistanê, çûyîna Stenbol û Şamê, derketina şerê cihanê ya yekem, şerê wî yê bi Rûsan re û taybetmendiyên sereke yên Bediüzzeman bi neqilkirina bîranîn û serboryên ve

hatiye nivîsandin. Di vê pirtûkê de, tenê nivê emrê Bedûzzeman cih girtiye, ji ber ku dema pirtûk hatiye nivîsandin û qedandin, Bedûzzeman hê li heyatê bûye.

Wexta em li pirtûkê dinêrin piştî qedandina jiyana Bedûzzeman, Osman Resulan gava ku latînîze kiriye hin tiştên din jî li orjinaliya vê pirtûkê zêde kiriye. Di pêvekê de biraziyê wî Ebdurehman Norsî wekî du rûpelan qala memûrtiya apê xwe kiriye. Di pesindayinê de jî sê helbest hene ku yek ya Mehmûd Nejat e herdu helbestên din jî yên biraziyên Bedûzzeman in. Di derheqê têbîniyan de jî em dikarin van tiştan bibêjin; dema ku Osman Resulan kitêbê latînîze kiriye derbarê hin mijarên ku li pirtûkê de derbas dibin li gorî rêzê reqeman li ber wan daniye û di beşa têbîniyê de wan meseleyan rave kiriye.¹⁷³

4.2.2. Îslam û Ewrûpa

Navê Pirtûkê: Îslam û Ewrûpa

Nivîskarê Berhemê: Ingmar Karlsson

Wergêr: Zeynelabidîn Zinar

Weşanxane: Doz

Sala Weşanê: 2007

Ciyê Weşanê: Stenbol

Ebada Pirtûkê: 20 X 14 cm.

Jimara Rûpelan: 252

ISBN: 978 9944 227 24 4

Zinar ev pirtûk ji zimanî swedî bo kurmancî wergerandiye. Siyasetmedarê Swedî Ingmar Karlsson, di derbarê dîne îslamê de, nêrîna Ewropayê li hember misilmanan, misilmanên koçber ên Ewropayê, Rojhilata Navîn, rojava û hîn gelek

¹⁷³ Ebdurehman Norsî, *Jiyana Mele Seidê Kurdî* (wer. Zeynelabidîn Zinar), Pencînar, Stockholm 1996.

mijarên din raxistiye ber çavan. Herwiha ji van meseleyên civakî û siyasî re çareseriyên pêşniyaz dike. Ev pirtûk heta niha hatiye wergerandin bo zimanên wekî erebî, farsî, tirkî, danmarkî.¹⁷⁴

¹⁷⁴ Ingmar Karlsson, *Îslam û Ewrûpa* (wer. Zeynelabidîn Zinar), Doz, Stenbol 2007.

BEŞA PÊNCEM

5. Nivîsarên Zeynelabidîn Zinar Di Kovar, Rojname û Sempozyoman De

Zinar, ne tenê bi pirtûkên xwe herwiha bi bi sedan nivîsarên xwe yên li ser babetên cihêreng ku di kovar û rojnameyan de weşiyane, berhemdariyeke çalak pêk aniye. Wî ji sala 1984an bigire heta niha, bi dehan kovar û rojnameyan de nivîsiye.

Zinar ji ber ku li Swêdê bûye derfata weşandina nivîsên wî di kovar û rojnameyan de hêsantir bûye. Nivîsên wî herî zêde di kovara *Nûbihar* û *Nûdemê* de hatine weşandin. Mijara nivîsên wî bi pîranî jiyan û xebatên şexsiyetên muhîm, ziman, çand û toreya kurdî ne. Van salên dawî Zinar jî wekî kesekî xwende û çalak xwe dinyaya dîjîtal jî bêpar nahêle û di gelek malperên kurdî de nivîsên xwe dide weşandin. Malpera ku herî zêde Zinar tê de nivîsên xwe daye weşandin, malpera *Ria Teze* ye ku heta niha bi dehan nivîsarên wî tê de weşiyane. Xêncî nivîsên wî yên di kovar û rojnameyan de, bi dehan panel, semîner û sempozyûman de jî wî pêşkêşî kiriye. Bo nimûne, ew ji bo beşên ziman û edebiyata kurdî yên li Tirkîyeyê hatiye vexwendin bo semîner û panelên li ser folklor û ziman. Divê bête bibîrxistin ku hemû nivîsarên wî yên di weşanên demkî de hatine weşandin bi dest neketine. Ev lîste, tenê nivîsên wî yên berdest dihewîne.

5.1. Nivîsarên Zeynelabidîn Zinar di Kovaran de

5.1.1. Nûbihar¹⁷⁵

“Pîrozname”, Nûbihar, H.5, Stenbol 1993, r.12.

“Elî Herîrî”, Nûbihar, H.7, Stenbol 1993, r.21-22.

“Mele Ehmedê Bateyî” H.9, Stenbol 1993, r.22-24.

“Mele Ehmedê Cizirî” H.10, Stenbol 1993, r.19-21.

“Gulistana Bazîdê Kovara Nûbiharê Afirand” H.11, Stenbol 1993, r.21-24.

“Eqîdeya Ehmedê Xanî” H.13, Stenbol 1993, r.11-15.

¹⁷⁵ Kovara *Nûbihar* kovareke çandî û edebî ye. Zimanê kovarê kurdî ye. Di sala 1992an de li Stenbolê dest bi weşana xwe kiriye. Heta niha jî weşana wê berdewam e.

“Rewşenbîr û Rewşenbîrî” H.25, Stenbol 1994, r.14-15.

“Mast” H.28, Stenbol 1995, r.19-20.

“Peymana Amasyayê” H.29, Stenbol 1995, r.10-11.

“Gelşa Alfabeya Kurdî” H.29, Stenbol 1995, r.30.

“Tirkbapîr û Kemaltîfî” H.34-35, Stenbol 1995, r.26-29.

“Şîret û Nesîhetên Melê” H.62, Stenbol 1998, r.21-22.

“Medrese hem dibistan hem jî unîwersîte bûn” H.63-64, Stenbol 1998 r.30-31.

“Gurê Manco” H.65, Stenbol 1998, r.28-29.

“Di Xewnê de Ehmedê Xanî” H.75-76, Stenbol 1999, r.4-6.

“Hunera Folklorê Kurdî” H.99, Stenbol 2006, r.19-20.

“Nûbihar adana berê çanda hezarsale ye” H.100, Stenbol 2006, r.31.

“Di medreseya Kurdi de şaxên zanistiyê” H.103, Stenbol 2007, r.58-59.

“Di çanda Kurdî de zimanekî zarokan ê taybet heye ku ew pê dipeyivin” H.116, Stenbol 2011, r.60-61.

5.1.2. Nûdem¹⁷⁶

“Ehmedê Xanê”, Nûdem, H.1, Swêd 1992, r.71-76.

“Mele Ehmedê Cizirî”, Nûdem, H.2, Swêd 1992, r.39-51.

“Feqiyê Teyran”, Nûdem, H.3, Swêd 1992, r.84-86.

“Mele Ehmed Bateyî”, Nûdem, H.5, Swêd 1993, r.69-74.

“Pertew Begê Hekarî”, Nûdem, H.6, Swêd 1993, r.94-98.

¹⁷⁶ Kovara *Nûdem* di sala 1992an de li Swêdê dest bi weşana xwe kiriye. Kovareke hunerî, wêjeyî û çandî ye. Zimanê kovarê kurdî ye. Bi hejmara 40î, heta sala 2001 dewam kiriye. Ji aliyê Firat Cewerî ve dihat derxistin.

- “Şahê Nexşebend; Mewlana Xalidê Kurdî”, Nûdem, H.7, Swêd 1993, r.93-102.
- “Şêx Evdilqadirê Gêlanî”, Nûdem, H.8, Swêd 1993, r.84-87.
- “Xalid Axayê Zêbarî”, Nûdem, H.9, Swêd 1994, r.40-44.
- “Mela Mensûrê Gergaşî”, Nûdem, H.10, Swêd 1994, r.82-83.
- “Sed û Du Nivîskarên Kurd”, Nûdem, H.11, Swêd 1994, r.80-83.
- “Şêx Mehmûdê Birîfkanî”, Nûdem, H.12, Swêd 1994, r.103-105.
- “Sê Jinên Kurd”, Nûdem, H.13, Swêd 1995, r.70-77.
- “Mele Seîdê Kurdî”, Nûdem, H.14, Swêd 1995, r.75-80.
- “Zerdeşt Pêxember”, Nûdem, H.16, Swêd 1995, r.97-110.
- “Strana Kurdî û Pêvajoya Wê ya Dîrokî”, Nûdem, H.21, Swêd 1997, r.84-86.
- “Pêşgotina ‘Kurdistan’ê”, Nûdem, H.25, Swêd 1998, r.6-11.
- “Peyxamberê Ummetê Hz.MUHEMMED”, Nûdem, H.29, Swêd 1999, r.114-117.
- 5.1.3. Berbang¹⁷⁷**
- “Dijminê bêbext qet ferq xistiye nav min û te” (Bi navê Diljar Bêwar) H.5, Swêd 1986, r.6.
- “Gulê û Çûko” (Bi navê Wessaf Werte) H.6, Swêd 1986, r.9.
- “Ez ji Îşkenceya 178 Rojan, Nimûneyek bi Rih im” H.73, Swêd 1991, R.7
- “Mamostetiya Kurdî Bûye Seyrengêha Kêfê” H.74, Swêd 1991, R.21.
- “Ji Raya Giştî Re” H.77, Swêd 1991, R.17.
- “Protesto” H.78, Swêd 1992, R.16.

¹⁷⁷ Kovara *Berbang* di sala 1982an de li Swêdê dest bi weşana xwe kiriye. Kovar bi zimanê kurdî û swêdî ye. Kovareke edebî û kulturî ye.

“Şeva Piştgiriya Nivîskaran Ya Bênivîskar” H.78, Swêd 1992, R.22.

“Têgihîştina Kurdan ji Zaravayên Hev Bi Têkiliyên Wan ve Girêdayî Ye” H.79-80, Swêd 1992, R.25.

5.1.4. Nûpelda¹⁷⁸

“Şêx Hesîb Axtepî” H.1, Wan 2009, r.8-12.

“Şêx Eskerî” H.2, Wan 2010, r.7-9.

“Feqiyê Teyran kî ye?” H.4, Wan 2010, r.17-20.

“Şêx Fetullahê Werqanisî” H.5, Wan 2011, r.11-16.

“Medreseya Axtepeyê” H.10, Wan 2012, r.22-26.

“An zimanistan an goristan” H.12, Wan 2013, r.32-33.

“Amaca bingehîn a nivîsandinê” H.13, Wan 2013, r.18-21.

5.1.5. Çira¹⁷⁹

“Eqîdeya Îslamê ya Ehmedê Xanî” H.3, Swêd 1995, 18-21

“Rûsipîkirin” H.13, Swêd 1998, r.47-48.

“Dema ku hêj dê were pêşeroj e yan paşeroj e?” H.17, Swêd 1999, r.46-50.

“Ferhengoka Şêx Fetullahê Werqanisî” H.18, Swêd 2000, r.62-67.

5.1.6. Berhem¹⁸⁰

“Leyl û Mecnûn” H.3, Swêd 1993, r.46-49.

“Serdarekî Kurd Şewket Tûran” H.5, Swêd 1993, r.52-57.

¹⁷⁸ Kovara *Nûpelda* di sala 2009an de li Wanê dest bi weşana xwe kiriye. Heta niha 24 hejmarên wê hene. Zimanê kovarê kurdî ye. Naveroka kovarê zêdetir li ser mijarên wekî; edebiyat, dîrok, dîn û çandiyê ne.

¹⁷⁹ Kovara *Çira* di sala 1995an de li Swêdê dest bi weşana xwe kiriye. Kovareke edebî û çandî ye. Zimanê kovarê kurdî ye.

¹⁸⁰ Kovara *Berhem* di sala 1988an de li Swêdê dest bi weşana xwe kiriye. Kovareke lêkolînî û çandî ye. Zimanê kovarê kurdî ye.

5.1.7. Felsefevan¹⁸¹

“Ol û Felsefe” H.1, İzmir 2015, r.22-26.

“Afirandina Dinê” H.3, İzmir 2015, r.36-42.

5.1.8. Wan¹⁸²

“Malbata Şêx Hesênê Nûranî” H.1, Swêd 1992, r.16-20.

5.1.9. Bergeh¹⁸³

“Eşîra Pencînanan û Cemîlê Çeto” H.6-7, Swêd 1993, r.63-65.

5.2. Nivîsarên Zeynelabidîn Zinar di Rojnameyan de

5.2.1. Kurdistan Press¹⁸⁴

“Terora Cunta” H.20, Swêd 1987, r.11.

“Gelê Kurd Dike Hawar” H.25, Swêd 1987, r.15.

“Gelo Amaca Kovara “Ayre” Çi Ye?” H.28, Swêd 1987, r.15.

5.2.2. Armanc¹⁸⁵

“Tefsîra şîrîn a Quranê” H.178, Swêd 1997, r.14.

5.3. Nivîsarên Zeynelabidîn Zinar di Malperan de

5.3.1. Riya Teze¹⁸⁶

“Medreseya Kurdî û Rola Wê di Wêjeya Kurdî de – 1” 9.03.2016

“Medreseya Kurdî û Rola Wê di Wêjeya Kurdî de – 2” 13.03.2016

¹⁸¹ Kovara *Felsefevan* di sala 2015an de li Îzmîrê dest bi weşana xwe kiriye. Kovareke felsefî û zanistî ye. Sê mehan carekê derdikeve. Yekem kovara felsefeyê ya kurdî ye. Zimanê kovarê kurdî ye.

¹⁸² Kovara *Wan* di sala 1992an de ji aliyê komîteya Yekitiya Nivîskarên Kurd ve li Swêdê dest bi weşana xwe kiriye. Kovareke çandî û wêjeyî ye. Zimanê kovarê xwerû kurdî ye.

¹⁸³ Kovara *Bergeh* di sala 1989an de li Swêdê dest bi weşana xwe kiriye. Kovareke çandî, siyasî û lêkolînî ye. Zimanê kovarê kurdî û tirkî ye.

¹⁸⁴ Rojnameya *Kurdistan Press* di sala 1986an de li Swêdê dest bi weşana xwe kiriye. Rojnameyeke pazdeh rojî ye. Zimanê wê tirkî û kurdî ye. Zêdetir li ser meseleyên siyasî û çandî ye. Rojname heyanî sala 1992an weşana xwe domandiye.

¹⁸⁵ Rojnameya *Armanc* di sala 1995an de li Swêdê dest bi weşana xwe kiriye. Rojnameyeke siyasî, çandî û edebî ye. Zimanê rojnameyê kurdî ye.

¹⁸⁶ Ev malper weşana dijîtal a rojnameya *Riya Teze* ye. Malpereke hunerî, çandî û siyasî ye.

“Folklorî Kurdî û Dewlemendiya Çîrokên Folklorî” 13.03.2016

“Fêrbûna Zimanekî” 22.03.2016

“Şanoya Mamê Mamcel” 28.03.2016

“Biratiya Quling û Rovî” 06.04.2016

“Rêwîtiya di Nava Ewran de” 18.05.2016

“Bangewaziya Strana Kurdî Digîje Xwedê û Xwezayê” 25.05.2016

“Ferqa di Navbera Wehabîti û Êzîdiyatîyê de Çi Ye?” 09.06.2016

“Baweriya bi Sondê” 15.06.2016

“Gotina Rast: “Çû Ber Dilovaniya Xwedê”” 17.06.2016

“Xuyê Merivan û Yê Heywanan” 24.06.2016

“Rexneyên Kurdan li ser Kurdiya Hevûdu” 30.06.2016

“Rostemiya Nivîskarên Kurd” 08.07.2016

“Rêz û Rûmeta ji Nê Çiqas Heye?” 16.07.2016

“Nifireke Kurdî: “Pûrt li Laşê Te Nemîne”” 26.07.2016

“Vexwendina ji Bo Çûna Goristanê” 06.08.2016

“Hekîmê Kurmancî, Dermanê Kurmancî” 21.10.2016

“Kefenê Dijêgir” 02.11.201

“Komku ji Ya Geliyê Zîlanê ji Devê Leşkerekî Kemalîzmê” 08.11.2016

“Kar û Xisara ji Înternetê” 18.11.2016

“Kemalîzmê Çima Dîn Rakir?” 28.11.2016

“di Çanda Kurdî de “Qewaq” 08.12.2016

“Silav li Qewetê, Qewet li Bereketê” 16.12.2016

“Her Roj Guhdariya Straneke Kurdî Bike!” 26.12.2016

“Ker û Zanîna Wê Ya Zêde” 13.01.2017

“Bihar bi Gulekê Nayê” 30.01.2017

“Xwexapandîna Bi Gotina “Yekîtiyê”” 15.02.2017

“Hevgirtin û Hevkariya Gundiyên Kurdistanê” 03.03.2017

“Mirina Bi Deyn” 16.03.2017

“Zimanê Mirî û Zimanê Zindî” 23.03.2017

“Serpêhatiya “Girava Keştîmanê”” 30.03.2017

“Tirkên Kurd û Tirkiyeya Kurdistanê” 14.04.2017

“Ji Herdu Keçan Wê Diya Yekê...” 17.04.2017

“Kesê Nenivîse, Xwe ji Mêjû ve Dişêre” 06.05.2017

“Derewa ji Rastiyê Çêtir” 08.05.2017

“Xemla Nivîsê û Xemla Bûkê” 13.06.2017

“Ne Sar Lê Tê, Ne jî Germ...” 17.06.2017

